Arşîva Bîra Kurdan: Ji Kendal Nezan gotara bi serenavê “Bihara nazik a kurdan li Iraqê“ (2001)

ÇAPA ÎNTERNETÊ

LE MONDE diplomatique
kurdî

Çirîya pêşîn 2012 - Hejmar 35 · www.diplo-kurdi.com · info@diplo-kurdi.com · 20 Rûpel

Chase Madar
Berîya çar salan, namzedê serokdewletîyê Barack Obama soz dabû ku ew ê girtîgeha Guantanamoyê bigire, lê hê jî vekirî ye û dadgehên wê yên eskerî ji nû ve dest bi xebatê kirine...
▶ R. 6

Gilles Ardinat
Ji bo rizgarbûna ji krîzeke ku fînansê dayî dest pê kirin, gelek rê hebûn: Şarandina spekulasyonan, birêkûpêkkirina bazaran, cezakirina bankevanan, lê YEyê “kapasîteya reqabetê” derxist pêş.
▶ R. 8

Philippe Descamps
Ji ber neçareserîyeke siyasî û dîplomatîk a li ser pirsa Qarebaxê, piştî 20 salan cardin xetereyeke mezin a şer di navbera Ermenistan û Azerbaycana ku xwe jinûve çekdar dike de derdikeve meydanê...
▶ R. 12

Patrick Haimzadeh
Li Lîbyayê tu tişt weke ku hatibû plan kirin naqewime. Tevî ku ji desthilatdarîyê xistina rêjîmê û vir ve rewşa welêt ber bi xirabîyê ve diçe; bênîzamî û bêîstîqrarbûn her berdewam e...
▶ R. 15

Gregory Wilpert
Piştî 50 salên şerê navxweyî û gelek danûstandinên aştîyê yên têkçûyî, li Kolombîyayê hikûmetê û gêrîllayên FARCê li vê dawîyê biryar dan ku careke din ji bo aştîyê hewl bidin...
▶ R. 16

Di navbera Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Federal a Iraqê de alozîyên li ser erdî

DR. AZAD SALIH *

Pirsgirêk û alozîyên li ser “deverên li ser wan nehatî li hev kirin” ango alozîyên li ser erdî para bêhtir ji ber cihêbûna fikira di navbera dewletên serbixwe, yan jî dewletên federe de pêwendî milkiyeta herêmên sînor rû didin. Halê hazir li tevahîya dinyayê der barê alozîyên li ser erdî yên navbera dewletên cihê, yan jî herêman de lîsteyeke dirêj heye. Yek ji van jî alozîyên li ser erdî yên di navbera Herêma Kurdistana Iraqê û Hikûmeta Navendî ya Iraqê de ye.

Alozîyeke li ser erdî çi ye?

Bi giştî alozîyên li ser erdî “doza erdekî” ne. “Dozeke erdekî” daxwaza dewletekê, yan jî beşeke dewletê ye ku pê dixwaze hin erd bikevin bin desthilatdarîya wê. Ev îfade nexasim di çarçoveya erdên jidestdayî û/yan jî “li ser wan nehatî li hev kirin”, pirî caran herêmên ji dewleteke hukûmran, yan jî federe ji ber sedemên etnîk, yan jî siyasî qutbûyî de tê bi kar anîn. Sedemên “erdên li ser wan nehatî li hev kirin” dikarin bi awayekî kêfî dîyarkirina sînoran, alozîya ji ber madeyên xaf ên berdest, av yan jî sînorên etnîk, yan jî çandî bin. Çi bigre di tevahîya şer û alozîyên ji ber erdan, yan jî sînoran de, hem sînorên di navbera dewletan de (weke mînak pirsgirêka alman-hollendî ya sînor *Ems-Ästuar*, bûyera Cebelîtariq di navbera Spanya û Ingilîstanê de û mijarên Sebta û Melîla di navbera Fas û Spanyayê de) û hem jî sînorên di nav dewletê de (weke mînak mijara *herêma li ser nehatî li hev kirin* Abyeî (1) –pêşî pirsgirêka di navbera Komara Sûdan û herêma xweser a Başûrê Sûdanê de bû, piştre veguherî pirsgirêka di navbera Komara Sûdan û Komara Başûrê Sûdanê) sedem çavkanîyên xwezayî ne.

Alozîyên li ser erdî, yan jî pirsa erdên li ser wan nehatî li hev kirin yên di navbera dewletên hukumran ên dinyayê, yan jî dewletên federe ên welatekî de -çawa ku behsa wê hat kirin- ji ber sedemên cihêreng in û dikarin rê li ber alozîyên dijwar û şerên hişk ên bêeman di navbera dewletan, yan jî komên gelan ên etnîk de vekin, ev yek jî dikare encamên mîna karesatan derêxe holê. Belê ev alozî dikarin li her du alîyan bi awayekî aştîyane û mayînde werin bi dawî anîn. Hiqûqa Navneteweyî dikare bi rêbaz û navgînên cihê palpiştîya dawîlêanîna alozîyên bi vî rengî yên di navbera dewletan de bike. Pirsgirêka deverên ji herêmekê qutkirî, yan jî li ser wan nehatî li hev kirin di navbera beşên federe yên dewleteke federal de jî dikarin bi lihevkirineke cidî ya alîyên alozîyê, yan jî bi hakimtîyê bi awayekî adil û mayînde werin çareser kirin. Di her du rewşan de jî çareserîya aştîyane û mayînde girêdayî vîna her du, yan jî tevahîya alîyên alozîyê ya ji bo dawîlêanîna neheqîyê û tesîrên wê yên neerênî ye, girêdayî amadebûna wan e ji bo liberçavgirtina dualî ya maf û berjewendîyên hev û lihevkirinê ye. Dema ku meriv ji nêz ve li rola UNOyê der barê “erdên li ser wan nehatî li hev kirin” binêre, hingê wê zelal bibe ku Neteweyên Yekbûyî heta niha pêwendî çareserîyeke li gor hiqûqa navneteweyî û mayînde ya erdên qutkirî, yan jî li ser wan nehatî li hev kirin ên di navbera dewletên hukumran de jî bi roleke girîng ranebûne; ne li Kaşmîrê, ne li Qibrisê, ne jî li Sehraya Rojava... û hwd. Qasidê UNOyê (*Stefan de Maestro*) ji bo çareserîya pirsgirêka erdên qutkirî û li ser wan nehatî li hev kirin ên di navbera Hikûmeta Navendî ya Iraqê û Herêma Kurdistanê (2) de sala 2008ê kete nav hewldanan, lê nekarî rewşê bi awayekî erênî biguhere.

▶ R. 4

Hevpeyvîn

Sûrîye û Kurdistana Rojava herroj bi pêşveçûn û bûyereke nû, bi krîz û girhevîyeke nû cihê xwe di çapemenîya cîhanê de digre. Li rêzepirsgirêkên ku tên jîyan herroj yeka din lê zêdetir dibe. Şerê ku li Sûrîye ya ji pir ol, mezheb û etnîkan pêk tê didome, ji niha ve qulibîye qeyraneke navnetewî. Ji hêla din ve, têkoşîna mixalefeta parçebûyî ya li dij rejîma beasî jî her berdewam e. Ji bo ku mesele û pirsgirêkên heyî ji rayagiştî re bên parvekirin me serî li nêrînên serokê Encumena Niştimanî Sûrîyeyê Dr. Abdulbaset Seyda da. Me xwest em bizanibin ka gelo rewş ji alîyê wî ve çawa tê xwuya kirin. Me pirsên ku tên meraq kirin jê pirsîn: Serokê Encumena Niştimanî ya Sûrîyeyê (ENS) Dr. Abdulbaset Seyda ji bo dawîlêanîna herikandina xwînê ya li Sûrîyeyê ji hêzên navnetewî daxwaza çi dike? Têkilî û nakokîyên ku di navbera ENS û Encumena Niştimanî ya Kurdî li Sûrîyeyê (ENKS) de heyî bi çi rengî ne? Krîza li Sûrîyeyê çima her berdewam e? Hêzên etnîkî û mezhebî yên li Sûrîyeyê dê bikaribin ji bo siberojê li hev bikin? Dahatûya Sûrîyeyê çawa dixwuye? Di rastîyê de rewşa bajarên ku ENKSyê girtine bin înîsîyatîfa xwe çi ye? ENS ji bo çareserîya gerambola ku li Sûrîyeyê didome çi pêşnîyar dike? Îhtîmala ji hev parçebûna Sûrîyeyê heye an na? Kîjan hêz rêber û çalakvanên herêmî yên kurd dikuje? Seyda, çi peyam da kurdan? Ji bo bersiva van pirsan û baştir fêmkirina rewşê me bi serokê Encumena Niştimanî Sûrîyeyê Dr. Abdulbaset Seyda re hevpeyvînek lidarxist.

Abdulbaset Seyda: “Divê hêzên navnetewî derbasî Sûrîyeyê bibin û kuştinan bidin sekinandin”

YADO CIWAN

Encumena Niştimanî ya Sûrîyeyê ji kîjan hêzên civakî pêk tê?

Encumena Niştimanî ya Sûrîyeyê enîyeke berfireh e; ji gelek grupên civakî û siyasî pêk tê. Herweha di nav vê encumenê de şexsiyetên serbixwe jî cîh digrin. Yanî ji alîyê sîyasî ve, weke ku di ‘Daxuyanîya Şamê’ de jî hatiye dest nîşan kirin, ji kesên lîberal, ên çep û ji yên qewmî pêk tê. Grupên civakî tê de têne temsîl kirin. Yanî, ereb in, kurd in, suryanî ne, aşûrî ne. Ji alîyê dînî ve jî hemû dîn tê de hene. Weke rengînbûna civaka Sûrîyeyê.

Meriv dikare îro li Sûrîyeyê li hember Esed û rejîma beasî qala mixalefeteke hevgirtî û yekpare bike?

ILTER REZAN: **Ji rêzewêneyên Pavilyona Kurdistan a Venedîgê**, li ser tuwalê teknîka tevlihev

Yanî ez dibêjim, meseleya Encumena Niştimanî ya Sûrîyeyê gaveke girîng e di warê yekîtîya mixalefetê de. Ji hêla din ve, weke ku em hertim dibêjin, hin alîyê din jî wek mixalefet hebûna xwe diparêzin. Hertim jî me xwestiye ku em bi mixalefeta derveyî xwe re dîyalogê deynin, em ji wan dixwazin ku ew jî tevlî karên encumenê bibin û em bi hevdu re piştgir bin di vê meselê de. Niha gelek ji wan dixwazin bêne nav me. Meha bê wê civînek me çêbibe. Ji bo ew kesên ku nexwazin tevlî me bibin jî, em dibêjin, dema tevlî encumenê jî bûn, dîsa dikarin şexsiyeta xwe biparêzin. Bila nêrînên wan ên cuda hebin. Lê em dîsa dikarin hin karan bi awayekî hevpar bi hev re bidin meşandin. Em dikarin bi hevûdin re komîteyan ava bikin, em dikarin di navbera xwe de harmonîyekê çêbikin.

Kî ne ev hêzên cuda yên mixalefetê ku naxwazin di bin sêwana encumenê de cîh bigrin?

Ên ku vêga ne di nav encumena me de ne Encumena Niştimanî ya Kurdî ye. Di nav me de gelek guftûgo hene. Herweha hin komên qewmî yên erebî û hin hêzên şiî hene. Ji bo ku meriv bikaribe hin tiştan tertîb bike, di nav me û van hêzan de danûstandin berdewam in.

▶ R. 3

www.arsivakurd.org

EDITO

"Wexta me nema..."

Serge Halimi

Yên dilşikestî ji ber kêm baldarîya merivan ji bo doza wan û çalakîya wan pir caran bi heman ravekirinê re rû bi rû dimînin: "Wexta me nema". Wexta me nema da ku em pirtûkeke "zêde dirêj" bixwînin, li kolanan, yan jî li muzeyekê bigerin, yan jî li fîlmekî ji nod deqîqeyan dirêjtir temaşe bikin. Wextê me ji bo xwendina nivîseke li ser mijarareke nenas jî tuneye. Ne ji bo mîlîtanîyê, ne jî ji bo tiştekî din tuneye, lewra kengî em dest bi tiştekî dikin, li her deverê, kêlîya piştre telefon lê dide û divê em bi awayekî lezgîn bala xwe bidin tiştekî din.

Li alîyekî sedema vê kêmbûna demê derketina holê ya teknolijîyên nû ye ku destûr dan em dema xwe zêde bikin: Çûn û hatin bileztir bû, leza lêgerînê û şandina agahdarîyan, ya têkilîdanînê jî ku pirî caran gelekî erzantir û bi leztir e. Lê di heman demê de daxwaza bilezbûnê timî di plana rojane ya herkesî de ye, û hejmara tiştên ku divê meriv di rojekê de biqedîne pir zêde bû. Em timî girêdayî xeta înternetê ne. Qedexe ye ku meriv wexta xwe vala derbas bike. Wexta me nema. (1)

Carinan jî sedem kêmbûna pereyan e: Meaşê me edî têrê nake. Her çiqas rojnameyek ji paketek çixare erzantir be jî, rojnameyeke weke *Le Monde diplomatique* mesrefekê ferz dike ku gelek mûçegir, bêkar, kesên xizan, yan jî teqawid weke zêde dihesibin.

Tevî sedemên din, ev sedem rave dikin çima rojnameyên bi peran tên firotin, balê nakşînin. Beşeke ji xwendevanên *Le Monde diplomatique*ê ew terikandin ji ber ku ev pencereya ji kaxezê ya li dinyayê vedibe, li benda postavan, yan jî rojnamefiroşî man êdî bû ferzeke xwendinê ya zêde ye ji bo rojeke ji xwe zêde tijî –û eger divê peran pê bidin hê xirabtir e. Yek ji xwedîyên Free û *Le Monde diplomatique*ê, birêz Xavier Niel, pêş dibîne ku wê di dema nifşa nû de rojnameyên kaxezî ji holê werin rakirin.

Eger pere pêdana rojnemeyan li ser ekranê, yan jî li ser ekrana taktîl bihata dayîn, belkî tu sedem nemaya ku meriv fikaran bike: Li şûna ku bi şiklekî bidin, wê bi şikilekî din bidana. Ya ji vê jî çêtir zanist, çand, kêf û şahî, agahdarî wê bi leztir belav bibûna, nexasim li gundên herî dûr. Herçî kovar in yên ku ji bilî bi destxistina karê (yan jî têsîr kirinê) tu projeya wan a redaksyonî tuneye, eger tune bibin wê tu zirarê li demokrasîyê nekin. Lê belê teknolojîyên nû yên agahîyê kar û mûçeyê rojnamevanan misoger nakin, ji bo wan ne weke berê ye. Lê eger rojnamevan bixwaze belaş û jidil bişuxile, eger dahatên wî ku ji karekî din tên, hebin, weke piranîya blogvanan, ev tiştekî din e. Lê pîşeyê rojnamevanîyê bi tehlûkeya herî xirab re rûbirû ye: Ew nizane gelo siberojeke wî heye yan na.

Di trenê de, di metroyê de, li qehweyê, li kongreyeke siyasî: Berê çapemenî li van deveran desthilatdar bû; êdî bi tenê çend kes hene ku li van deveran rojnameya xwe derxe û bixwîne, ji xeynî rojnameyên "belaş"? Gelo em in yên wisa hîs dikin? Na, hejmara firotina rojnameyan bi istîqrar rastîya qutbûnekê piştrast dikin. Li Ewropaya Rojava û li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, weşana rojnameyan di van pênc salên dawî de % 17 kêm bû. Û ev paşveçûn her diçe zêdetir dibe. Li Fransayê, pêvajoya germ a hilbijartinan nabe sedema tu vegera ber bi firoşgehên rojnameyan ve; ji meha çileya heta tebaxa 2012ê, firotina weşanên rojane yên giştî li gor sala berê % 7.6 kêm bû. Di dema Olîmpîyatan de jî, ji meha hezîranê heta tebaxa buhurî, firotina kovara sporê bi navê *L'Équipe* ya reqîba bêreqîb kêm bû.

Bi hêvîya ku meyîleke wisa wê ewqasî bi lê nedomîne, rojnamevanîyeke ya li zengîlan dixe û rast nameşe, hejmara weşana nivîsên balkêş yên di rûpela yekem ya rojnameyan de qat bi qat bû, ew bi rêya îhlalkirina jîyana şexsî, yan jî bi rêya nivîsên ku hertiştî weke «salên herî reş yên dîroka me» nîşan dikin û panîkê çêdikin -provakasyonên hindik tên dîtin, yên karîkatûrvanan, yan jî li hevkombûna grubên radîkal tê de. Kanalên agahdarkirinê yên bênavber vê rewşê xirabtir dikin. Edî pêşdîtina mijarên ku wê bala medyayê bişkîne ser xwe tiştekî pir hêsan e, yan jî behsnekirina girîngîya bûyer û agahîyeke ku divê meriv ne tenê bi «min jê hez kir» yê di bin rûpela blogekî de bersivê bide. Besîtkirin û weke felaketê behskirina bûyer û agahîyan zêdetir belav dibe, piranîya xwedîyên çapêmenîyeke bi vî rengî xeyal dikin ku wê bibin sedema «buzz» ekî ku çend saetan didome. Lê di rastîyê de, wê çawa meriv pere ji mişterîyan bistîne ji bo tiştekî ku dikare li devereke din belaş û bi hejmareke bilind peyde bike?

Nexasim li ser înternetê. Iro bîst û pênc mîlyon bikarhênêrên înternetê li sîh û pênc mîlyon xwendevanên rojnameyan li xwe zêde dikin, ew serê mehê yê herî kêm li sîteyeke çapemenîyê meyze dike. Lê bikarhênêrên înternetê bi adetî bawer dikin ku serdema desthiladarîya civaka bê pêwîstîya pere pêk hat -ji xeynî wextê bi lêz diçin komputereke biha, *smartphone-ekê,*yan jî ekraneke taktîl ya bi navê tablet ji xwe re peyde bikin. Piranîya wan jî bikaribin çapemenîyeke belaş bixwînin peyde dikin. Mişterîyên li ser înternetê ji yên ku li agahîyê digerin, edîte dikin, sererast dikin û rastbûna wê kontrol dikin re tu para kar nahêlin. Bi vî rengî mekanîzmayeke aborî ya parazît tê ava kirin ku tevahîya para kar ya bazarê dide hinan û ku dike hinên din berdêla giran ya «belaşbûnê» didin. (2)

Ji bo nimûne, rojnameyeke weke *The Guardian*ê, bi saya malpera xwe ya înternetê bû rojnameya yekem ya Inglîstanê û rojnameya seyem a cîhanê, tevî ku vê yekê di sala buhûrî de, rê li ber windakirina 57 mîlyon ewro û ji kar derxistina bi qasî sed rojnamevanan negirt. Lewra, tevî ku timî zêdetir pererazandin jê re lazim e, wexta bikaranîna înternetê ji bo xwendina rojnameyan zêde dibe, bi giştî di heman demê de hejmara firotina wan li firoşgehên rojnameyan kêm dibe. Helbet biqasî şeş mîlyon brîtanî herî kêm hefteyê nivîseke *Guardian*ê dixwînin, lê bi tenê du sed û yanzdeh hezar ji wan her roj wê dikirin. Ev hejmara piçûk a xelkê ye ku her kêm dibe, ya ku xwendina belaş a bikarhênerên înternetê finanse dike. Wê muheqeq rojek bê ku ji ber nemana benzînê ev rêwîtî bi dawî bibe.

Îdîaya edîtoran ku rast derneket herwiha ya reklamê bû. Di destpêkê de, modela "belaşbûnê" ya li ser înternetê mentiqa aborî ya radyoya taybet a ji bo karê teqlîd dikir, piştre ya weşanên rojane yên karkerên erzan sibehî zû di stasiyonên metroyan de belav dikin, teqlîd kir. Lê meriv ji zû ve dizanin ew çawa dişuxilin. Radyoyên taybet (RTL, Europe 1, NRJ…) ku tê de bername di navbera rekamên ku gûhên merivî ker dikin, bi lez derbas dibin. Herçî weşanên li stasyonan belavkirî, *Direct Matin* û *Métro*, yek milkiyeta birêz Vincent Bolloré ye û ya din a kanala televîzyona fransî TF1ê ye, xwedî projeya civakeke belaş in, bi şertê ku wê ev civak para wan a kar mezintir bike. Ji bo ev yek pêk were, bes e ku heqê tevahîya kampanyaya reklamê seranser ji şirketa ragihandina reklaman bistînin û di berdêla wê de jî girseyên xwendevan, yan jî guhdaran peşkêşî wan bikin.

Herçî malperên agahîyan li ser xeta înternetê, bêgûman wê hesabkirineke bi vî rengî bibe kelevajîyek, fîyaskoyek. Tevî ku hejmara xwendevanên wan eşkere ye, çavkanîya pereyan ku ji reklamê distînin pir kêm e. Ji ber ku berhema wan berîya her tiştî bi kêrî motorên lêgerinê yên înternetê tê, yên ku li gor birêz Marc Feuillée, serokê Sendîkaya Çapemenîya Rojane ya Neteweyî (SÇRN) veguherîn "*birêveberîyên dêw ên reklaman ku bi qasî tevahîya dahatên şirketên me yên ragihandina reklamê weke hûtan dixwin*". Birêz Feuillée weha dipeyive:"*Di navbera 2000 û 2010ê de, dahata reklamê ya motorên lêgerînê ji 0ê bû 1.4 mîlyar ewro, ya çapemenîyê li ser tevna înternetê ji 0ê bû 250 mîlyon ewro.*" (3) Googleê ku di derheqê xwendin û hezkirinên her yekî ji me de xwedî agahîyên hûrgilî ye, (weke Facebookê) dikare bi yek car van çîyayên agahîyên şexsî bifiroşe şirketên reklamê yên ku wê wan bi kar bînin ji bo baştir bigihin "nêçîrên" xwe. Google jî li Irlanda û li giraven Bermûdayê di warê "kêmkirina para dahatê ku divê ji bacê re veqetînin bû pispor". Ev şirketa dêw a navneteweyî hema hema hîç bacê nade.

Tevî ku rewşa çapemenîyê xirab e, piranîya rojnameyan vê yekê vedişêrin bi rêya sernavên ku zêdetir hejmarên nerast derdixin pêş. Bi vî rengî beşek ji weşanan weke firotî tê hesibandin –zêdetir ji % 20ê *Echos*, *Libération* yan jî *Figaro*yê – di rastîyê de li stasyonên trênan, li şirketên balefiran, li dikanên luks, li hotelan, li dibistanên bazirganîyê, li parkên erebeyan belaş tên dîyarî kirin. Herçî hejmara aboneyan tê îdia kirin heye, ew jî heke teknîkên firotinê yên bi erzanî yên weke "*Hard discount*" nehatana bi kar anîn, ew ê pir kêm bibûna. Weke nimûne rêveberê *Nouvel Observateur*ê yê devliken, 13 kovarên xwe bi 15 ewroyan difiroşe û xelatekê dide "*saeteke Lip classics ya koleksîyonê*". Patronê *L'Express*ê yê ku destmalên rengîn li xwe dike, formuleke baştir pêşnîyaz dike: Ew 45 kovaran bi 45 ewroyan difroşe û pê re jî "*alarmeke şîyarkirinê" ku lampe û dengên wê gelek in, dikarin atmosferên cîhê biafirîne*" dide.

Kiryarên din jî destûrê didin ku hejmara xwendekarên li ser Înternetê zêdetir bibe. Weke nimûne, wexta sernivîseke çapemenîyê ku birêz Serge Dassault xwedîyê wê ye, malpereke di warê lîstîkên li ser sehneyan, yan jî di warê rewşa hewayê de pisporbûyî bi dest dixe, ew destûrê dide Le Figaroyê ku kesên bîleta xwe ya tîyatroyê li ser înternetê dikire, yan jî kesên rewşa hewayê ji bo betlaneya xwe meraq dikin, di cîh de weke xwendevanekî "markaya" Le Figaroyê bihesibîne…

Em bi deqerûtîya xwe jî bi hêsanî xwe bidin fêm kirin: Ji çile û vir ve, belavkirina *Le Monde diplomatique* % 7.2 kêm bû. Dem ne yeke baş e, pere jî kêm in, li hemberî krîzeke ku me berîya herkesî pêş dîtibû, hinekî bêhêvîmanê xwe bi cîh kir. Em bi tena serê xwe nikarin çareyekê bibînin, nerazîbûneke ku ji sîstema aborî û civakî acîz e heye ku jê re zehmet çareserîyên siyasî bibîne: Tevahîya van tiştan kirin ku em bi paş kevin.

Kêmkirineke nû ya dahatên me yên reklamê li xirabûna rewşa me ya aborî zêde dibe. Ji bo xwendekarên me yên ku ji dahatên bi vî rengî acîz in, divê em bibêjin ku me soz da ew ê tucarî % 5ê dahatên me nebihurin. Di 2012ê de, wê negihîje % 2yê jî...bi saya siyaseteke ku di warê buhayên abonmanên me de ji ya xwe naye xwar –em fiyetên xwe erzan nakin û ji xeynî rojnameyê ku xwendevan siparîş dikin tu tiştî din nadin– û bi saya kampanyaya alîkarîyê ku her sal di heman wextê de em li dar dixin, û ku destûrê dide em projeyên xwe yên bipêşketinê fînanse bikin, zirarên me wê mutewazî bin. Lê sala 2012ê budceya vê rojnameyê wê li hev dernekeve. Û tu tişt misoger nake ku sala pişt re wê rewş biguhere.

Lê dîsa jî tavik û tîrêjên rohnîyê hene ku vê tabloyê hinekî geş dikin. Hejmareke nû ya elektronîk wê di mehên bê de were weşandin. Ew ê destûr bide ku xwendevan bi yek carê bikaribe ji formatekî bi şikil û mîzanpaja xwe dişibe formatê rojnameya kaxezî derbasî formatekî li gor her şiklê ekranan eyarkirî. Û herwiha hejmareke teybet tê amade kirin ji bo bi kompûterên tablet yan jî bi amûrên xwendinê yên din bê xwendin. Li alîyekî din jî em pê hisîyan ku arşîvên me gelekî bala xwendevanan dikşandin –firotina DVD-roma me ya dawîyê ji ya em li hêvîyê bûn pir zêdetir bû. Lewra em ê ji tevahîya aboneyên xwe re peşnîyaz bikin ku di berdêla fiyetekî pir erzan de bikaribin tevahîya nivîsên di *Le Monde Diplomatique*yê de weşandî bixwînin, yên ji dema rojnameyê nû dest bi weşanê kirî, ango ji sala 1954ê heta bi yên hejmara dawî. Û bi ser de jî, bi saya buhayekî qubale wê mimkin be aboneyên me û kesên ne abone jî bikaribin çend rojan li ser hev xwe bigihînin arşîvên me yên belgeyî. Ev formalîteyên nû yê tevna înternetê, ku em hêvî dikin em ê ji destpêkê sala bê û pêve bidin xebitandin, bûn sedema pererazandina me ya mîqdareke pir giran. Em jê hêvî dikin ku wê di dawîyê de dahateke bi îstîqrar ji me re bînin. Ew ê di parastina serxwebûna xwe de alîkarîya me bike.

Lê herwiha divê em bi hev re destekê bidin firotina rojnameya li ser kaxezê çapkirî. Ev jî tê maneya ku divê herkes bi hebûna wê bihise. Lê rojnameya me li ser refên firoşgehan û yên malên çapemenîyê de zêde xuya nake, lewra tevna belavkirin û firotina rojnameyan her diçe piçûktir dibe. Karkerên firoşgehên rojnameyan û firoşkerên rojnameyê ku karê wan ji yên herî zehmet e û ku neçar in şert û saetên kar ên merivî ditirsînin qebûl bikin, ji ber reqabeta çapemenîya ku jê re "belaş" tê gotin bi sedan dikanên rojname difirotin di salên dawî de li petaxê ketin û dikanên xwe girtin (bi tenê sala 2011ê, 918). Lê belê bi saya wan bû ku me têkilîya pêşî bi xwendevanên xwe re danî. Wekî din em ê bi kesên hê ne abone re çawa bidin zanîn ku me lêkolînek, analîzek yan jî hevdîtenek li ser filan mijarê çap kiriye?

Wextê mijar *Le monde diplomatique* be, promosyona biratîyê [rêxistineke ku piştgirtîya çapemenîyê dike, nota wergêr] ku bi adetî pir deng derdixe, bi yek carê bêdeng bû. Bi vî rengî di navbera 19ê adara û 20ê nîsana 2012ê de, me demek tesadûfî li gor amadebûna stajerekî xwe hilbijart, tûrên nûçeyan yên radyoyên Eyrope 1, Rtl û France Inter behsa 133 servnavên rojname kirin, behsa *Le Figaro* (124 caran), *Libération* (121 caran) kirin û helbet behsa *France Football* û *Picsou Magazine*ê jî kirin. Yek cara bi tenê jî behsa *Le Monde diplomatique*ê nehat kirin. Zehmet e ku meriv ji vê hindiktir alîkar be bi rojnameya sereke ya Fransayê ya li cîhanê tê weşandin (pêncîhûyek weşan bi sîh zimanên cihê) ...

Di rastîyê de xem nake: Tevna me ya civakî hûn in. Yanî berî her kesî divê hûn vê rojnameya mehane, nirxên wê bidin nasîn û piştgirîyê bidin helwêsta wê ya entelektuel û barê doza ku girt ser milê xwe. Divê hûn li derdora xwe bidin fêm kirin ku li hember her "polemîkê" ne hewce ye bersiveke lezgîn were dayîn, ne hewce ye meriv dest biavêjê her tiştî û negihîje tu tiştî, ne hewce ye her tiştî bixwîne û tu tiştî di bîra xwe de negire. Û divê hûn bibêjin ku baş e meriv –mesela mehê careke?– ji nav qelabalixê derkeve û biryarê bide ku bifikire.

Rojname bi kêrî çi tên? Bi kêrî fêrbûn û fêmkirinê tên. Ji bo hinekî maneyê bidin kaosa dinyayê ku tê de yên din agahdarîyan berhev dikin û li ser hev kom dikin. Ji bo bi awayekî aram li têkoşînên xwe bihizirin, û yên ku têdikoşin nas bikin û bidin nasîn. Ji bo tu cara bi sedema referansên hêzek nîşan dide piştigirtîya wê nekin, heke ev hêz wê di pratîkê de xiyanetê li wan bike. Ji bo girêka nasnemeyî ya şerê şaristanîyan a ji bîr kiriye ku mîrasa "Rojavayê" tûrikê Qesra Havînê ye, xirabkirina derûdorê ye, herweha sendîkalîzm e, ekolojî ye, femînîzm e jî -şerê Cezayîrê ye *û* "hemalên valîzan" e. Û ji bîr kiriye ku "başûr" , welatên bi pêş dikevin e yên ku nîzama kolonyal ji hev dixin, yên ku hêzên serdema navîn dihewînin, "elîtên" li benda nêçîra xwe ne û tevgerên ku li dijî wan têdikoşin dihewîne –şirketa dêw a taywanî Foxcom *û* karkerên Shenzen tê de ne.

Rojname bi kêrî çi tê? Di demên paşketinê û ji têkoşîne qutbûnê de bi kêrî dîtina rêyên nû yên afirandina têkîlîyên civakî, aborî û ekolojîk tê. (4) Bi kêrî xurtkirin, yan jî şermezarkirina sosyal-demokrasîyan tê yên ku bîhn li wan çikîya û qudûmên wan şikestin. Weke nimûne fikra baca li ser danûstandinên pereyî di quncikên vê rojnameyê de peyda bû (5), fikra sînordarkirina dahatan jî. (6) Her dû tişt gelekî belav bûn, û li gor gotinên çend rojnamevanan, nivîsa me ya meha sibatê bihurî ya li ser mijara sînordarkirina dahatan, tesîr li birêz François Hollande kir û îlham da pêşnîyaza wî ya afirandina baceke % 75ê li ser dahatên ji 1 mîlyon ewroyê zêdetir. Lewra rojnameyek dikare bi bîr bixe ku çapemenî timî li dijî wan kesên bi israr têdikoşin ji bo dinyaya me rizgar bikin û ji bo cîhanê biguherin, alîgira pîşesazî û bazirganan nîne.

Bêguman, hebûn û pêşketina rojnameyên bi vî rengî nikare bi tenê girêdayî xebata ekîba ku wê amade dike be, ew çiqasî jidil û bihêvî be jî. Lê em dizanin ku em dikarin bawerîya xwe bi we jî bînin. Bi hev re, em ê nelezînin, bi wext tevbigerin.

(1) *Binêre li* "La tyrannie de la vitesse" ("Dîktatorîya lezê"), *Sciences Humaines*, tîrmeha 2012ê.

(2) Gotara li jêr bixwîne: "L'information gratuite n'existe pas" ("Agahîya belaş tuneye"), http://www.monde-diplomatique.fr/carnet/2010-10-07-information

(3) *Correspondance de la presse*, Parîs, 17ê îlona 2012ê.

(4) Weke nimûne gotarên li jêr bixwîne: Bernard Friot, "La cotisation, levier d'émancipation" ("Bacdan, hîmê serxwebûnê), *Le Monde diplomatique*, sibat 2012 ; Le temps des utopies (Dema utopyayan), *Manière de voir* hejmar 112, tebax - îlon 2010.

(5) *Binêre li* Ibrahim Warde, "Le projet de taxe Tobin, bête noire des spéculateurs, cible des censeurs" ("Projeya baca Tobin a ku spekulator hez jê nakin û notdêran jî ew ji xwe re kir hedefa [êrîşan]) û Ignacio Ramonet, "Désarmer les marchés" ("Bêçêkkirina bazaran") , bi dorê di *Le Monde diplomatique* a sibat û kanûna 1997ê de.

(6) Gotara li jêr bixwîne: Sam Pizzigati, "Plafonner les revenus, une idée américaine" ("Sînordarkirina dahatan, fikreke amerîkî) , *Le Monde diplomatique* , sibata 2012ê.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

Le Monde diplomatique kurdî (Çapa elektronîk)
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

Lijneya Weşanê
Murad Satik
Riza Dînç

Le Monde diplomatique kurdî

Redaksiyona Zimanî
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

Koordînasyon
Yado Ciwan

Alîkarên vê hejmarê
Nedîm Baran
Semra Polat

Revîzyona Wergeran
Feryal Guladawîya

Berpirsê Hunerî
Hasan Huseyîn Devecî

Designer
Fabio Biasio

Web Developer
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@diplo-kurdi.com
www.diplo-kurdi.com

ABONETÎ
Independent Kurdish Media Group GmbH
Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

Abonetîya dîjîtal ya salane: 30 €

Le Monde diplomatique

Damezrîner
Hubert Beuve-Méry

Birêveberê giştî
Serge Halimi

Sernivîskar
Maurice Lemoine

Cîgirên Sernivîskarî
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

Redaksiyon
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

Birêveberê hunerî
Alice Barzilay

Dokumantasyon
Olivier Pironet

Sekreter
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

www.diplo-kurdi.org

Seyda: “Divê hêzên navnetewî derbasî... (Dewama rûpela 1)

Encumena Niştimanî ya Bilind a Kurdî çima di nav Encumena Niştimanî Sûrîyeyê de cîh nagre?

Li ser vê yekê di navbera me û Encumena Niştimanî ya Kurdî de guftûgo berdewam kirin. Konseya Bilind vê talîyê derket meydanê. Me bi Encumena Niştimanî ya Kurdî re gelek civîn li dar xistin. Em gelek nêzîkî hev in. Me di vê dawîyê de wek Encumena Niştimanî ya Sûrîyeyê li ser pirsgirêka kurdî ya li Sûrîyeyê dokumentek derxist. Di vir de gelek xalên girîng hene. Yek jê, nasnameya miletê kurd li Sûrîyeyê bi şêweyekî zelal tê qebûl kirin. Mafê miletê kurd ê netewî tê qebûl kirin. Ev tehdeya ku li kurdan dibe, divê bê hilanîn. Bingeh û şertên vê tehdê divê bên hilanîn û li tu kesekî tehde neyê kirin. Wexta ku em rûniştin, me dît ku em gelekî ne dûrî hev in. Carna tê pirsîn, hûn çima nagihên hevdû? Di bersiva vê pirsê de carna meriv zehmetîyan dikşîne. Em gelekî nêzîkî hevdû ne. Îcar biraderên di nav Encumena Niştimanî ya Kurdî de gotin ku, em dixwazin bi Encumena Niştimanî Sûrîyeyê re danûstandinê bikin û em dixwazin karên hevbeş bikin; lê em naxwazin tevlî we bibin. Te dît, ev Konseya Bilind vê talîyê çêbûye û hîn guftûgoyeke cidî di nav me de çênebûye. Têkilîyên me û Encumena Niştimanî ya Kurdî berdewam in.

Xalên herî girîng ku hûn li ser li hev nakin çi ne gelo?

Xalên ne gelekî girîng in. Belkî du xal hebin; em dibêjin, nasnama miletê kurd li Sûrîyeyê, ewana dibêjin hebûna miletê kurd li Sûrîyeyê divê bi şêweyekî fermî bê qebûl kirin. Ji alîyê me ve, em dibêjin, hebûn ji xwe heye. Dema ku tu bêjî nasname, tu wê demê hebûnê jî qebûl dikî. Ne niqteyeke gelekî mezin e. Niqteya din, em dibêjin, em li Sûrîyeyê sîstema îdarî ya merkezî dixwazin, ewana dibêjin, sîstema merkezî ya siyasî. Merkezîya siyasî, yanî federalî dixwazin. Em dibêjin, hîn mejîyê me wek Sûrîyeyê ji bo vê yekê ne hazir e. Yanî rewşa Sûrîyeyê tu nikarî bi ya Iraqê re bipîvî. Wexta ku tu dibêjî merkezîya îdarî ya li ser esasê desthilatdarîya deveran ku wê xurt dike, yanî tu gavekî gelekî li pêş diavêjî. Bi min, ev her dû niqte, niqteyên îxtilafê ne û bi min her dû niqte jî dikarin çareser bibin. Wexta ku îrade hebe meriv dikare çareser bike.

Konseya Bilind a Kurdî înîsîyatîfa îdareya hin bajarên kurdan girt bin destê xwe, hûn vê rewşê çawa dinirxînin?

Ev rewş jî cihê pirsê ye. Niha meriv vekirî bêje, ev bajarana te dît wilo gotin, ev bajarana rizgar kirine û hemû cîh di destê wan de ne, ne wilo ye. Ew cihên ku îstixbarat lê bûn, gişk di cihê xwe de ne.

Di rastîyê de rewş çi ye li vê derê?

Cihên ku îstixbarat lê hene, ango destê hikûmetê tê de heye. A diduya, ev bajarana wexta tu bixwazî rewşê pêşve bibî, yek jê divê kurd xwe bi xwe li hev dû bin. A din, em bêjin bajarên wek Qamişlo û Serê Kanîyê. Ne tenê kurd li van bajaran dimînin. Kurd in, ereb in, suryanî ne, ên din in. Yanî gerek haya te ji wan jî hebe. Nakokî û acizî çenebin. Ji ber ku ev xelkana dê li van bajarana bijîn. Yanî divê haya meriv hinekî ji vê meseleyê jî hebe. Tiştên ku heta niha li vê derê çêdibin, hêza ku biryar dide, hêzeke nêzîkî PKKê ango PYD ye. Em dibêjin û me ji wan re jî got, em wek partî ne li dijî we ne, lê divê hûn xwe wek hêzeke ji Sûrîyeyê û nêzîkî şoreşa Sûrîyeyê bibînin ku hûn cihê xwe bigrin. Tu nikarî bêjî welleh ez ji alîyekî ve parçeyek ji vê şoreşê me û ji alîyekî din ve jî bêjî, xortên bi şoreşê re ne divê bêne çewsandin. Divê ev mesele hinekî bê zelal kirin. Îcar ev yek problemek e û weke ku tu dibînî her car nakokî çêdibin û carna jî ne di navbera me û wan de çêdibin. Di orta wan û Encumena Bilind a Kurdî de çêdibin. Di orta wan û civakên kurd ên ku li derveyî van de ne çêdibin. Ji ber ku niha hin xortên me hene ku xwepêşandanan dikin, ne bi vir re ne, ne bi wir re ne. Wek serbixwe ne. Yan jî, dezgehên taybet çêkirine û ji rojên ewil ve ew jî bi şoreşê re ne.

Di hundirê Encumena Niştimanî ya Sûrîyê de jî bo çareserîya pirsa kurdî nakokî hene an tunene?

Na. Ew dokumenta ku me derxist, dokumenteke hevpar e, lê weke ku min got, ENS xwedî sêwaneke berfireh e; ji hêzên îslamî heta kesên sekuler gelek kes tê de hene. Gişan jî ev dokument qebûl kir û tu problem li cem wan tuneye. Bes wexta ku meriv jî li pirsa xwe xwedî derkeve û li meseleyên din jî binêre. Gelek caran daxuyanî ji Sûrîyeyê derdikevin û gelek kurdên me lê dinêrin te dî xalek li ser kurdan heye, bi tenê wê minaqaşe dikin. Niha heger li welat giş bi xêr be, wê hinek ji wê xêrê jî bigihîje meriv. Hema ez bi çavekî teng tenê li meseleya xwe ya kurdî binêrim û îşê xwe ji yên din neynim wisa çênabe. Ez bawer im pirsa me bi tevahî çareser nabe wexta ku demokrasîyek xweşik li Sûrîyeyê tetbîq nebe. Nimûneyek li pêşîya me heye. Hûn dizanin li Kurdistana Iraqê, di 11ê adara 1970ê de li hevdu kirin da ku hemû tiştan bidin kurdan, lê belê çima neçû serî? Ji ber ku rejîmek dîktator hebû, kengê ya wê hat ber wê, wê demê pê li wê peymanê kir û wek xwe kir. Wexta ku demokrasî hebe, mucadele hebe, wê demê meriv bes li ser hin tiştan an li hev dike, an nake. Berî demekê em li Îtalyayê bûn. Me behsa meseleyê kir û me got, hin tişt hene mafên mileta ne, nabe li bendê bê sekinandin. Ew dikevin destûrê û resmî dibin. Nabe em bêjin, em mafên kurdan bidin wan an nedin wan. Mesele wilo çareser nabe. Gelek nimûne hene û meriv dikare feyde jê bigre û bes e. Weke Belçîkayê, weke Swîsreyê heta Îspanya, Swêd û wek dewletên Amerîkaya Latînî li dinê gelek nimûne hene û meriv dikare ji van mînakan îstifade bike.

Hûn wek Encûmena Niştimanî ya Sûrîyeyê Sûrîyeyeke çawa dixwazin?

Em Sûrîyeyeke demokratîk, sîvîl û pirolî dixwazin. Hemû kes tê de wek hevûdin bin. Di nav ti qewmîyet, dîn û mezhebê de pirsgirêk tunebin, wek hevûdin bin. Û li ser esasa ku her kes xwedî maf be û ev maf di hundirê çarçoveyekê de bêne parastin.

Mînakek an welatek wisa heye ku we daye ber xwe?

Niha her welatek rewşa wê cuda ye. Wek modêl, Belçîka heye, Swîsre heye, li van welatan gelek milet hene û bi hev re dijîn. Lê belê di talîya talî de divê li gor şertûmercên Sûrîyeyê gav bên avêtin. Lubnan heye, Îraq heye. Ew jî wek meseleya rewşa Sûrîyeyê ne. Belkî xisûsîyetên wan tev de ne wek hev bin, lê em dibêjin, li Sûrîyeyê wê çawa pirsgirêk çareser bibin, em di çarçoveyeke wilo de çareserîyekê dixwazin.

Dema meriv li Sûrîyeyê dinêre, rêxistinbûyîn û parvebûna hêzan li gor esasên etnîkî û mezhebî çêbûne; ev yek ji bo siberoja Sûrîyeyê ya piştî rejîma beas jî gelo ne xetereke mezin e ji bo parçebûnê?

Ev hikûmet dixwaze vê yekê di orta sunî û elewîyan de bike nakokî. Mesela kurdan jî hinek ji wê tê. Hikûmet dixwaze kurdan û xrîstyanan dûrî şoreşê bihêle. Bide xuya kirin ku ev şoreş tenê îslamî ye, tenê ên ku wê şerîetê bînin vî îşî dikin. Ji bo ku xelkê pê bixapînin. Bi ser de jî xelkê pê ditirsînin. Binêre, rewşa Sûrîyeyê ber bi rewşeke tarî ve diçe, lê di heqîqeta xwe de ne wilo ye. Yên ku ji bo vê şoreşê rabûne, xortên xwendevan in, ên unîversîtêyan in. Dixwazin Sûrîyeyeke nû ji bo nifşên nû bînin. Û hemû kesên Sûrîyeyê tê de bêşdar in. Niha ez ji te re bêjim, ereben elewî ne, sunnî ne, mesîhî ne, kurd in, giş, di şoreşê de bêşdar in. Lê belê siyaseta ku hikûmet dimeşîne, hikûmet dixwaze van newekhevîyan têxe nav xelkê , xelkê xwe bi xwe jî bera hevûdin bide. Ji ber ku dema xelk bi hev neke, ya ku bi qewet dimîne rejîm e.

Dînamîkên ku Esad û rejîma Beasî li ser pîyan dihêle û temenê wê dirêjtir dikin çi ne?

Alîkarîya derveyî ye. Alîkarîya sîleh û pere ye. Heta zilam ji alîyê Îranê ve tên. Rûsya bi xwe jî alîkarîyê dide wan. Û wekî din, di meseleya siyasî de piştgirîya wê dikin. Di qada navnetewî de çi peyman wê li hember rejîmê bê girtin evana rê li ber digrin. Rejîm bi vî awayî berdewam dike.

Heger ev pêvajoya nezelal a li Sûrîyeyê hîn demeke dirêj bidome, gelo îhtîmal heye ku hêzên navnetewî midaxele bikin?

Sûrîye dewleteke girîng e. Dewletek e ku li Rojhilatê Navîn cîhekî wê yê taybet heye. Mesela, tiştek li vir biqewime, wê li Iraqê, li Lubnanê biqewime, wê midaxaleya Tirkiyê hebe. Û ev yek rewşê dûvdirêj dike û bi vî awayî jî ew hêzên ekstremîst hîn xurttir dibin. Heger wisa bibe, dê xeter li ser tevî çêbibe. Heger ev rewş wilo bidome bi me ev yek ne dûr e. Divê hêzên navnetewî derbasî Sûrîyeyê bibin û van kuştinan bidin sekinandin. Kuştina rojê 200 kes, 300-400 kes. Ev yek li ti cîh û deverî nayê qebûl kirin. Va ye salek û nîv e ev rewş berdewam e, lê tu dibînî cîhana navnetewî jî negihaye wê qeysa ku berpirsîyarîya xwe bîne cîh.

Li Rojhilatê Navîn, nexasim bi 'Bihara Erebî' re guhertin û serûbinbûnên siyasî derketin meydanê, rejîm hatin guhertin. Heger sibê Sûrîye ji hev parçe bibe, dê li Rojhilatê Navîn tesîreke çawa çêbike?

Ne bawer im wilo çêbibe. Niha meseleya parçebûnê, li Sûrîyeyê ew şert tunene. Belkî ku niha hin kes dibêjin heye, yanî carna behsa elewîyan dibe, behsa kurdan dibe li ser parçebûnê. Yanî ne elewî dikarin parçe bibin, ne jî kurd dikarin parçe bibin. Yanî deverên elewîyan di nav hevûdin de ne. Piranîya elewîyan bi xwe jî li dij parçebûnê ne. Dixwazin bi Sûrîyeyê re bimînin, digel ku rejîm hewlê dide ku di nav elewîyan û sunîyan de pirsgirêkan çêke. Deverên kurdan jî ji xwe tevlîhev in. Devera ku gelek kurd tê de hene, devera Cezîrê ye û li wê derê jî kurd û ereb û suryanî di nav hev de ne. Yanî ne şertê Sûrîyeyê, ne şertê derdorê û ne jî şertê cîhanê parçebûnê qebûl nake.

Hûn rewşa Kurdan û siberoja wan bi awayeke giştî û di perspektîva sedsala 21ê de çawa dibînin? Li gor we dê ev mesele ber bi ku derê ve biherike?

Ez dibêjim rewşa kurdan a li Sûrîyeyê wê baştir bibe. Di hundirê Sûrîyeyê de wek parçeyekî resmî kesî qala parçebûnê nekiriye. Lê wexta ku em berheman bi dest xwe bixin, divê meriv parçeyek ji şoreşê be. Yanî wextê meriv dibêje em şirîkên vî welatî ne, kurdên me bêşdar in, ne ku ne bêşdar in. Û çareserkirina pirsa kurdî, gelek caran me gotiye, ne ku me negotiye, rewşa kurdan rewşeke gelek zehmet e. Gelek caran kesî behsa kurdên Sûrîyeyê nedikir, wexta ku me behs dikir, tevî Kurdistana Iraqê, Tirkiyê, Îranê û Sûrîyeyê. Ji alîyekî ve nema mafê wan neyê qebûl kirin. Tehde li wan hate kirin, erdê wan, nasnameya wan jî wan hate girtin. Navên gund û bajarên wan bi zorê kirin erebî. Xortên wan dan pêş da ku bikevin nav artêşê û cehşê, an jî polês. Wezîfeyek nedan wan. Ji Sûrîyeyê xwendevan dişandin derveyî welêt, ji bo perwerdê, ev jî nedan xortên kurd. Deverên kurdan deverên herî paşdemayî ne. Aniha wê ev mesele çilo çareser bibe. Bi ya min, pirsa muhîm ew e ku bawerîya çareserîyê hebe û niha ew bawerî heye. Di hundirê Encumena Niştimanî ya Sûrîyeyê de me dokumentek derxistiye. Di wir de em dibêjin, ev pirsa hanê wê çareser bibe; bi şeweyekî demokratîk û nasnameya kurdan dê bê qebûl kirin. Tehdaya li ser wan wê rabe. Evaya li ser kurdên Sûrîyeyê. Dibe ku parçeyên din jî wê bi vî şeklî çareser bibin. Yanî pirsa kurdî a li Tirkîyê jî wê di hundirê çarçova Tirkiyê de çareser bibe. Jixwe, ew pirs mezintir û girîngtir e ji ya Sûrîyeyê. Çend qat kurd li wir û Îranê hene ji yên Sûrîyeyê zêdetir in. Dema ev mesele çareser bibin, bi ya min, wê têkilîyên di navbera kurdan de gelekî li pêş bin. Ne weke ku wê çend welatên cuda bin.Wê demê, li gor texmîna min, wê kurd bibin pirek, ji bo ku van miletên din, van dewletên din bi hevdû re girê bidin. Niha belkî tê dinêrin, ji wan re wek problemekê ye. Weke ku xweşik çareser bikin, wê demê wê danûstandin û têkilîyên van dewletan jî hîn baştir bibin. Li ser Sûrîyeyê jî, gelek caran ez ji biraderên xwe re dibêjim, heger hûn pirsa kurdî li Sûrîyeyê çareser bikin, 20 mîlyon kurd li ser sînorên we yê bakur in. Li Tirkiyeyê jî wexta wilo bikin, piştevanîya kurdên Iraqê bikin, ên Sûrîyeyê bikin… Bi min, wê rewş û qonaxeke din derkeve meydanê. Dema ku me li Hewlêrê civîna xwe bi Encumena Niştimanî a Kurdî re kir, min nêrîna xwe li wê derê jî got. Berpirsîyarê herêmê jî û Ahmet Davutoglu jî hazir bûn. Min jê re jî got, em çima nikaribin problemên xwe çareser bikin. Li gelek welatan gelek pirsgirêkên mezintir hatine çareser kirin. Wexta ku em dest pê bikin û bawer bikin çareserî rihet e, lê îrade lazim e.

Hûn naxwazin li ser kuştina rêber û çalakvanên herêmî yên wek Mîşel Temo, Mahmûd Walî, Nûsret Bîrkêk, Şêrzad Hacîreşîd nêrînên xwe bi me re parve bikin?

Jixwe heta niha em dibêjin, an rejîm an jî kesên din van karan dikin. Bes tiştê ku min berîya şoreşê got û ez niha jî dibêjim, dibe ku nêrînên me kurdan ne wek hev bin, wek yên ereban. Belkî ne normal be jî ku meriv tev li ser maweyekê be. Fikrên meriv ne wek hevdû ne. A ne normal ew e ku dema ew nêrînên ne wek hev bin ên din bidewsînin û rê li ber kuştinên navxweyî vekin. Evaya divê meriv gelekî lê miqate be. Û meriv nikare ku rewş bi wî alî ve here. Niha li hinek bajaran, ez ê bêjim mesela li Amûdê. Li Amûdê ne rejîmek heye, ne kesek, ez ê rahêjim çekên xwe û li orta cade û kolanên Amûdê de herim û bêm. Baş e, ez li dijî kê çek hildigirim? Evaya pirsek e. Kurdên din jî hene li wir û belkî ne wek te difikirin. Bi çi mebestê tu yê wana bitirsînî? Ji ber ku bîr û baweriyên xwe nebêjin. Evaya nabe mesela. Wexta meriv dibêje, meriv demokratîk e, yan jî ji bo sîstemek demokratîk em vê yekê dikin, ev tiştana nayên qebûl kirin. Hûn dixwazin dîktatorîyekê deynin? Va ye ev miletê hanê ev bû salek û nîv e xwe dikuje li dijî dîktatorîyê. Li dinyayê wê tu cara neyê qebûl kirin ku tu dîktatorekî rakî û yekî din bînî li şûnê deynî. Divê meriv di vê meselê de gelekî bi hesab be û zanibe li dinyayê çawa dere.

Li gor we kiryarên van biryaran tên zanîn?

Hinek jê ne zelal in, bi alîyê hinekan de derin, te dî ew kesên ku xizmeta hikûmetê dikin.

Peyama dawî

Li ser meseleya kurdên Sûrîyeyê ez dixwazim bibêjim, veger nemaye, divê meriv berdewam bike, heta meriv bigihe armancên xwe. Sînorên ku hatine danîn, bi kêfa me be, ne bi kêfa me be û meriv jî bixwaze di hundirê vê çarçovê de meseleya xwe çareser bike, lê meriv şirîkê vî welatî ye. Yanî ez ê hin tiştan bixwazim, ez dizanim bi dest nakeve û ez ê tiştên xwe yên esasî, ez ê dûv jî nekevim, ê ku bixusure em ê derkevin. Ji bo ku meriv nexusure, divê mirov derbasî meselê bibe û şirîkê xwe yê welêt fereh bike. Divê meriv bikaribe xweşik vê pirsa xwe biparêze.

Dr. Abdulbaset Seyda

Seyda, di 22yê hezîrana 1956ê de li bajarê Hesekî ya li rojavayê Kurdistanê hatiye dinê. Doktoraya xwe di warê felsefeyê de li Unîversîteya Şamê çêkiriye. Di navbera salên 1991-94ê de li Lîbyayê di unîversîteyê de ders dane. Li ser şaristanîyên kevin ên Rojhilatê Navîn gelek xebatên wî hene. Ji sala 1994ê ve li Swêdê bi cîh bûye. Dema di 2yê cotmeha 2011ê de Encumena Niştimanî ya Sûrîyeyê (ENS) li Stenbolê hate damezirandin tevlî enîya mixalefetê bû. Di hundirê ENSyê de wezîfeya serokayetîya departmana mafê mirovan girt ser milên xwe. Piştî Burhan Xelyûn di hezîrana 2012yê de bû serokê Encumena Niştimanî ya Sûrîyeyê. Dr. Ebdilbaset Seyda zewicî ye û bavê pênc zarokan e. Di sala 2003yê de pirtûka wî ya bi navê *The Kurdish Issue in Syria:* ‘Li Sûrîyeyê Pirsa Kurdî ‘ hate weşandin.

Di navbera Herêma Kurdistanê... (Dewama rûpela 1)

Erdên qutkirî û li ser wan nehatî lihevkirin li Kurdistana Iraqê

Ji çirîya pêşî ya sala 2005ê ve Herêma Kurdistanê Iraqê weke herêmeke federe û herêma federe ya pêşî ya Komara Iraqê di destûra bingehîn de hat qebûl kirin. Lê belê ji hingê ve di navbera Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Navendî ya Iraqê ango Hikûmeta Federal a Iraqê de çend pirsgirêk peyda dibin ku her diçe qelşên kûrtir dixin nav têkilîyên siyasî. Pirsgirêka erdên qutkirî û li ser wan nehatî lihevkirin dîsa jî pirsgirêka sereke ye. Ev pirsgirêk ji sala 2004ê û vir ve guherî, berîya wê alozîyeke dijwar bû, niha êdî pirsgirêkeke hiqûqî ye, lê belê ew kronîk e û dibe ku ji nû ve veguhere alozîyeke cidî ya ku rê li ber encamên bi tehlûke veke. Lê belê ji ber ku pirs hê çareser nebûye, pirsgirêk herweha di warê hiqûqa destûra bingehîn de jî astengîyek e li pêşîya federalbûna parêzgehên pêwendîdar, yan jî hin parêzgehên Iraqê.

Berîya 2003yê

Pirsgirêka deverên ji Herêma Kurdistanê-Iraqê (û "qada parastî" ya kurdan) qutkirî, yan jî li derveyî wê hiştî di serdema rejîma Baasê de bi awayekî kêfî û di çar qonaxan de pêk hat.

Qonaxa pêşî bi ragihandina "qanûna xweserîyê" (1974) dest pê kiribû, hingê hikûmeta Baasê ya îraqî bêyî ku serjimara li ser hatî li hev kirin û pêwîst pêk bîne, erdên "Herêma Xweser a Kurdistanê" yekalî dîyar kirin. Wê dema ev kirî jî parêzgeha dewlemenda petrolê Kerkûk û deverên din ên girîng yên weke mînak navçeyên Xaneqîn û Mendelî li parêzgeha Dîyalayê; navçeyên Şengal û Şêxanê li parêzgeha Nînovayê (Mûsilê); deverên Bedrê, Casan û Zirabîyê li parêzgeha Wasit li derveyî xweserîyê hiştin, ango ev dever ne weke erdên "Herêma Xweser a Kurdistanê" dîtin. Bi vî awayî erdên Herêma Kurdistanê ji 78736 km²yan daxiste 37062 km²yan, ango nîvî bi nîvî jê kêm kir. Ji ber rastîyên dîrokî û cografîk, û ji ber encamên serjimara sala 1957ê, kurdan doza van deverên lidervehiştî yên ku weke beşeke "Başûrê Kurdistanê" yan jî Herêma Kurdistana Iraqê dibînin, kir. Lewma jî ji bo wan mijar erdên ku ji Herêma Kurdistanê qutkirî ye.

Qonaxa duyem ya pirsgirêkê xwe bi piçûkkirin û parçekirina parêzgeha Kerkûkê salên 1975 û 1976ê da der. Hingê hikûmeta Baasê çar navçeyên ku şênîyên wan bi temamî, yan jî bi piranî kurd bûn ango Çemçemal, Kelar, Kifrî û Dûz Xurmato ji parêzgeha Kerkûkê qut kirin û bi parêzgehên cîran ve girêdan da ku rêjeya kurdan li parêzgeha piçûkkirî ya Kerkûkê kêm bike û (li hemberî vê) rêjeya şênîyên ereb zêde bike.

Di **qonaxa sêyem** a pirsgirêkê de rejîma Baasê sala 1980yê (piştî referandûmeke sexte) navçeya Akrê ji parêzgeha Duhokê qut kir û bi Nînovayê ve girêda, da ku "Herêma Kurdistanê" piçûktir bike. Li derveyî "qada parastî" ya kurdan hiştina navçeya Mexmûrê dema ku ev qad bihara 1991ê hat ava kirin.

Qonaxa çaremîn a alozîyên erdên ji Herêma Kurdistanê qutkirî pêk tîne. Sedemên li derve hiştina navçeyê zelal bûn: Dever di warê petrolê de dewlemend e û di warê çandinîyê de xwedîyê zevîyên berdar ên fireh e. Ev navçe paşê sala 1996ê bi awayê fermî (ji alîyê rejîma Baasê ve) ji parêzgeha Hewlêrê û ji Herêma Kurdistana Iraqê hat qut kirin û bi parêzgeha Nînova ve hat girêdan. Mexmûr di hevdîtinên aştîyê yên di navbera nûnerên hikûmeta iraqî ya berê ya Baasê û nûnerên Bereya Kurdistanê de havîna 1991ê ne devereke li ser nehatî li hev kirin bû, wekî din jixwe tu ragihandina fermî ya li raya giştî (qanûn-biryar yan jî biryar) li ser qutkirina navçeyê ji parêzgeha Hewlêrê jî nîne, dîsa jî navçeya Mexmûrê bi awayê fermî (îdarî) hê jî bi parêzgeha Nînovayê ve girêdayî ye.

Piştî 2003yê

Li Iraqa nû pirsgirêka erdên ji Herêma Kurdistanê qutkirî, pirsgirêka bi awayekî neheq guhertina sînorên îdarî yên hin parêzgehan ji bo armancên siyasî û kêşeya "erdên li ser wan nehatî lihevkirin" wê li gor du xalên "qanûna birêveberîyê ji bo dewleta Iraqê di dema guherînê de" (TAL) ango xala 53yê, paragrafa Ayê û xala 58ê – her du xal jî bingehê xala 143yê ya destûra bingehîn a Iraqê a daîmî pêk tînin – di du qonaxan de werin çareser kirin. Beşa yekem li gor xala 53yê paragrafa Ayê hat çareser kirin; li gor vê paragrafê tevahîya deverên ku 19ê adara 2003yê ji alîyê Hikûmeta Herêma Kurdistanê (KRG) ve dihatin bi rê ve birin –herêmên jê hatî qutkirin jî di nav de– weke pêkhênerên Herêma Kurdistana Iraqê hatin qebûl kirin. Ev dever ji mêj ve li gor destûra bingehîn (ji 2005ê ve) ji alîyê Hikûmeta Herêma Kurdistanê ve tên bi rê ve birin, ji ber vê yekê jî divê êdî Hikêmeta Federal a Iraqê paragrafa A ya xala 53yê pêk bîne; li gor vê jî divê nexşeya îdarî ya Komara Iraqê û herweha nexşeyên dabeşbûnên îdarî yên parêzgehên pêwendîdar ango Nînova, Duhok, Hewlêr, Silêmanî û Dîyalayê werin sererast kirin.

Beşa duyem a pirsgirêkan wê li gor xala 58ê –hîmê xalên 140 û 143yê yên destûra bingehîn a Iraqê ye –ya li jor behsa wê kirî weke pirsa bi awayekî neheq guhertina sînorên îdarî ya hin parêzgehan ji alîyê kevne-rejîmê ve ji bo armancên siyasî û erdên "li ser wan nehatî lihevkirin" jî li gor destûra bingehîn ango bi awayekî heq û di sê qonaxan de werin çareser kirin. Ji bo vê jî divê pêşî astengîyên li ber çareserîyê ji holê werin rakirin. Lewra bêguman pêwîst e alî bawerîyê bi hev bînin û tevahîya gelên pêwendîdar hevkarîyê bikin, belê herweha dewletên cîran (nexasim Tirkîye û Îran) aram bibin. Gaveke girîng a li ser vê rêyê wê bibe lihevkirineke hevbeş a der barê pêvajoya meşandina çareserîya li gor destûra bingehîn de di navbera nûnerên tevahîya gelên deverên pêwendîdar de . Partîyên siyasî yên kurd ên li welatên cîran jî –yên ku li Herêma Kurdistana Iraqê ne– divê ji bo misogerkirina sînorên dewletan ên navneteweyî yên di navbera dewletên cîran ên navbirî û Iraqê (li herêmê) de û ji bo dewama ewlekarî û îstîqrarê li Herêma Kurdistanê alîkar bin; lewma ji nabe ku ji Herêma Kurdistanê li dijî dewletan çalakîyên eskerî, yan jî şeran bi rê ve bibin, lewma li ser Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî ferz e ku li gor qanûnên navneteweyî sînorên navneteweyî biparêze; û hingê Herêma Kurdistanê wê êdî nebe qada êrişên bersivdanê û bombebarandina li ser van dewletan.

Astengîya herî mezin ya li pêşîya pêkanîna xala 140ê ya destûra bingehîn a Iraqê nexasim jî li pêşîya temamkirina qonaxa yekem ango normalkirina rewşê, xwe di sererastkirina bi awayekî neheq guhertina sînorên îdarî yên hin parêzgehan de dide der, li van parêzgehan para bêtir kurd, yan jî erebên şîî diman (Kerkûk, Hewlêr, Duhok, Kerbela û Bexda). Paragrafa B ya xala 58ê ya "qanûna îdarî ji bo dewleta Iraqê ya dema guhertinê" (TAL) van pirsgirêkan birêkûpêk dike, lê belê pêkanîna wê heta dawîya 2010ê hat asteng kirin ji ber prosedûra wê ya tevlîhev û ji ber berxwedana hişk a erebên sunnî li parêzgehên li wan guhertinên neheq pêk hatî (Nînova, Selaheddîn, Dîyala, Enbar –û parêzgeha piçûkkirî Kerkûk), nexasim jî nebûna yekdengîyeke hewce ya serokkomarîyê ji bo pêşnîyazên sererastkirinê. Bi tevahî pêkanîna paragrafa B ya xala 58ê, ku cewherê xala 58ê pêk tîne ji ber vê yekê elzem e ji bo qonaxa yekê ya çareserîyê biçe serî (normalbûna rewşê). Dawîya 2011ê serokkomar Calal Talabanî ji bo vê yekê pêşnûma qanûnek da meclisa Iraqê.

Dawîya sala 2007ê "Komîteya ji bo Pêkanîna Xala 140ê ya Destûra Bingehîn" bi rastî jî bi wezîfedarkirina Desteya Wezîran bi heman armancê pêşnîyazên guncaw kiribûn; ev pêşnîyaz dikarin piştî ku li Komîteya Hiqûqê ya meclisa Iraqê hatin guftûgo kirin, hîmê qanûnên çav li rê ye pêk werin, pêk bînin. Xala 140ê dîyar e lihevkirineke nûnerên tevahîya gelan ên di Komîsyona Nivîsandina Destûra Bingehîn de ye, lewma jî qismê duyem ê pêşnîyazên behsa wan kirî der barê sererastkirina bi awayekî neheq guhertina sînorên îdarî yên parêzgehên Bexda û Kerbelayê li navend û başûrê Iraqê de ye.

Wekî din hemfikrîyek li ser prosedûrên serjimar û referandûmên ji berê ve dîyarkirî, pêwîst û adil yên qonaxên duyem û sêyem ên çareserîya li gor destûra bingehîn a alîyan li ser lihevkirî, herweha li ser temamkirina bicîhanîna xala 140ê ya Destûra Bingehîn piştî guftûgokirina mijaran ji alîyê nûnerên tevahîya gelan û cemaetên dînî yên li deverên pêwendîdar ve diviyabû pêk were; her du pêvajo jî divê ji alîyê komîteyên hevpar, bitewazun û guncaw ve werin bi cîh anîn, şopandin û çavdêrîya wan were kirin; divê nûnerên UNOyê û rêxistinên navneteweyî yên mafên merivan jî beşdarî pêvajoyên çavdêrîyê bibin da ku adilbûn û bawerdêrîya pêvajoyan misoger bibe, alî hemû rêzê jê re bigirin û qebûl bikin.

Hê nû piştî berterefkirina pirsgirêka erdên qutkirî û ya bi awayekî neheq guhertina sînorên îdarî yên parêzgehên pêwendîdar rê li ber bicîhanîna qanûna 13ê ya sala 2008ê (3) wê vebe. Hingê statûya paşerojê ya her 15 parêzgehên li herêmên Komara (Federal a) Iraqê li gor vê qanûnê û xala 119ê ya Destûra Bingehîn were dîyar kirin; hingê piranîya şenîyên wan dikarin ji sê tercîhan yekê hilbijêrin: Weke parêzgeh dewama deverê, yekbûna bi herêmeke (federe) ya heyî re, yan jî pêkanîna herêma xwe ya federe. Ji ber vê yekê jî divê pirsgirêka kronîk a erdên qutkirî û bi awayekî neheq guherandina sînorên îdarî yên parêzgehên ev yek bi kêrî wan hatî û yên xisar li wan bûyî, bi awayekî adil ango li gor destûra bingehîn were çareser kirin, heke na, rêveçûna federalbûnê li tevahîya Iraqê wê were asteng kirin, û lewma pêvajoya siyasî ya Iraqê jî wê bi awayekî cidî bikeve tehlûkeyê.

Pirsgirêkên petrol û gaza xwezayî – nexasim li erdên "li ser wan nehatî lihevkirin" – dikarin bi qebûlkirina qanûna petrol û gazê ya li ser hatî li hev kirin, yan jî bi xistina dewrê ya Dadgeha Federal a Herî Bilind a Iraqê werin çareser kirin. Meriv dikare bergirîya ewlekarî û nîzamê li deverên pêwendîdar, çawa ku heta niha li Kerkûkê diqewime, bi yekîneyên hevbeş ên artêşa Iraqê, hêzên ewlekarîyê yên xwecihî û yekîneyên pêşmergeyan yên ku li gor destûra bingehîn birêkxistî (weke muhafizên herêmî) – qet nebe heta ku pirsgirêk were çareser kirin – bike û meriv divê wisa jî bike. Alên Komara (Federal a) Iraqê û Herêma Kurdistanê li sazîyên fermî û avahîyên dewletê werin daliqandin –heta ku biryar li ser rewşa van "erdên li ser wan nehatî lihevkirin" were dayîn, lewma hê li ser statûya van deveran nîqaş hene. Hikûmeta (Federal) a Iraqê divê vegera kurdên ji hin deverên qutkirî û li ser wan nehatî lihevkirin ji ber êrişên terorîst revîyayî – nexasim jî Sa'dîya, Celewla û Qere Tepe – mimkin bike û zirarên wan tezmîn bike. Ew divê di heman demê de vî xelkê hê nû dîsa ji cihûwarê xwe hatî kirin bi hêzên eskerî yên hevbeş ên Hikûmeta Federal û yên Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji terorîzmê biparêze.

Herî dawî jî pirsgirêka erdên qutkirî û li ser wan nehatî lihevkirin dikare li gor destûra bingehîn were çareser kirin heke pêvajoya siyasî ya demokratîkbûn û federalbûna dewleta Iraqê biserketî dewam bike û temam bibe, ango heke pêvajoya siyasî li Iraqa nû têk neçe.

* Mamuste, li Fakulteya Hiqûq û Zanistên Siyasî / Zanîngeha Selahedînê –Hewlêr/Kurdistana Iraqê (Ev gotar xwe disipêre xebateke zanistî ya li zanîngeha Erfurt-Almanyayê ya sala 2012ê, servivîsa vê xebatê "Teritorialstreitigkeiten, Eine Fallstudie zum Grundproblem zwischen der Föderativen Region Kurdistan und der Bundesregierung Iraks / Alozîyên li ser erdî, lêkolînek li ser bûyereke mînak a pirsgirêka sereke di navbera Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Federal a Iraqê de" ye û wê di demeke nêz de weke pirtûk derbiçe.)

(1) Di mijara herêma li ser nehatî lihevkirin ya Abyeî de li gor "Peymana Aştîyê ya Berfireh" a di navbera hikûmeta Sûdanê û "Sudan People's Liberation Movement/Army" (SPLM/A) de ji bo referandûmeke destpêka sala 2011ê alîyan li hev kir, di vê referandûmê de divîyabû xelkê Başûrê Sûdanê biryar bidaya ka dixwaze di nav dewleta Sûdanê de bimîne, yan bibe dewleteke serbixwe. Referandûm 9ê tîrmeha 2011ê pêk hat û xelkê Başûrê Sûdanê biryara serxwebûnê da. Bi vê re di heman demê de divîyabû li ser devera li ser nehatî lihevkirin Abyeîyê jî referandûmeke hatibû plan kirin, pêk bihata, di vê referandûmê de divîyabû biryar bihata dayîn ka gelo ev herêm wê siberojê girêdayî Bakur yan Başûr be. Lê belê ev referandûm bêyî ku demeke din were dîyar kirin, hat betal kirin, ji ber ku Hikûmeta Navendî ya Sûdanê û Herêma Federe a Başûrê Sûdanê li hev nekirin ka kî wê bibe xwedîyê mafê dengdanê. Dîyar e astenga bingehîn di vê mijarê de ji ber helwêsta serhişk a hikûmeta nedemokratîk a Sûdanê ye.

(2) Pirsgirêkên di navbera Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Navendî ya Iraqê, di vî warî de gelekî dişibin ya Abyeîyê ya di navbera Sûdan û Başûrê Sûdanê de.

(3) Law of the Executive Procedures regarding the Formation of Regions (Law No. 13 of 2008)

Wergera ji almanî: Luqman Guldivê



ILTER REZAN: **Picasso**

www.arsivakurd.org

Qanûna birêveberîyê ji bo dewleta Iraqê ya dema guhertinê (TAL) / 8ê adara 2004ê

Xala 53yê

(A): Hikûmeta Herêmî ya Kurdistanê weke hikûmeta fermî ya wan herêman hat qebûl kirin ku 19ê adara 2003yê ji alîyê vê hikûmetê ve li parêzgehên Duhok, Hewlêr, Silêmanî, Kerkûk, Dîyala û Nînovayê dihatin bi rê ve birin. Peyva "Hikûmeta Herêmî ya Kurdistanê" divê ji bo Meclisa Neteweyî ya Kurdistanê, Desteya Wezîran a Kurdistanê û erka huqûqî ya herêmî ya li Kurdistanê were bi kar anîn.

(..)

(C) Her koma ji sê parêzgehan ne zêdetir li derveyî herêma Kurdistanê û bi îstîsnaya Bexda û Kerkûkê, divê xwedîya wî mafî be ku di nav xwe de herêman pêk bîne. Çerxa pêkanîna herêmên bi vî rengî dikare ji alîyê Hikûmeta Demî ya Iraqê ve were pêşnîyaz kirin, û divê ji bo erêkirin û qanûnîkirina wê li Meclisa Neteweyî ya hilbijartî were pêşnîyaz kirin û nirxandin. Bi ser erêkirina di Meclisa Neteweyî de divê her qanûna pêkhatina herêmeke taybet pêşnîyaz dike bi referandûmekê ji alîyê xelkê parêzgehên elaqedar ve were pesend kirin.

(...)

Xala 58.

(A) Hikûmeta Dema Guhertinê ya Iraqî, û nexasim Komîsyona Dozên Milkîyetê ya Iraqê û sazî û dezgehên din ên pêwendîdar divê bi lez û bez tevbigerin da ku tedbîran bigirin ji bo tezmînkirina neheqîya kirinên rejîma berîya niha ji bo guhertina xisleta demografîk a hin herêman –Kerkûk jî di nav de – rê li ber vekirî. [Kevne-rejîmê] bi koçberkirin û mişextkirina ferdan ji deverên lê diman, bi koçberîya bi darê zorê ber bi herêmekê ve û ji wê herêmê ber bi derve ve, bi bêparhiştina xelkê deverê ji karekî û bi sererastkirina welatîbûnê [rê li ber van guhertinan vekiribû]. Ji bo tezmînkirina van neheqîyan Hikûmeta Demî ya Iraqê divê van gavên jêr bavêje:

(1) Elaqedarî xelkê deverê yên hatî koçber kirin, mişextkirin yan jî koçberbûyî; [hikûmet] divê li gor statuya Komîsyona Doza Milkîyetê ya Iraqî û tedbîrên din ên qanûnî di nav demeke maqûl de şênîyan vegerîne li mal û milkên wan, yan jî heke ev ne mimkin be, hingê divê tezmînateke adil bide.

(2) Elaqedarî ferdên hê nû li herêm û erdên dîyar hatî bi cîh kirin, divê [hikûmet] li gor xala 10ê ya Destûra Komîsyona Doza Milkîyetê ya Iraqî tevbigere da ku misoger bike ku ev ferd yan ji nû ve werin xwecihîkirin, yan tezmînatê ji dewletê bistînin, yan erdên nû yên nêzî devera lê diman a parêzgeha jê tên ji dewletê bistînin, yan jî tezmînatê bistînin ji bo mesrefên barkirina ber bi van deveran ve.

(3) Elaqedarî kesên ji karê xwe bêpar hatî hiştin, yan jî ji navgînên din ên alîkarîyê bêpar hatî hiştin da ku li ser wan ferz bibe koçber bibin ji herêm û erdên xwe, [hikûmet] divê derfetên nû yên kar li herêm û deveran bi pêş bixe.

(4) Elaqedarî sererastkirina welatîbûnê, [hikûmet] divê tevahîya biryar-qanûnên pêwendîdar betal bike û divê mafê kesên mexdûr der barê dîyarkirina nasnameya xwe ya neteweyî û girêdana xwe ya etnîk de bi awayekî ji tevahîya zor û zextan azad, mimkin bike.

(B) Rejîma berî niha ji bo armancên siyasî herweha sînorên îdarî manîpule kirin û guhertin. Konseya Serokatîyê ya Hikûmeta Dema Guhertinê divê pêşnîyazan li Meclisa Neteweyî bike da ku ev guhertinên neheq di destûra bingehîn a daîmî de werin sererast kirin. Heke ji Konseya Serokatîyê nehat ku bi yek dengî li ser rêzepêşnîyazan li hev bike, hingê divê ew bi yek dengî navcîyekî/e bêalî wezîfedar bike da ku mijarê kontrol bike û pêşnîyazan bike. Heke ji Konseya Serokatîyê nehat ku li ser navcîyekî/e bigihêje biryarekê, hingê divê ji Sekreterîya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî bixwaze ku kesekî/e navdar ê/a navneteweyî weke navcî dest nîşan bike.

(C) Kerkûk jî di nav de, çareserîya mayînde ya erdên li ser wan nehatî li hev kirin divê were paşve xistin, heta ku ev tedbîr temam bûn, serjimareke adil û şefaf pêk hat, û destûra bingehîn a daîmî hat erê kirin. Ev çareserî divê bi prensîpa edaletê re li hev bike, divê hesabê daxwaza xelkê li van erdan dimîne bike.

Destûra Bingehîn a Iraqê (15ê çirîya pêşîn a 2005ê hat pesend kirin)

Xala 119ê

Divê mafê yek yan jî bêhtir parêzgehan hebe ku xwe weke herêmekê bi rêk xin, ev maf xwe dispêre daxwazeke bi referandûmekê li gorî yekê ji rêbazên li jêr bikeve dengdanê:

Ya pêşî: Daxwazeke ji sîsîyan pareke endamên konseyên her parêzgeha dixwazin herêmekê pêk bînin.

Ya diduyê: Daxwazeke ji deh paran pareke hilbijêran li her parêzgeha dixwazin herêmekê pêk bînin.

Xala 140ê

Yekem: Erka birêveber divê ji bo pêkanîna tevahîya pêdivîyên jêr-paragrafên xala 58ê ya Qanûna Dema Guhertinê ya Îdarî gavên pêwîst bavêje.

Duyem: Berpirsîyarîya ku erka birêveber a Hikûmeta Dema Guhertinê ya Iraqî di xala 58ê ya Qanûna Dema Guhertinê ya Îdarî de teahud dike, divê derbasî erka birêveber a li gor vê destûrê hilbijartî bibe û dewam bike, bi şertê ku ew bi tevahî berîya 31ê kanûna 2007ê wê bibe serî (normalkirin, serjimar û di nav de referandûmeke li Kerkûk û erdên din ên li ser wan nehatî li hev kirin jî heye da ku daxwaza welatîyên wan dîyar bike).

Xala 143yê

Qanûna Dema Guhertinê ya Îdarî û pêvekên wê, dema ku hikûmeta nû dest bi wezîfeyê kir divê betal bibin, ji bilî şertên xala 53 (A) û xala 58ê ya Qanûna Dema Guhertinê ya Îdarî.

ILTER REZAN: **Ji rêzewêneyên merivan**, teknîka tevlihev

ILTER REZAN: **Ji rêzewêneyên merivan**, teknîka tevlihev

ILTER REZAN: **Ji rêzewêneyên merivan**, teknîka tevlihev

www.arsivakurd.org

Serokdewlet Obama, xelata Nobelê ji balefirên bêpîlot re

CHASE MADAR *

Berîya bi çar salan, namzedê serokdewletîyê Barack Obama soz da ku ew ê girtîgeha li Guantanamoyê bigire; ku ew ê "Patriot Act" a sala 2001ê ya destûr dida şêwazên nû yên kontrol û çavdêrîya li nav welêt, betal bike; ku ew ê îxbarkerên eskerî û yên rêxistinên îstîxbaratê ji zextên hikûmetê biparêze. Bi kurtî, Obama soza gemkirina piranîya sazîya ewlekarîya neteweyî ya dewletê da, ev sazî piştî êrişên terorîstî yên 11ê îlona 2001ê bi burokrasîyeke dêwane û pirî caran nikare were jimartin berfireh bû, û gelek dengdarên Partîya Demokrat di encamê de êdî wê weke tehlûkeyeke li dijî azadîya ferdî dibînin.

Çar sal di navberê re derbas bûn, Guantanamo hê jî vekirî ye û dadgehên wê yên eskerî hê nû ji nû ve dest bi xebatê kirin. Obama nûkirina Patriot Actê sala 2011ê erê kir, û Wezareta wî ya Dadê di çarçoveya Qanûna Sîxurîyê de dest bi şeş dozên taqîbata îxbarkerên ewlekarîya neteweyî kirin –ev hejmar du caran ji tevahîya taqîbatên birêveberîyên berîya wî dayî destpêkirin zêdetir e.

Lê belê ev ê şaşîyek be heke mirov bibêje tu tişt neguherî, lewra hêzên dewleta ewlekarîya neteweyî di rastîyê de di bin birêveberîya Obama de pir zêde bûn. "No-fly list" ango lîsteya kesên qedexe ye ku li balefiran suwar bibin –dîyarkirina lîsteyê para bêhtir bi awayekî kêfî ye û timî jî zehmet e were fêm kirin– bêhtirî du caran ji berê zêdetir bû, di navbera 2011 û 2012ê de gihişte 21 000an. Ber bi dawîya sala 2011ê ve serokdewlet Qanûna Destûrdayîna Bergirîya Neteweyî ya sala 2012ê mohr kir, ev qanûn wê erkê dide hukûmeta federal ku welatîyên amerîkî heta demeke nedîyar bixe girtîgehê heke ew bi terorîzmê werin gunehbar kirin, ev derbeke mezin e li mafên hazirbûna li pêşberî dadgehê [habeas corpus] ketî. Birêveberîya Obama wekî din destûr da kuştina welatîyên amerîkî li derveyî welêt ên ku yekser neketine nav dijminatîyên çekdarî, lê belê bi pêvajoyeke herî kêm a qanûnî weke "terorîst" hatine binavkirin. (Îlona bihurî êrişên bi balefirên bêpîlot li Yemenê dîndarê tundraw Anwar al-Awlaki û kurê wî yê şanzdeh salî, herweha propagandekerê el-Qaîdeyê Samir Khan kuştin, hemû jî welatîyên DYAyê bûn.) Obama bi awayekî radîkal kuştinên qaşo "veşartî" yên kesên ne welatîyên DYAyê bi balefirên bêpîlot li Pakistan, Yemen û Somalîyê zêde kirin.

Çi qewimî? Hêvîya ku Barack Obama wê dewleta ewlekarîya neteweyî piçûk bike ne bi tevahî safdilî bû û ne jî tiştekî berê di dîrokê de mînakên wê neqewimî bû. Di nîvê salên 1970yê de, piştî Watergate û Vîyetnamê piranîyeke cesaretê bide mirov li Kongreyê li ber serokdewletê komarxwaz Gerald Ford rabû da ku hêzên polês ên bi darê zorê ketina hundir û sîxurîya li nav welêt kêm bikin û di heman demê de hêzên şerkirinê yên girêdayî erka birêveberîyê sînordar bike, di nav vê de operasyonên nepenî li derveyî welêt jî hene. Gelek dengdar li gor sozên kampanaya hilbijartinê yên Obama, piştî hilbijartinên 2008ê li benda kêmkirina hêzan a bi rengî bûn.

Hêvîya wan hat pûç kirin, dilê wan hat hiştin. Di asta rojane de ewlekarîya balefirgehan her çû bi destpêkirina bikaranîna "porno-scaners" ên bedena mirov nîşan didin bêhtir êrişkar bû, halê hazir li 140 balefirgehên DYAyê hatine bi cih kirin. Kêm bispor dibêjin, ev pêkanînên dem li wan diçe û mirovan zivêr dikin ji "şanoyeke ewlekarîyê" û wê de tiştekî îfade dikin. Û raporên destpêkê yên Birêveberîya Ewlekarîya Barbirîyê nîşan didin ku mirov bi hêsanî dikarin xwe ji skeneran –yên ku 90 mîlyon $ li wan çû– vedizin. (1) Yên ku qebûl nakin werin skenkirin bi lêgerîn û sehîkirina ser xwe re rûbirû dimînin ku gelek rêwî dişibînin destdirêjîyeke cinsî. Ya herî balkêş jî di dema desthilatdarîya Obama de normalbûna kontrola li hundirê welêt e. Hukûmeta federal niha 30 000 mirovan dixebitîne da ku li axaftinên mirovan ên li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê guhdarî bikin, û Wezareta Ewlekarîya Welêt a ku hê nû sala 2002yê hat damezirandin, niha di siyaset burokrasîyên federal de bûye ya sêyemîn, bi tenê Pentagon û Wezareta Karên Xazîyan jê dibihurin. Avakirina navendeke agahdarîyan a kontrola nav welêt a li ser 92903 m² ya bi buhayê 2 mîlyar dolaran li Bluffdale a Utahê dest pê kir. (2)

Sala 2011ê, heftê û heft mîlyon belge ji alîyê Waşîngtonê ve weke sirên parastinê hatin sinifandin

Zehmet e mirov tê derxe ka dewleta ewlekarîya neteweyî di siyaset 11 salên derbasbûyî de tam çiqasî mezin bû, yan jî dezgehên wê yên cihê tam çi dikin. Şorbeyeke tîpan û navên kurtkirî ên zeametên burokratîk ên têdikoşin, hemû jî xwedîyên budceyên nepixandî ne (bi ser de jî alikarîyên fînansmana bi dizî jî hene) bûn sedema zêdebûna avahîsazîyan li qada metro ya Washingtonê: 33 kompleksên avahîyan li ser qederê 17 mîlyon feet kareyî [1.579.350 m²]. Nûçegihana xelata Pulitzer wergirtî ya bispora ewlekarîya neteweyî ya *Washington Post*ê Dana Priest weha difikire ku piştî 9/11ê "lêçûnên pir zêde yên li ewlekarîyê" ji 2 trîlyon dolaran bihurîn. Erkeke ku hemûyan digire nav xwe nîne –di teorîyê de meqamê di asta kabîneyê de ji van dezgehan berpirsîyar e, Birêveberê Îstîxbarata Neteweyî bixwe di pratîkê de bêhêz e.

Sir û razên hikûmetê zêde bûn dema Washingtonê 77 mîlyon belge sala 2011ê weke belgeyên sir sinifandin û bi vê jî bi % 40ê ji sala berîya wê bihurî. (Li gor kevne-dîrektorekî Buroya Çavdêrîya Ewlekarîya Agahîyan a federal William Bosanko salê bi serê xwe 10 mîlyar dolar li pêvajoya veşartin û weke sir sinifandina belgeyan diçin.) Di vê navê de dawîleânîna statuya sirbûnê ya materyalên sir bixwe weke ku cemidî be hêdî diqewime; par Ajansa Ewlekarîya Neteweyî eşkerekirina materyalên şerê sala 1812ê hê nû bi dawî kir. Bi tenê komên bingeha wan xurt ên parêzvanîyê yên ku parêzerên dinyadîtî lê dixebitin, dikarin Qanûna Azadîya Agahdarbûnê bi kar bînin da ku bigihêjin agahîyên der barê dewleta ewlekarîya neteweyî ya Waşingtonê de –û ew jî bi tenê bi awayekî sînordar di vê yekê de bi ser dikevin.

Ev sazî û çerxa hîmê wê baş danî bi zor û zehmetî piştrast kir ku ew amanek ji bo hewandina sir û razan e ku tu tişt tê re derbas nabe. Ji bo kesên ev mijar ji bo wan nû ye, belavbûna pir zêde ya destûrên ewlekarîyê –niha destûra 854.000 amerîkîyan heye bigihêjin agahîyên "herî zêde veşartî", mafê 4.2 mîlyonên din jî heye ku bigihêjin sir û razên ne ewqasî zêde girîng– maneya "nepenîbûnê" bixwe dixe ber lêpirsînê. Û tevî ku sepandina qanûnên ewlekarîya agahîyan gelekî hişk e jî, ew ewqasî jî kirtûpan û nebirêkûpêk in. Gelek caran materyalên sir ji laptopên hikûmetê bi rîya teknolojîya parvekirina daneyan di navbera şexsan de rûbirû derbasî malperên Înternetê yên ku li gelemperîyê vekirî dibin, bi piranî zarokên karmendên navserê yên ku zanîna wan a teknolojîk kêm e wan bar dikin. (3) Dîrokzanekî îstîxbarata amerîkî, Matthew M. Aid rastî kompûterên DYAyê yên eskerî yên li bazarên Kabîlê tên firotin hat, dîska wan a sabit a sir jî hê dixebitî. (4) Û tevî çûna bi ser derketina derve ya agahîyan û îxbarkeran ê ji rayedarên elît ên Waşîngtonê hê jî agahîyên herî zêde veşartî jî didin rojnamevanan, dema vê dikin jî ji encaman û tesîrê natirsin: Weke mînak Nirxandina Îstîxbarata Neteweyî li Afganistanê ya herî zêde sir e, çileya îsal agahî jê derketin derve û agahîyên derdikevin derve yên der barê êrişên bi balefirên bêpîlot ên "veşartî" yên li Pakistanê de bûne adet. Li her deverî rayedarên payebilind ên hikûmetê li hemberî birêveberîya xurtkirî ya qanûnên ewlekarîya neteweyî bi giştî parastî ne.

Di dema birêveberîya serokatîya Bush-Cheney de gelek lîberalan berbelavbûna dewleta ewlekarîya neteweyî weke tehlûkeyeke cidî li dijî mafên medenî yên amerîkayan didît –lê belê êdî wisa nabînin. Di dîroka piştî şer a amerîkî de rojeva azadîyên sîvîl bi tenê dema Partîya Demokrat di muxalefetê de ye meyldar e xurt bibe, çawa ku di destpêka salên 1970yê de jî wisa bû. Lê belê çawa ku demokrat erka birêveber bi dest dixin, fikarên der barê azadîyên sîvîl de jî ji holê radibin. Îro gelek întelektuelên meyla wan bi ser Partîya Demokrat ve ye xebitîn da ku baweriyê bidin raya giştî ku îtîraza wan ne li dijî destdirêjîya hikûmetê bixwe ye, lê belê li dijî wê yekê ye ku ev teknîkên bi vî rengî di destê partîya şaş a siyasî de bin –hiqûqzanê navdar Jonathan Turley weha dinivîse "[ev] *bersiveke belav a lîberalan e ku ji wan nayê çawa ku gilîyê Bush kiribûn, gilîyê Obama jî bikin*". (5) Erê dengê rexnegirîya lîberal qut bû, lê belê kevne rayedarên birêveberîya Bush-Cheney hîç dudilî nebûn û ji normalkirina dewleta ewlekarîyê ya piştî 9/11ê bi destê Obama re li çepikan dan. (Dick Cheney bixwe di dema pesindayînê de gelekî bi kelecan bû.)

Li serê pêşî yê destpêkê da serokatîya xwe de wisa xuya dikir ku Obama dixwest sozên dema kampanya xwe ya hilbijartinan bi cîh bîne, lê belê hewldana wî ya têkçûyî ya girtina Guantanamoyê bû nîşanek. Di çirîya paşîn a 2009ê de serdozger Eric Holder bi carekê da zanîn ku pênc girtîyên li Guantanamoyê wê cih biguherin û bikevin nav pergala dadgehan a federal a ji bo dozên sîvîl a li New Yorkê. Lê belê birêveberîya Obama di mijara ji berê de misogerkirina desteka siyasî ya siyasetvanên herêmî li New Yorkê de bi ser neket, ew jî li hember pêşnîyazê rabûn di siyaseta nîqaşên dijber ên herêmî de. Krîzên din jî birêveberîya Obama dereng xistin, piştre [birêveberîya Obama] bi lez û bez înîsîyatîf ji dest da, ji hingê ve jî desteka ji bo koma avahîyên Guantanamo û tevahîya hewcedarîyên wê (di zindanê de girtin a dem nedîyar, dadgehên eskerî) li kongreyê zêde bû, nexasim jî di siyaseta demokratan de. Di van nîqaşan hemûyan de dadgerîya federal a ku timî bi tedbîr e ku ji bo berfirehkirina erk û prestîja xwe ya sînordarkirî li rêyan bigere, di vê mijarê de nexwest dest werde. Ew ê şaşîyek be heke mirov, bi destê Obama zexmkirina van tedbîrên ewlekarîya lezgîn weke kêlîyeke "serokatîya împeryal" a ku astengên berê yên qanûnî û hiqûqî ji binî ve ji holê radike, bibîne.

Bi lez belavbûna dewleta ewlekarîya neteweyî ya amerîkî ne fenomeneke bi tevahî nû ye di dîroka DYAyê de. Dewleta ewlekarîya neteweyî herî zêde di dema serokdewletê demokrat Harry Truman de piştî Şerê Cîhanê yê Duyem belav bû, ya ku ew tehrîk dikir dijberîya mezinbûna eskerî ya komunîst li derveyî welêt û tirsa ji komunîzmê li hundirê welêt bû. Di dema serokatîya Kennedy û ya Reagan de vê belavbûnê bi xurtî berdewam kir. Di serdema piştî şer de dewleta ewlekarîya neteweyî bi awayekî giştî doza kîjan budceyê û xweserîyê kiribe ew bi dest xistiye. Ji dema Dwight Eisenhower (kevne-generalekî xwedîyê pênc stêrkan ê ku ne mecbûr bû tiştekî îsbat bike) û vir ve tu serokdewletê amerîkî bi tevahî ew kontrol nekiriye.

Dewletên Yekbûyî navdar in bi dijminatîya xwe ya li beramber desttêwerdana hikûmetê ya jîyana taybet –lê belê ev lîbertaryanîzm timî xwedî xisleteke pir taybet bû. Di tevahîya dîroka DYAyê de berpirsîyarîyeke xurt beramberî azadîyên sîvîl hebû, lê belê ji bo komeke hundir a xwedî îmtîyaz a ku navenda wê ya demografîk spî, mêr û xirîstîyan in, yên li derveyî vê eşîra xwedî îmtîyaz xwedîyê kêmtir azadîyan in, yan jî hîç azadîyên wan nînin. Heke hukûmeta mudaxeleker li dijî hindikahîyeke jê hez nayê kirin e, hingê piranî tedbîrên ewlekarîyê yên bi vî rengî bi hêsanî qebûl dike.

Ji 9/11ê û vir ve, dijminatîya Îslamê li Amerîkayê netemirî, belê her çû bêhtir hêz berhev kir, her çû dijberîya li hemberî mizgeftên nû zêde bû; "bisporên" îslamê ên serbest serhişkîyê di çapemenîyê de belav dikin û ya ji vê jî bêhtir zivêrker di hişkkirina qanûnan de jî; her diçe bêhtir hikûmetên herêmî li dijî Şerîetê fermanan didin. Ed Kilgore weke analîzkerê siyasî dinivîse ku anketên dawîyê nîşan didin ku ji bo cihêkirina ereban li balefirgehan û herweha ji bo guhdarîkirina telefonan bêyî biryara dadger destekeke mezin heye. (6)

Gelo burokrasîya ewlekarîyê wê piştgira encamên siyasetên jixwekêmkirinê be?

Ma ne bi tenê terorîst wê tiştekî veşêrin? Sala 2009ê birêveberê giştî yê Googlê Eric Schmidt bi aramî di hevpeyvînekê de got "*heke tiştekî we hebe ku hûn naxwazin herkes pê zanibe, hingî dibe ku we di serî de ew tişt nekira.*" (7) Ev fikra serokê şirketa ku xwedîya hêzên neditî ye di desttêwerdana elektronîk de, kir ku girîzok bedena lîbertaryanên sîvîl bigirin –lê belê ev fikir li Dewletên Yekbûyî fikra giştî ye.

Lîbertaryanên muhafezekar (qismekî hindikahî ye, hejmara wan bi qasî ya pismamên wan ên navend-çepgir e) hêvî dikirin ku baskê rastê yê populîst tevgera "Tea Party" dewleta ewlekarîya neteweyî berepaş bike, û herweha hejmara zêde dibe ya desttêwerdanên eskerî yên li derveyî welêt jî kêm bike. Lê belê lîbertaryanîzma mîlîtan a Tea Partyê jî bi tenê bi mafên milkîyetê re elaqedar e û piranîyeke ecêb a nûnerên di Kongreyê de yên girêdayî wan sala 2011ê dengê xwe bi kar anîn ji bo nûkirina tedbîrên kontrolê yên Patriot Actê. Tevî retorîka wê ya li dijî Waşîngtonê hemûyî jî Tea Partyê bixwe nîşan da ku ew bi tevahî aram e û ne aciz e ji dewleta ewlekarîya neteweyî ya nû.

Îro berxwedana li dijî dewleta ewlekarîya neteweyî ya mezin dibe parçe parçe ye li seranserê dabeşbûna siyasî ya çep ta rastê. Yekîtîya Azadîyên Sîvîl a Amerîkî ku bixwe di siyasetê de li navend-çepê ye, NGOyeke bicihbûyî û baş tê fînansekirin e ku bi dehsalan doz vekirin li dijî kontrol û guhdarîkirinên neqanûnî, veşartîbûna ji hedê xwe zêde ya hikûmetê û destdirêjîyên hêza dewletê. Êdî yekane namzedê serokatîyê di vê sala hilbijartinê de yê ku dengê xwe li dewleta ewlekarîya neteweyî bike Nûner Ron Paul e, komargerekî ji Texasê ye, ew hem dijbereKî hewasdar ê împeryalîzmê û hevalbendekî bihewas ê azadîyên sîvîl e û hem jî yekî herî zêde [ultra] li baskê rastê yê partîya xwe ye. Hewldanên dupartîyî yên ji bo parastina azadîyên sîvîl hemû şikestin, tevî ku pirî caran piranîyên Partîya Demokrat di Meclisa Nûneran de peyda bûn jî. Li seranserê netewe peyama azadîyên sîvîl ji herêmên peravê yên metropol bêhtir li Mountain states, Southwest û Upper Midwestê bala dengdaran dikişîne. (Senatorên Partîya Demokrat ên California û New Yorkê meyildar in bi gavên nîzamî bi sazîya ewlekarîya neteweyî re û bi şirketên mezin ên teleragihandinê re yên ku bi bernameyên kontrol û guhdarîkirinê yê hikûmetê re hevkarîyê dikin, bimeşin.)

Belavbûna li siyaseta welêt a çerxa ewlekarîya neteweyî wisa dîyar e ku wê bi desttêwedanên eskerî yên ji deryayê û wê de yên amerîkî re di heman demê de dewam bike. Li gor ku pir kêm siyasetvan hez dikin bigihêjin dawîya şerê li dijî terorîzmê, desttêwerdanên eskerî yên lîsteyeke her diçe dirêj dibe ya welatan –Afganistan, Yemen, Pakistan, Somalî – dîyar e wê bi dawî neyê. Rewşa asayî ya nû ya amerîkî rewşeke misêwa ya nîv-şerî ye, merceke daîmî ya li welêt û ewqasî jî li derveyî welêt e.

* *Chase Madar, nivîskarê* The Passion of Bradley Manning (Dildarîya Bradley Manning) *e û parêzerek e li New Yorkê.*

(1) "Homeland Security Concedes Airport Body Scanner 'Vulnerabilities' / Ewlekarîya Welêt neçar ma li 'lawazîyên' skenerên bedenê yên li balefirgehan mikur were," David Kravets, *Wired*, 7ê gulana 2012ê. http://www.wired.com/threatlevel/2012/05/body-scanner-vulnerabilities/

(2) James Bamford, "The NSA is Building the Country's Biggest Spy Center (Watch What You Say) / NSA navenda herî mezin a sîxûrîyê ava dike (Binêre tu çi dibêjî)", *Wired*, 15ê adara 2012ê http://www.wired.com/threatlevel/2012/03/ff_nsadatacenter/all/1

(3) Dana Priest û William M. Arkin, Top Secret America: The Rise of the New American Security State/Amerîkaya ku Sira Herî mezin e: Derketina holê ya dewleta ewlekarîya ya amerîkî ya nû (New York: Little Brown, 2011), 234 rûpel.

(4) Matthew M. Aid, Intel Wars (New York: Bloomsbury, 2012), 77 rûpel.

(5) "10 Reasons Why the U.S. Is No Longer the Land of the Free / Deh sedem ji bo [ravekirina ka] DYA ji bo çi êdî ne welatê azadîyê ye," Jonathan Turley, Washington Post, 4ê çileyê 2012ê. http://www.washingtonpost.com/opinions/is-the-united-states-still-the-land-of-the-free/2012/01/04/gIQAvcD1wP_story_2.html

(6) "Disclosure: How Americans Really Feel About Body Scanners and WikiLeaks / Eşkerekirin: Amerîkî der barê skenera bedenê û Wiekileaksê de bi rastî çi hîs dikin," Ed Kilgore, *The New Republic*, 10ê kanûna 2010ê http://www.tnr.com/article/politics/79793/body-scanners-americans-privacy-wikileaks

(7) "Google CEO: Secrets are for Filthy People / Birêveberê Giştî yê Googleê: Sir ji bo mirovên qirêj in", Ryan Tate, *Gawker*, 4ê kanûna 2009ê: http://gawker.com/5419271/google-ceo-secrets-are-for-filthy-people

Wergera ji ingilîzî: Luqman Guldivê

Dûrî hewldana îzolasyonîst a ku di vê dema lihevderneketina budceyî de bi ser dikeve, namzedê komarxwaz ê ji bo serokdewletîya DYAyê pêşnîyaz dike “angajmanên eskerî yên amerîkî li derveyî welêt werin xurt kirin.”

Mitt Romney, dîplomasîya di devê tivingê de

JOHANN HARI *

Çaxê mirov li jîyana Willard Mitt Romney binêre, tukesî nikarîbû texmîn bike ku vî zilamê li Harvardê perwerdebûyî yê ku dişibe bavekî baş û xwedî malbatekê ye, wê bibe bisporê revandina serokkomarên bi awayekî demokratîk hilbijartî, yan jî bibe bisporê bicîhkirina dîktatorên berpirsîyar in ji kuştina bi sedan hezaran kesan, di desthilatdarîyê de. Tevî vê yekê jî, namzedê hilbijartinên serokatîya Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê, Willard Mitt Romney, li hemberî xemsarîyeke giştî û bi awayekî eşkere piştgirîya vê modela siyasî dike ji bo karên derveyî welêt, ev modela ku berîya hertiştî xwe dispêre kiryarên li jor behsa wan hat kirin. Willard Mitt Romney di nav cemaeta endamên Partîya Demokrat de, ji ber ku bûbû sedema girtina gelek şirketan di dema ku rêveberê fona pererazandinên Bain Capitalê bû, tê rexne kirin. Ew van rexneyan wekî din di mijara pesindana kûjerên demokrasîyan de jî heq dike.

Kevne-walîyê Massachusettsê xirab tê nirxandin, ew weke oportunîstekî tê nirxandin ê ku bawerîyên wî yên rastî tunene û ku dikare her tiştî bike ji bo dengan bistîne. Rast e ku di mijara pirsgirêken civakî de pir caran xwedî axaftineke nakokane bû (jiberxwekirina zarokê, guhertina avhewayê, sîgortaya nexweşîyan…), lê herçî karîyera wî ye, ew ne wisa ye: Ew partîzanekî jidil ê ortodoksîya neolîberal e, di vê mijarê de tu cara fikra xwe neguhert. Wî sala 2011ê weha bersiv dabû kesekî jê nerazî “lê ezbenî, şirket însan in!” timî doza azadîya kiryarên şirketên navneteweyî yên amerîkî kir, azadîyeke bêasteng li tevahîya cîhanê.

Li ser vê mijarê, pirtûka wî ya kampanyayê ya bi navê *No Apology* (1) (Bahane nayên qebûl kirin), gelek alîyên wê yên erenî hene. Pirtûka ku ji bo rexnekirina siyaseta derve ya demokratan hat nivîsîn, berî her tiştî ji ber eşkerekirina bi hurgûlî ya doktrîna namzedê bi navê Romney berhemeke bi qîmet e. Beşa wê ya ku behsa bûyerên sala 2009ê li Honduras pêkhatî dike û daxuyanîyên wî der barê Îndonezyaya Suharto, bi taybetî bala mirovî dikşînin.

Heyranîyek ji bo darbekarên Honduras û rejîma otorîter a Îndonezyayê

Mirov bi zehmetî dikare îdîa bike ku serokdewletê Hondurasê Manuel Zelaya (2006-2009) yê bi rêya hilbijartinên azad bûyî desthilatdar, mirovekî radîkal e. Çawa ku bisporê Amerîkaya Latîn Richard Gott binxêz dike “ev xwedîyê erdan yê dewlemend, ku bisporê pîşesazîya daristanê û xwedîkirina dewaran e, namzedê partîya lîberal bû, yek ji her du navendên adetî yên olîgarşîya hondurasî.” (2) Ew serokdewletê welatê duyemîn herî xizan ê Bakûrê dinyaya me ye û îsal jî hewl da qedera piranîya şênîyên welatî bi pêş bixe: Wî mûçeyê herî kêm % 60 zêde kir û li bernameyên civakî pere razandin yên ku îlhama xwe ji tedbîrên li Brezîlyayê serokdewlet Luis Inácio Lula da Silva bi cîh anî, girt. Ev înîsîyatîf bes bûn ji bo ku muxalefeta rastgir nerazîbûna xwe nîşan bide, wan bi lez navê “*caudillo*” yê nû lê kir û ew bi demagojîkirin û bi dîktatorbûnê gunehbar kirin. Piştre, dema birêz Zelaya da zanîn ku wê referendumekê li dar bixin li ser mumkinbûna vexwendina Mecliseke Destûra Bingehîn -Destûra bingehîn a heyî sala 1980yê ji alîyê desthilatdarîya eskerî ve hatibû nivîsîn – bû qîre qîra rastgiran ku wî bi pêkanîna darbeyekê gunehbar kirin; nîvê şevê kesên xwedî mîtralyoz êriş birin ser Qesra Serokdewletîyê ji bo ku serokdewlet û keça wî birevînin. (3)

Zelaya yê ku bi darê zorê biribûn baregeheke eskerî ya amerîkî, piştre ew li ser pîsteke balafiran ya balafirgeha Kosta Rîkayê hiştin û ferman danê ku tu caran venegere welatê xwe. Di heman demê de, li Hondurasê, radyoyê wêşanên xwe rawestandibûn, gîrêdanên telefonê qût bûbûn û, xerac û bikaranîna xirab a erkan jî li tevahîya welêt belav dibûn. Amnesty International behsa “binçavkirinên girseyî , lêdan, û êşkenceyan” dike. (4) Lê di demeke kin de wê birêz Romney dilşa bibûya: Çend mehan piştî darbêyê, hukûmeta nû forumeke navneteweyî li ser mijara “Honduras li bazirganîyê vekirî ye” amade kir. Kapîtalên şexsî herikîne Hondurasê.

Eger vê bûyerê kiribe ku birêz Romney biqehere, sedema hêrsa wî ne binpêkirina demokrasîyê bû, lê belê berevajîyê vê –tişta carekê qewimî illeh nabe adet– ji ber ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê nebûn sedema rahiştina înîsîyatîfa ji bo ji desthilatdarîyê xistina rejîmeke navend-çepê li Amerîkaya latîn, hêrsa wî rabû. Wî li pêşberî çapemenîyê ev gotinên ku dilê wî dixelînin bilêv kiribûn *“ wextê Hondurasê xwest ji serokdewletê xwe yê komûnîst xilas bibe [Barack Obama] ew parast”* (5) Di pirtûka xwe de, namzedê komarxwaz ê ji bo Qesra Spî ji vê û wêdetir diçe û birêz Zelaya weha terîf dike, weke “*otokratekî bertîlxwar (...) ku bi awayekî hiqûqî ji alîyê dadgeha bilind a Hondurasê ve ji desthilatdarîyê hatibû xistin. (...)Hêrsa mirovî radike ku serokdewletê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li Hondurasê ferz kir ku li dijî qanûnên xwe tevbigere û desthilatdarîya rêveberekî zalim yê li dijî-Amerîkayê ye ji nû ve bike desthilatdar.*” (6) Bi saya belgeyên ji alîyê Wikileaks hatî eşkere kirin, em êdî pê dizanin ku ji bilî civata muhafezekarên herî radîkal tu kes tevlî vê îdîayê nabe. Peyamên dîplomatîk ên nepenî [metnên fermî ya sir ku konsolosxaneya welatekî û wezareta karên derve ya wî welatê ku ew temsîl dike, pê bi hev re didin û distînin] wisa behsa bûyerê dikin “ *bê guman*” ew “*darbeyeke neqanûnî* ye *ku Destûra bingehîn binpê dike* “û bi ser de jî bi ”*revandina*” serokdewletê hilbijartî pêk hat. (7)

Rêbazên birêz Romney ji bo birêvebirina siyaseta derve ya amerîkî tercîh dike ev in. Di civîneke guftûgoyê ya çirîya paşîn a 2011ê pêkhatî û, CNN û Heritage Foundationê ew amade kirî de, wî fikra xwe bi hûrgulî got û vê carê pesnê “*ya di sala 1960ê de li Îndonezyayê qewimî*” da “*wextê me* [DYAyê] *alîkarî da da ku bi saya rejîmeke nû welat bikeve nav modernîzmê*”. Li gor wî ev serdemeke dîrokî ya pir erenî ye ku divê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ji bo têkilîyên xwe yên bi Pakistanê re û bi tevahîya cîhanê re weke model bibînin. Eger mirov bûyerên li Îndonezyayê salên 1960ê qewimîn bi awayekî din şirove bike, dikare ji nivîsên navxweyî yên Central Intelligence Agency (CIA) bawer bike, yên ku îdîa dikin Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê kir ku tevahîya erk û hêzê bikeve destê mirovekî “di lîsteya kujerên girseyan ên herî mezin ên sedala 20ê de cîh digire”. (8)

Gelo ev siyaseteke çawa bû da ku piştî nîv sedsalekê namzedê muhafezekar ê Qesra Spî hê jî bi heyranî lê dinêre? Weke ku nivîseke dîplomatîk a nepenî ya brîtanî ya sala 1964ê dibêje, wê demê Îndonezya welatekî girîng bû lewra ew bi rola “*mezintirîn çavkanîya ya madeyên xav ên mecbûrî*” radibû: wê “*qederê % 85ê kawûçûka xwezayî ya cîhanê û % 65ê navika hişkkirî ya gwîza hindê hildiberand, ew xwedîyê % 45ê stokên pîleyê û % 25ê kromê bû.*” (9) Salên 1950î û 1960î welat ji alîyê Ached Sukarno ve dihat birêvebirin, serokdewletekî otokrat ku emperialîzma amerîkî û sovyetî red dikir û dixwest rêya xwe bi xwe dîyar bike û dixwest çavkanîyên xwezayî yên welêt biparêze. Wexta birêz Romney pesnê Îndonezyayê dide, ew behsa serdema general Suharto dike –mirovekî ji serokdewletê berîya xwe bi gelekî hovtir û otorîtertir ku bi alîkarîya CIAyê bû desthilatdar.

Li Îndonezyayê, CIAyê demeke dirêj xebata amadekirinên pêşî meşand. Wê artêş perwerde kir û kire xwedî çek heta ku ew kir dewletekê di nav dewletê de. Piştre wextê leşker amade bûn bibin desthilatdar, wê lîsteyek da dest wan, tê de navên pêncsed kesan nivîsî bû ku guman jê wan dihat birin komûnîst bin. Li gor Joseph Lazarky, ku wê demê buroya herêmî ya CIAyê bi rê ve dibir, ev agahî weke “*destûrek ji bo kuştinê*” hat bi kar anîn. (10) Vê komkûjîya yekem rê li ber kampanyayeke jiholêrakirina tevahîya komunîstan (yan jî kesên guman ji wan tê birin komunîst in) vekir, û bû sedema kuştina nîv-mîlyon kesan ku piranîya wan gundî bûn. Piştre, Suharto êriş bir ser Tîmora Rojava, û ji sê paran yeke xelkê Tîmorê kuşt.

Li gor birêz Romney, ev rêbaz bikêrhatî bû, lewra wê destûr da Îndonezya bigihîje “*modernîzmê*”, ango destûr da derîyê welêt li şirketên pirneteweyî vebe ku xwedîyên wê azadîyê bûn ku xwe bi pêş bixin, ji ber ku berxwedana gel ji alîyê cunta eskerî ve di nav xwînê de dihat tepisandin. Hema piştî zilmê û xwînrijandinê, serokdewletê şirketên mezin ên pîşesazîyê vexwendin konferansekê û tê de mafê xebitandina erdên tevahîya herêman da wan.

Têkilîyên navneteweyî armanca yekane ya namzedê serokdewletîyê nînin, yên ku bi tenê daxwaza tevlîbûna beza ber bi berjewendîyan ve nîşan dide. Li gor wî ev fikir di jîyana her ferdî de ferz e. Bi vî rengî, çend salan piştî perwerdebûna xwe ya li Harvard Business Schoolê, birêz Romney vegerîya zanîngeha xwe û li hember hejmareke mezin a xwendekaran konferansek lê da. Ji wan re weha peyivî: “*Hûn* [weke ferd] *weke şirketeke pirneteweyî ne, hûn û General Electric xwedîyên heman pirsgirêkan in*”. (11) Ji bo ku teorîya xwe xurtir bike, wî “*matrice’eke B.C.Gyê*” nîşanî wan kir. Ew grafîkek e ku bi giştî di dîyarkirina stratejîyên şirketan de tê bi kar anîn, tê de her beşekî şirketê bi xelekên gilover nîşankirî ye ku mezinahîya wan li gor para kara tînin hatiye eyar kirin. Heke em vê fikrê li jîyana ferdî ferz bikin, grafîkeke bi sê xelekan çêdibe: Xelaka kar, xelaka malbatê û ya bawerîyê. Birêz Romney wisa dewam dike “*wexta ku hûn ji kar re vediqetînin, tesîra mirov bi çavan dibîne derdixe holê, lewra ew pereyan tîne (...) lê herçî zarokên we, berevajîyê vê ye, ew dirêjahîya bîst salan tu pereyî nayînin.*” Ya ji vê jî xirabtir, li gor wî heke dêûbav têra xwe wext ji zarokên xwe re veneqetînin, mumkin e ew zarok bibin “ *giranîyên mirî*” ji malbatê û ji civakê re.

Li Amerîkaya namzedê komarxwaz, şirket xwedîyên tevahîya mafan in û dizanin van mafan binirxînin

Eger mumkin e mirov zarokên xwe li gor bikêrhatîbûna wî bipîve, vêca dikare zalimekî jî bi heman rengî bipîve, wê çi bibe? Nîv-mîlyon gundîyên di bin rejîmê Suharto de hatin kuştin ji bo Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi kêrî tu tiştî nedihatin; ew “giranîyên mirî”bûn. Zalim bixwe bi kêr dihat, lewra wî destûr dida şirketên taybet dewlemend bibin. Di sîstemeke îdeolojîk a bi vî rengî de, mirov bi lez hildibijêre: Bûyîna alîgirê gelê xwe li dijî yê ku wan dikujê ne mentiqî ye. Birêz Romney fikra maksîmûmkirina para karê ya heyî bi cîh kir û wê bi xemsarî li ser tevahîya sazîyên mirovî ferz dike, ji malbatê heta bi serokdewletîyê.

Birêz Romney ne weke ku tê gotin e, ew mirovek e ku bê îdeolojî be, berevajîyê vê ew îdeologekî safî û hişk e, ew dikare êşên ku bawerîyên wî dibin sedem veşêre. Weke Joseph Stalînê herwiha bawer dikir “*alîkarîya welêt dike daku bi saya rejîmeke nû, wî bigihîne modernîzmê*”. Û herkesî qêrînên ukraynîyan ku ji birçîna dimirin bihîst. Herçî birêz Romney e, wî dengê ketina laşên kuştîyên di bûyerên Hondurasê de û ya ketina laşên mamosteyên kuştî yên îndonezyayî nebihîst. Di Amerîkaya namzedê komarparêz de, şirket xwedî hemû mafan e û dizane wan ferz bike, û heke pêwîst bibe wan bi çekan ferz dike.

*Rojnamevan.

(1) Mitt Romney, *No Aplologys. The Case for American Greatness (Lêbihurîn nayên xwestin. Sedema mezinbûna amerîkî),* MacMillan, EDÎTOR Û BAJARÊ WEŞANÊ, 2010

(2) Richard Gott, “Honduras: Back to the bad old days?” (“Honduras: Vegera ber bi demên xirab ên berê ve), *The Guardian,* London, 29ê hezîrana 2009ê.

(3)Dosyaya li jêr bixwîne: “Honduras”, li ser malpera *Le Monde diplomatique*: http://www.monde-diplomatique.fr/index/pays/honduras

(4) “Honduras failing to tackle coup rights abuses”(Têkçûna Hondurasê di têkoşîna li dijî binpêkirina mafên mirovan de), 28ê hezîrana 2010ê, www.amnesty.org

(5) Gail Collins, “Mitt’s rest for zings” (Rawestandina Mitt ji bo bêhna xwe berde), *The New York Times,* 14ê kanûna 2011ê.

(6) Mitt Romney, *jêdera li jor behsa wê hat kirin.*

(7) Robert Naiman, “WikiLeaks Honduras: State department busted on support of coup” (“WikiLeaks Honduras: Wezareta Karên Derve di mijara piştgirîya darbeyê de petixî), 29ê çirîya paşîn a 2010ê, www.huffingtonpost.com.

(8) Di pirtûka Stephen R. Shalom, Noam Chomsky û Michael Albert de ji ber hatiye girtin, “East Timor. Questions and answers” (Tîmora Rojava. Pirs û bersiv), *Z Magazine,* çirîya pêşîn a 1999ê.

(9) John Pilger, “Spoils of a massacre” (Zîyanên komkûjîyeke), *The Guardian Weekend,* 14ê hezîrana 2001ê.

(10) Di pirtûka Noam Chomsky de ji ber hatiye girtin, *Year 501. The Conquest continues (Sal 501. Fetha erdan hê dewam dike),* South End Press, Cambridge, 1999.

(11) Jodi Kantor, “At Harvard, a master’s in problem solving” (“Li Harvardê, hosteyek pirsgirêkan çareser dike), *The New York Times,* 24ê kanûna 2011ê.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

www.dirokakurd.org

Ji bo rizgarbûna ji krîzeke ku fînansê dayî dest pê kirin, gelek rê hebûn: Şarandina spekulasyonan, birêkûpêkkirina bazaran, cezakirina bankevanan... Bi alîkarîya hejmareke zêde dibe ya pîşesazan, Yekîtîya Ewropî karê din ê li pêş danî ber xwe, ya ku ji niha ve li ser welatên di zehmetîyê de ferz dike: Xurtkirina "kapasîteya reqabetê" ya bazara kar. Lê belê maneya vê peyvê çi ye, ku birêveberên çepê û yên rastê wiha dîyar e weke tiştê herî girîng derxistine pêş?

Dema ku Ewropa amentûya xwe ferz dike

Kapasîteya reqabetê ya di rewacê de

Gilles Ardinat *

Yekdengîyeke ecêb. Di 12ê tirmeha 2012ê de, Brez Jean-François Copé, sekreterê giştî yê Yekitîya ji bo Tevgera Gel (YTG) ku bersiva ragihandina ji kar derxistina heşt hezar karkerên Şirketa Anomîm ya Peugeot, "*tiştê herî girîng*" dinirxîne: "*Kapasîteya reqabetê ya pîşesazîya me*". Berîya wê bi kelîyekê, kevne wezîrê kar Xavier Bertrand weha gotibû: "*Alman zêdetir erebeyan bi buhayekî girantir difiroşin*", û encama gihiştiyê jî ev bû: "*Sedema wê ne bi tenê kalîte ye, herwiha mijara buhayê kar û kapasîteya reqabetê ye*". (1) Heman rojê, senator û kevne serokwezîr Jean-Pierre Raffarin behsa heman tiştî dikir û jidil dixwest ku "*şokeke kapasîteya reqabetê*" pêk were, li gor wî ew bi tenê dikarê aborîya Fransayê teşwîq bike.

Yekdengbûna bêqusûr a kesên herî jêhatî yên UMPyê, ya ku ji demekê dirêj ve ji salonên Qesra Elysées [cîhê serokkomarê fransî lê dimîne, nota wergêr] û ji Matignonê [cîhê serokwezîrê fransî lê dimîne, nota wergêr] dihat bihîstin, bi bîr dixe. Ma ne Serokkomar François Hollande di axaftina destpêkê ya "konferansa civakî" de ku hevkarên civakî anîbûn cem hev, terîfa kapasîteya reqabetê weke girîngtirîn mijara xebatê kiribû? Ev jî çil û heşt saet berîya ku serokwezîr Jean-Marc Ayrault axaftina xwe bi dîyarkirina armanceke pir girîng bi dawî bîne: "*Bipêşxistina kapasîteya reqabetê ya şirketên me.*"

Ji stratejîya Lîzbonê ya ku sala 2000ê "*armanceke nû*" ji bo Yekîtîya Ewropayê dîyar dikir –"*bibe aborîya zanistê ya di warê reqabetê de herî li pêş û li cîhanê ya herî dînamîk*"– heta bi "*lihevkirinên kapasîteya reqabetê – kar*" ku di dawîya dewra xwe de serokkomarê Fransayê Nicolas Sarkozy dest pê kiribû, ji fermanên ji bo "*kapasîteya reqabetê di mijara bacstandinê de*" ya patronên brîtanî heta bi planên "*zêdekirina kapasîteya reqabetê ya pîşesazîyê*" ku hevkarê wî yê spanyolî behsa wê kir, di devê herkesî de ev peyv heye: "Kapasîteya reqabetê". Edî mijar ne bi tenê ya birêvebirina şirketan e: Êdî, bajar, herêm, heta bi neteweyan divê enerjîyên xwe ji bo vê armanca herî girîng xerc bikin. Da ku vê yekê misoger bikin, elît û hikûmetên me divê îlhamê ji teorîyên managementê [birêvebirinê, nota wergêr] bigrin yên ku ji alîyê dibistinanên bazirganîyê yên amerîkî ve hatine bi pêş xistin: (2) Kontrolkirina lêçûnên hilberîne ("kapasîteya reqabetê – lêçûnan"), *benchmarking* (welat weke şirketên di nav reqabetê de hatine qeyd kirin), marketinga erdî (divê herêm "xwe bifroşin") (3), gerîna li fînansmanan (cazibkirina sermayedanê)… Bi belavbûna bikaranîna stratejîyên bi vî rengî, kapasîteya hevrikîyê xwe weke modela nû ya performansa herêman di pêvajoya globalbûnê de ferz dike. Lê gelo ew çawa tê pîvan?

Wextê meriv vê konseptê ji bo herêman bi kar bîne, weke ku ew serketina întegrebûna wan di nav cografyaya aborî ya cîhanî bipîve ye. Lê belê têrê dike meriv hema li pirtûk û nivîsan binêre –gelek ji wan hene– yên ku behsa vê pirsgirêkê dikin ji bo ku nakokîya pêşî were fêm kirin: Tevî ku gelekî cezb dike, ev konsept di warê zanistî de xwedî lawazbûneke taybet e. Ew konsepteke mîkro-aborî (kapasîteya reqabetê ya hilberînên şirketan) dixe ser dika siyasî (kapasîteya reqabetê ya herêman). Aborîzan Paul Krugman, ku sala 2008ê bû xwedîyê xelata Bankaya Swêdê di mijara zanistên aborî ji bo bibîranîna Alfred Nobel, vê şibandinê şermezar dike: "*Wexta meriv behsa aborîya neteweyan bike, peyva kapasîteya reqabetê bê mane ye. Fikra sabit ya zêdekirina kapasîteya reqabetê hem xeyalî ye hem jî bi tehlûke ye*". (4)

Jinûvebikaranîna hîyerarşîyên kevin

Gelek pisporan hewl da ku vê kêmasîyê telafî bikin û terîfeke herkes dikare qebûl bike dîtin, aborîzanê Awusturyayî Karl Aiginger yek ji wan e, ji bo wî ev peyv her diçe zêdetir tê maneya "*kapasîteyeke afirandina refahê*" di qadeke reqabet lê heye. Ew îşaret pê dike ku "*kar û meaş di pêvajoyekê de ku tê de rikberî û performans xwedî rolekî mezin in tên afirandin*". (5) Li gor vê fikrê reqabeta giştî di navbera herêman de wê tesîrê li başbûna kalîteya jiîyanê bike.

Pirsek bêbersîv dimîne: Gelo meriv dikare îdîa bike ku herêm û şirket wekhev in? Herêmeke ku wargeheke sînorkirî ye ku hebûna xwe ya fîzîkî û beşeke mezin a referansên xwe yên çandî û siyasî peşkeşî gel dike. Ew bi tenê ji agahîyan pêk naye, ev agahî makro-ekonomîk bin jî. Not (ên ku ji alîyê ajansên notdayîne tên dîyar kirin), rêje (yên enflasyon, faîz, bêkarî…) yan jî erzanîya (budceyî, bazirganîyê…) bi tenê alîyên sexte û madî yên neteweyê nîşan didin. Li berevajîya şirketan, netewe hewl nadin karê bikin. Kiryar û çalakîya wê di dirêjahîya dîrokê de xuya ye, ne di dema kin a bazaran de. Bi ser de jî, neteweyek ne mecbûr e bîlançoyekê derbixe, û netewe nikare weke şirketekê were girtin, bipetixe.

Tevî vê yekê, ya ku teorîya zêdekirina kapasîteya reqabetê xwe dispêre vê şibandinê, ev pevajo ye ku reh û rîşên wê xwe berdidin nav globalbûnê. Wextê meriv vê konseptê li ser herêman ferz dike, ew nîşana asteke nû ya "*bazirganîkirina cîhanê ye*". Ew tê maneya ku "*bazareke herêman*" heye ku şirket lê dikarin cîhê xwe hilbijêrin û destûrê bidin reqabeta herêman. Li dinyayeke ku her tişt, yan jî hema hema her tişt dikare di borsayê de bibe xwedîyê nirxekî (heqê qirêjkirina derdorê, belgeyên deynî, maddeyên xav…) ew dibe nexşeyek ji bo sermayedanê: Ew performansa herêman dipîve.

Lê belê, daxwaza li ser civakên me ferzkirî ya kapasîteya reqabetkirinê bi awayekî rewa dike ku meriv endîşeyan bike. Kîjan herêm xwedî kapasîteya reqabetê ne? Pîvanên nirxandina wan çi ne? Lîsteya rêjeya herêman (em ê behsa *ranking*ê bikin) van salên dawîyê qat bi qat dirêj bû. Ya herî navdar, rapora li ser kapasîteya reqabetê ya cîhanî ye (*Global Competitiveness Report*), ku encama xebata pisporên Foruma Aborî ya Cîhanê (FAC) ye. Ev belge ku salê carekê tê weşandin, referansek e, û bi qasî sed û sîh welatan dixe nav lîsteyekê ku li gor notên di navbera 0 û 7ê de diguherin rêza wan hatiye dîyar kirin. Lê meriv nikare ne di vê raporê de, ne jî di nav rêbaza bikaranînê de (bikaranîna nîşan û hejmarên pêkhatî yên dikarin gelek pîvanan bihewînin) (6), ne jî di nav encamên raporê de tişteke taybet bibîne. Di rastîyê de, "pîşesazîya" raporên li ser kapasîteya reqabetê ya ku Krugman ew şermezar dikir, bi tenê lîsteyên hîyerarşîkkirina aborî yên li deverên din hatî amade kirin, ji nû ve bi kar tîne û ji nû ve şirove dike: Welatê bi tehlûke (xebata şirketa sîgorteyê Cofaceê), xistina rêzê ya Hilberîna Hundir a Nesafî (HHN) serê şênîyekî, yan jî ya rewşa lihevkirinên aborî (hejmarên *Doing Business* a bankaya cîhanî).

Tevahîya rapor û lîsteyên li ser performansa neteweyan bi heman awayî hatin nivîsandin: Behsa navendeke xwedî kapasîteya reqabetê dikin ya ji sisê wargehan pêkhatî (Amerîkaya Bakur, Ewropa, Asya-Pasîfîk), û welatên ereb ên kendavê lê zêde dibin. Behskirina pêşketina qraltîyên petrolê tişta herî balkeş a lîsteyên tesnîfkirinên bi vî rengî ye. Li Ewropayê Almanya, Holanda û welatên Skandînavyayê hîpernavendeke pêk tînin ku bi qasî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, biqasî Japonyayê, yan jî Sîngapûrê xwedî kapasîteya reqabetê ye. Li derveyî van hîpernavendan , kapasîteya reqabetê her diçe kêmtir dibe (hin herêmên li kevîyan ên çi zêde û çi kêm, dîsa jî jêhatî hene) heta sînorên herî dûr ên vê sîstemê, li hin welatên Asyayê û hema bêje li tevahîya Afrîkaya jora Sahrayê. Bi tenê cihê her du welatên bi pêş dikevin (Çîn û Hindistan) di tesnîfkirinê de gelekî diguhere.

Ev nêrînê hîyerarşîk nakokîyeke din nîşan dide: Ev tesnîfkirin bi tenê di warê pêşdîtinê de xwedî nirxekî kêm in. Bi piranî, welatên ku weke yên herî zêde xwedî kapasîteya reqabetê tên hesinbandin ew welat in ku rêjeya mezinbûna wan a aborî herî kêm e, xwedî lihevdernekeтinên budceyî û bazirganî yên herî mezin in û gelek pirsgirêkên wan hene (ên weke cîhguhertina şirketên herêmî, kêmkirina pîşesazîyê). Lewra, mezinbûna aborîya cîhanî niha xwe dispêre welatên ku Fona Aborî ya Cîhanê weke li derveyî navendan dihesibîne. Heta krîza aborî ya salên 2007- 2008, Îrlanda, Îslanda û Dubaî weke welatên xwedî kapasîteyeke mezin a reqabetê dihatin hesibandin. Ji wê demê û vir ve meriv pê hisîyan ku krîz (spekulasîyonên ji hedê xwe zêde, xirabûna birêveberîya aborî, pirsgirêken deyndarîyê) pir tesîr li van her sê welatan dikirin. Bi giştî, welatên anglo-sakson weke modelên pêşketinê dihatin dîtin. Lê bûyerên nû qewîmîn ev analîz pûç kirin: Wisa hat dîtin ku di dawîyê de, modelên reqabetê xwedawendên lawaz in. Sedema vê kêmasîya analîzkirinê rêbaza ji bo sinifandinê ya di van lîsteyan de hatî bikaranîn e. Piranîya wan xwe dispêrin hevdîtinên digel kadroyên şirketên mezin. (7) Lîsteyên tesnîfê ên ku bi vî rengî hatin amade kirin, îmajek e ku tesîra giran a çîneke civakî li ser heye û ne pîvana rastî ya encama agahîyên bidestxistî ye.

Lê em ê bi tenê li danezanên fermî binêrin: Tê gotin, xurtkirina kapasîteya reqabetê tê maneya zêdekirina hejmara kar û hilberînê, û tê maneya bipêşxistina asta kalîteya jîyanê. Li gor pisporên ji alîyê Komîsyona Ewropayê ve hatî wezîfedar kirin "*ji ber ku zêdekirina kapasîteya reqabetê ne dijmina dîyaloga civakî ye, lê hevala wê ye*". (8) Tê gotin, globalbûn derfetê dide rojava da ku xwe ji aktîvîteyên pîşesazîyê û ji karên xwedî mayeyên [nirxa lêzêdekirî ya] kêm xilas bike, ev jî wê bi kêr were ku karên pir kalîfîye yên bi mûçeyên zêdetir şûna wan bigirin. Yanî tê gotin, operasyonek ku "bi tenê dikare karê bîne" ye: Li alîyekî, welatên xwedî pîşesazîyê wê sûdê ji pisporbûna xizmetan û ji *high tech* (amûreke "reqabetkirinê ya pir biha" ye ku girêdayîyê kapasîteya nûker a afirandin û bikaranîna milkîyeta entelektuel e) wergire; li alîyê din jî, welatên dinya sêyemîn wê bi saya cîhguhertina şirketan xwe ji xizanîyê xilas bikin (ku li gor "zêdekirina kapasîteya reqabetê û buha" tevdigerin: Kêmkirin buhayê berheman bi rêya kêmkirina destheqan û bi rêya kêmkirina nirxa pereyî û bi standina kredîyên erzan).

Gelo tu eleqeya vê tabloyê –ya ku hin "welatên atolye" yên bi tenê weke erdên *low cost* tên terîf kirin, pir naecibînin- bi rastîyê re heye? Tu kêmkirina mesrefan, çiqasî sofîstîke be jî, nikare xwe ji pirsgêrekên mesrefan xilas bike. Almanyaya ku pir caran weke nimûne behsa wê tê kirin, welatekî xwedî çandeke xurt a pîşesazîyê ye. Wê kapasîteya xwe ya reqabete bi rêya zêdenekirina maeşan û bi standina bacekê li ser mayeyê [nirxa lêzêdekirî] (BNZ) ya "civakî" pêk anî (kêmkirina bacên ji patronan tên standin bi bilindkirina baca li ser mesrefên malbatan tê telafî kirin). Di heman demê de ku ev tedbîrên yekalî tên girtin, zêdebûneke nedîtî ya bazirganîyê pêk tê. Li alîyê din jî, tevî ku efsaneya dibêje dawî li paşdemayîna welatên nû bi pêş dikevin nayê jî, tê dîtin ku ew di warê teknolojîyên nû de xwedî performansekê ne ku her diçe mezintir dibe (li Hindistanê di warê înformatîkê de, û li Çînê di warê enerjîyên dikarin werin nû kirin de …)

Ma ne dabeşkirina cîhanê di navbera welatên xwedî kapasîteyeke reqabetê ya "pir bûha" (navê reqabeta "strukturel" lê tê kirin), û welatên xwedî kapasîteyeke reqabetê ya "erzan » (bi rêya kêmkirina maeşan) yên neçar in weke aktorên piçûk ên globalbûnê bimînin? Xem nake: Rapora spî ya sala 2004ê (9), ku bû îlhama siyaseta fransî ya navendên xwedî kapaspiteya reqabetkirinê, wisa îdîa dike "daku aborîya me karibe ji nû ve bibe xwedî avantajeke berbiçav, dikare rêya xwe bineqîne: Texlîdkirina modela civakî ya Asyayê, yan jî ketina nav pêşbazîya nûkerî wê bi rê ve dibe". Ger meriv xwe bispêre vê nêrîna dualî, hingê meriv dikare bibêje, birêveberên qada ewro-atlantîkê cîhguhertina şirketan a ji dehsalên dawî û vir ve diqewime, qebûl dikin.

Kelevajîyên "herdu alî qezenc dikin"

Di axaftinên xwe de wan kêm caran behsa ji nû ve vegera welatê xwe ya bi mîlyonan karên di sektora tekstîlê de, an jî di sektora hesin-pola de, yan jî di pîşesazîya lîstokan de ji destdayî kir. Weke ku welatên hilberandina wan ber bi Rojhilat çû, ji ber "qedera aborî" neçar bin van berhemên ji nû ve îtxal bikin û xwe di warê xizmet û lêkolînan de bi pêş bixin û bibin pispor.

Lê ma ne ev stratejîya giranbuha navekî din e ku devjêberdana siyasî terîf dike? Çaxê meriv peyvên vala yên weke "her du alî qezenc dikin" û sozdayîna baştirbûna hejmar û kalîteya kar li dûv xwe bihêle, dibîne ku pir caran mijar ferzkirina tedbîrên ku dibin sedema nerazîbûnê ye: Zêdekirina BNZyê, kêmkirina maeşan, siyasetên jixwekêmkirina budceyî…Ango Yekîtîya Ewropî û Fona Pereyan ya Navneteweyî (IMF) li ser navê zêdekirina kapasîteya reqabetê ji Yewnanistanê xwest ku mûçeyan kêm bike. (10) Divîyabû Yewnanistana ku performansa wê ya reqabetê li gor welatên cîran lawaz bû, bi awayekî radîkal mûçeyan kêm bike, planên xilaskirinê wê ji bo demeke dîyar dabînkirina sermayeyê misoger bikira, ango faîzên ku sîstema aborî wê bistanda misoger bikira. Ev jî tê wê maneyê ku zêdekirina reqabetê garantîyekê dide, ya ku bi rastî dişibe "dumpingeke" giştî [dumpîng tê maneya firotina bi erzanî li derveyî welêt a berhemeke ku di nav welêt de bihatir e, nota wergêr).

Hê di salên 1980yê de, merivan dev ji peyva "dumpinga pereyan" berdabû (ku di teorîyê de IMFyê ew şermezar dikir) û peyva "devaluasyona xwedî kapasîteya reqabetê" tercîh kiribû. Ev jî operasyonek e ku destûrê dide nirxa pereyê welatekî ji bo xurtkirina îxracatên wî, biqest kêm bimîne. Lê ji ber ku maneyeke neerênî ya peyva "dumping"ê heye, wisa xuya ye meriv peyva "kapasîteya reqabetê" li şûna wê bi kar tînin, peyveke ku têra xwe rêz jê re tê girtin e ku destûrê dide hikûmetan da ku tedbîrên li dijî-civakê, bêyî ku ji nerazîbûnan bitirsin, bigirin. Ango ev peyv destûrê dide ku meriv bi awayekî dikare were qebûl kirin fermana xweadaptekirina li gor reqabetan, îfade bike. Ev stratejîyek e ku belkî gel bi dilê xwe nehilbijartibe, belê tê maneya globalbûna neolîberal.

Sozên bipêşketinê ku di encama wan de siyasetên dumpingê dixin dewrê: Ev axaftina nakokane xwe dispêre dogmaya reqabeta di navbera sîstemên hilberîner de. Tevî ku fikra "reqabeteke azad û bêqusûr" bû renîşandêra gelek qanûnên li dijî-trust û li dijî-dumpingê (11) jî, bikaranîna wê ji bo herêman

www.arsivakurd.org

hin pisgirêkan derdixe holê. Berî her tiştî, tu otorîteya bawerîyê bi xwe bîne tuneye ku bikaribe reqabetê di navbera neteweyan de kontrol bike. Wisa xuya ye ku ne Rexistina Cîhanî ya Bazirganîyê (RCB) û ne jî Buroya Navneteweyî ya Kar (BNK) dikarin dumpingên cihê bi rêk û pêk bikin. Bi vî rengî, Çîn dikare bi awayekî azad dumpingên civakî (mûçeyên kêm), li dumpingên din zêde bike: Ya hawîrdorê ("bihuştên qirêjkirina xwezayê" ji bo şirketên pîşesazîyê), ya pereyî (biqest nirxandina kêm a yuanê) lê zêde dike, ya qanûnî (sistbûna pîvanan) û ya bacî (lawazbûna dewletê û zêdebûna wargehên ku bac lê nayê standin) jî lê zêde dike. Çaxê qanûna bazarê xwe li ser herêman ferz bike, hingê ji hedê xwe derketiye.

Demagojîya zêdekirina kapasîteya reqabetê hewl dide vê rastîyê veşêre, û vê jî pir hindik jî be bi telafîkirina newekhevîyên wargehên cuda yên hilberîne dike. Ji ber ku newekhevîyên mesrefan pir mezin in, ev hewldan bêmane xuya dikin: Gelo wekexwehiştin û zêdenekirina mûçeyan li rojava wê bi rastî wê bikaribe mûçeyên karkerên fransî bişibîne yên karkerên vîyetnamî? Eger ew nikaribin bigihîjin vê armanca fermî jî ("di şerê reqabetê de bi ser ketin"), ew di mijara kêmkirina mesrefên kar de bersivê didin hêvîyên patronan. Tesadûfeke ecêb e, tevî ku daxwaza zêdekirina kapassîteya reqabetê di mijara têkoşîna li dijî cîhguhertina şirketan de bikêrnehatî ye jî, ew ê bibe bahaneyeke baş ji bo zêdekirina dahatinên sermayeyê… Ango, behskirina "herêmê", yan jî "neteweyê" xemilandineke retorîk pêk tîne, lewra qezenc kolektîf nîne (bi maneya xizmetkirina ji berjewendîya giştî yan jî neteweyî re), lê belê qezenca kategorîyekê ye (zêdebûna para kar ya hinan).

Li alîyê din jî, xistina nav reqabeteke eşkere ya sîstemên hilberînê wê muheqeq bibe sedema kêmkirina mûçeyan, ya dahatinên bacî, û ya alîkarî û parastina civakî ji bo tendûristîyê ku divê ew jî xwe adapte bikin û kêm bibin. Ev bûyer ne bi tenê karkeran mexdûr dike (hêza xwe ya kirînê ji dest didin), lê dewletan jî mexdûr dike (kêmbûna dahatên bacî); û herwiha ew dibe sedema cemidandina daxwazê [li bazarê teleba kirînê weke xwe dimîne û zêde nabe]. Bi ser de jî, eger tevahîya welatan di heman demê de biryarê bidin ku daxwaza xwe bi ferza erka dewletê bixin bin zextê, wê hingê jî depresyoneke giran pêk bînin. Ji ber heman tiştî, herkes nikare di heman demê de mayeyên bazirganîyê qezenc bike: Divê hin welat di tengasîyê de bin da ku hinên din di rewşeke baş de bin. (12) Ango fikra sabit ya "wekhevbûna kapasîteyên reqabetê" li gor modela alman bi tenê çîrokek e.

Dema ku meriv bi lawazbûna teorîk a axaftinên li ser kapasîteyên reqabetê dizane –ji ber ku ew rê li ber encam û analîzên şaş û li ber dumpingeke veşartî vedikin–, ew ê çawa qayilbûna rêvebirên siyasî fêm bike? Belkî ji ber ku ew bersivê dide daxwazên şirket û bazarên navneteweyî. Hilbijartîyên gel ên ji îmkanên kontrolkirina van şirketan xwe bêpar hiştin, êdî li gor daxwazên wan xwe eyar dikin. Di dawîyê de, meriv dikare bibêje ku armanca zêdekirina kapasîteya reqabetê ji destdana otorîte û desthilatdarîyê ya dewletên-netewe ye. Ew ê destûrê bide ku di kiryarên dewletê de îmkanên xweparastinê tune bikin. Lê belê erd bixwe bi sînor û sazîyên xwe yên siyasî, bi awayekî adetî weke mertalekî li hemberî tehdîtên ji derve ve xuya dikir (tehdîtên eskerî, yan jî bazirganî), bi lawazbûna astengên gumrikê û ya erkên dewletê re ev rola parastvanîyê hedî hêdî kêm dibe.

* Cografyanas. Ev nivîs xwe dispêre teza doktorayê ya bi navê "Géographie de la compétitivité, mesure et représentation de la performance économique des nations dans la mondialisation / Cografîyaya kapasîteyên reqabetê, pîvan û îmaja performansên aborî yên neteweyên di nav globalbûnê de" ku sala 2011ê li zanîngeha Paul Valéry ya Montpellier hat parastin.

(1) Agence France Presse (AFP), 12ê tîrmeha 2012ê.

(2) Michael Porter, *L'Avantage concurrentiel des nations (Avantaja reqabetî ya neteweyan),* InterEditions, Parîs, 1993.

(3) Gotara li jêr bixwîne: François Cusset, "La foire aux fiefs" ("fuara erdan"), *Le Monde diplomatique*, gulana 2007ê.

(4) Paul Krugman, *Competitiveness: A Dangerous Obsession, Foreign Affairs (Zêdekirina kapasîteya reqabetê: Fikreke Sabit ya bi Tehlûke, Karên Derve yên [welatekî])* , Tampa, berg 73, hejmar 2, adar-nîsan 1994; "The Competition Myth" ("mîta reqabetê"), *The New York Times,* 23yê çileya 2011ê.

(5) Aiginger Karl, "From a dangerous obsession to a welfare creative ability with positive externalities" ("Ji fikreke sabit ya bi tehlûke heta bi kapasîteya afirandina dewlemendîya karê tîne), *Journal of Industry, Competition and Trade,* berg 6, hejmar 2, hezîrana 2006ê.

(6) Nota dawî encama liserhevkirina "daxwazên bingehîn" e (sazîyên siyasî, binesazî, îstîqrara makroekonomîk, tendûrûstî, perwerde…)

(7) Sanjaya Lall, "Competitiveness indices and developing countries: an economic evaluation of the global competitiveness report" ("Notên kapasîteya reqabetê û welatên bi pêş dikevin: Analîzeke aborî ya rapora li ser kapasîteya reqabetê ya cîhanî") *World Development,* berg 29, hejmar 9, Elsevier, Amsterdam, îlon 2001.

(8) Alexis Jacquemin, Lucio Pench, *Pour une compétitivité européenne. Rapport du groupe consultatif sur la compétitivité (Ji bo zêdekirina kapasîteya reqabeta ewropî. Rapora Koma Şewirmend li ser kapasîteya reqabetê*), De Boeck, Bruksel, 1997.

(9) Christian Blanc, *Pour un écosystème de la croissance. Rapport au premier ministre (Ji bo ekosîstemeke mezinbûna aborî. Rapor ji bo serokwezîr)* , La Documentation française, Parîs, 2004.

(10) Gotara li jêr bixwîne: Anne Dufresne, "Le consensus de Berlin" ("Lihevkirina Berlînê"), *Le Monde diplomatique,* sibata 2012ê.

(11) Weke nimûne, ji bo baştir şuxilandina bazarê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê qanûna Sherman Anti-trust Act (1890) û ya Clayton Anti-trust Act (1914) qebûl kirin.

(12) Gotara li jêr bixwîne: Till Van Treeck, "Victoire à la Pyrrhus pour l'économie allemande" ("Serketinek weke ya Pyrrhus ji bo aborîya alman"), *Le Monde diplomatique,* îlon 2010.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

ILTER REZAN: **Ji rêzewêneyên merivan**, teknîka tevlihev

Çend nîşan-hejmar

Berîya her tiştî, nirxandina bi hejmaran a kapasîteya reqabetê dibe ku nûker xuya bike. Di rastîyê de ew cihê xwe di nav rêûresma dirêj a rankinga (sinifandina) neteweyan de digire. Xisleta van hîyerarşîyan e ku bi awayekî têra xwe pirrengî radihêjin pirsan, lê belê di dawîyê de rêbazên pir zêde dişibin hev bi kar tînin (nîşan-hejmarên pêkhatî yên ku gelek guhêrbaran tînin cem hev). Bi vî awayî, tevî cihêrengî û pirbûna lêkolînan, cografyaya cîhanê ya serketina aborî û civakî kêm diguhere. Ev nîşandana xwe dubare dike, şahidîyê li vîzyoneke standartbûyî û hîyerarşîk a globalbûnê dike. Gelek nîşan-hejmar hene ku baldarîyeke taybet heq dikin:

- Forûma Aborî ya Cîhanê (FAC) û Instîtûya ji bo Bipêşxistina Birêveberîyê (Institute for Management Development, IMD) ku dibistaneke bazirganîyê ya navdar e li Swîsreyê, du sinifandinên herî zêde binavûdeng diweşînin. Ev her du lêkolîn di mijara kapasîteya reqabetê ya neteweyî de weke referans bi kêr tên.

- Nîşan-Hejmara bipêşketina merivî (NBM), ji alîyê pisporên Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (UNO) ve tê amadekirin. Ew sê guhêrbaran berhev dike: dewlemendî (Hilberîna Hundir a Nesafî [HHN] serê şênîyekî bi awayekî wekhev hêza kirînê îfade dike), hêvîya dirêjahîya temenê merivî û asta xwendebûnê. Ev nîşan-hejmar tevî hin rexneyan jî li cîhanê tên qebûl kirin.

- "Welatê tehlûke" ji alîyê gelek şirketên cihê yên pispor ve tê pîvan, ev şirket pirî caran girêdayî sektora sîgorteyê ne. Yên li ber çavan tên girtin bi dehan parametreyên mokroaborî, hiqûqî (dewleta hiqûqê), yan jî yên ewlerkarîyê (hebûna şeran, nebûna ewlekarîyê…) ne. Bi rêbazên xwe û bi encamên xwe cografyaya welatê tehlûke pir nêzî ya kapasîteya reqabetê ya neteweyan e.

- Ajansên notdayînê yên navdar (Standard & Poors, Fitch û Moody's) tevlî pîşesazîya nirxandina malî ya welatan dibin. Ew, weke ku şirket bin, notan didin dewletan, bi rêya pergaleke tîpan (weke mînak, sê A ji bo welatên "herî baş"). Ev notên ku cidîbûn û bandora wan a bi rastî bi awayekî birêkûpêk dikeve ber lêpirsînê, bi awayekî pir zêde tên medyatîze kirin.

- Bankeya Cîhanê her sal nîşanhejmara Doing Business (Kirina Kar) diweşîne, armanca wê ew e ku lihevkirina qada aborî bi hevîyên sektora taybet re nîşan bide. Ew jî pir nêzî nîşan-hejmara pêkhatî ya kapasîteya reqabetê ye.

- "Cazibbûn" a ku gelek caran bi kapasîteya reqabetê re tê tevlihev kirin, ji sinifandinên taybet ên weke yên ku UNO wan pêk tîne, sûdê werdigire (FDI Confidence Index, nîşan-hejmara bawerîlêanîna veberhênanên yekser ên bîyanî [IED]).

www.arsivakurd.org

TEBAX 2001

VEJÎNA GELEKÎ

Bihara nazik a kurdan li Iraqê

KENDAL NEZAN

Ji ber nebûna peymaneke bi navê "ambargoya biaqil" li ser Iraqê, Civata Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî dema peymana ”petrol berdêla xwarinê”. ku herêma kurdan a Iraqê ya di parastina hêzên leşkerî yên navnetewî de jî sûdê jê werdigire, ji destpêka meha tîrmehê vir de heta pênc mehan dirêj kir. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi guhartinan hewl da ku bersiva van rexneyan bide, yên dibêjin ku ew ji rejîma Iraqê bêhtir ziyanê digihîne gelê Iraqê. Lê gelo tevî raya giştî ya ereban ku ji ber dagîrkirina Filistînê ji alîyê Îsraîlê ve kezebreş bûye, ew ê welatên hevsînorên Iraqê çawa li dijî serokê Iraqê Sedam Huseyîn tev bigerin?

Dewletên hêzdar ên rojavayî berî deh salan bi mebesta maytêkirina (mudaxeleya) ji bo xatirê merivayîyê, bi pêşnîyaza Fransayê, bi biryarnameya hejmar 688 a Civata Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî a nîsana 1999ê biryar da ku « herêmeke parastinê » bidamezrîne ji bo ku nêzîkî du mîlyon kurdên ku ji êrîşeke mezin a leşkerê Iraqê revîbûne Îran û Tirkîyeyê karibin vegerin ser cîh û warê xwe. Ew devera bi berfirehîya nêzîkî 40.000 km2 û bi nifûsa 3,5 mîlyon kurdan ji alîyê hêza hewayî ya pirneteweyî ya bingehê wê li Tirkîyeyê ve tê parastin ku Fransa jî, bi yekîneyeke xwe ya hêzên hewayî, heta meha kanûna pêşîn a sala 1995ê tê de beşdar dibû.

Armanca pêşîn a rojavayîyan, sivikkirina barê hevpeymanên wan ên tirk bû ku rûbirûyî nearamîya ji ber pêleke bi sedhezaran penaberên kurd ên iraqî ber bi wîlayetên ji xwe bi têra xwe xwedî kêşe û alozî yên Kurdistana Tirkîyeyê ve hatibûn.

Ew bizav sê mehan piştî dawîya Şerê Kendavê hat kirin û Bexdayê li hember wê bi tu awayan li ber xwe neda. Hikûmeta Iraqê di meha çirîya pêşîn a sala 1991ê de karmend û birêveberên xwe yên karûbarê sîvîl ji sê wîlayetên (Duhok, Hewlêr û Silêmanî) li herêma di bin parastinê de vekişandin û mehane û mesrefên karmendên dewletê yên biryar da ku li wê derê bimînin birîn. Lê belê li bin zexta hikûmeta Enqereyê ku ji afirandina dewleteke xweser (otonom) a kurdî ditirsîya, rojavayîyan ne bi xwe ji wî gelî re birêveberîyeke taybetî an mandayeke (herêmeke parastî ya jêrdestê Neteweyên Yekbûyî) wekî ya ku wan di sala 1999ê de bi rêya Neteweyên Yekbûyî li Kosovoyê pêk anîbûn dixwest, ne jî ew alîgirên damezrandina hikûmeta kurdî ya herêmî bûn. Peyama wan zelal bû: Kurd dê ji êrişên leşkerê Iraqê werin parastin ji bo ku karibin vegerin malên xwe, lê divê welatê xwe yê wêrankirî ew bi xwe ava bikin û karûbarê welatê xwe ew bi xwe bi rê ve bibin. Îcar, piştî şerê bi kul û kovan ê sîh salan, zehmetîyeke bêhed dijwar li pêşîya kurdan bû: Birêvebirina welatekî bi qasê Swîsreyê, yê ku % 90 ji 5000 gundên wî û bi qasê 20 bajarên wî hatibûn xirabkirin, bingehê (jêrxanî) aborîya wî hatibû jinavbirin, zevîyên wî yên çandinê hatibûn mayîn û lixûmkirin û xwedîkirina pezî û cotkarî lê nemabû. Radeya bêkarîyê digihişt % 80 ji kesên ku dikaribûn bixebitin. Û bi ser de jî, Bexdayê devera kurdan ji tora elektrîkê ya niştimanî veqetandibû û ambargoya gaz û petrolê danîbû ser wê.

Lihevhatina "Birayên neyar"

Di nav wê rewşa wisa tevlihev de, divîya ku kurd bi ya ku di destê wan de bû îdare bikirana, bi xeyal û serhişkîyê bixebitîyana. Di destpêkê de Cepheya Yekgirtî ya Kurdistanî ku ji heşt partîyên sîyasî yên herêmê pêk dihat, desthilata herêmê wergirt û ji bo damezrandina Parlamentoya Kurdistanê dest bi amadekarîyên hilbijartinan kir. Ew dengdayîn di 18yê meha gulana 1992yê de hat kirin. Ji du pêkhatên sereke, Partîya Demokrat a Kurdistanê (PDK) ya **Mesûd Barzanî** 51 û Yekîtîya Niştimanîya Kurdistanê (YNK) ya **Celal Talabanî** jî 49 kursîyên parlamentoyê wergirtin. Suryanî û kildanîyên (mesîhî) bi nifûsa xwe ya bi qasê 30.000 kesan, 5 kursî bi dest xistin. Ji alîyên din ên ku negihiştin benda ji % 5ê ji dengên ku di hilbijartinê de hatibûn dayîn (partîyên komunîst, sosyalîst, îslamî û yên din) tu parlamenter nehatin hilbijartin, lê ew alî dîsa jî tev li hikûmeta yekîtîya niştimanî bûn ku di meha tîrmeha 1992yê de hate damezrandin.

Rêberên hikûmeta kurdî hêvîdar bûn ku ew dezgehên demokratîk dê bi lez ji alîyê hêzên rojavayî ve bihatana naskirin û bigihiştana piştevanîya wan a diravî. Lê pûte bi hikûmeta herêmî ya kurdî nehat kirin. Enqere, Şam û Tehran ji ihtîmala damezrandina dewleteke kurdî aloz bûn û wan jimareke pirsgirêkên di navbera xwe de da alîyekî û wezîrên wan ên karûbarê derve her sê mehan carekê civîyan ku «li rewşa li bakurê Iraqê mêze bikin.» Dewletên Yekbûyî yên Amerîkî û bi dû re welatên ewrûpî ji ber endîşeya ku hevpeymanên xwe yên tirk aciz nekin, xwe ji piştevanîya wê ceribandina demokratîk a nû ya kurdan da paş. Ew ceribandina yekem a di bin ambargoya du alî ya hikûmeta Iraqê û ya navneteweyî de fetisandî û ji derfetên herî kêm ên jiyanê bêpar, bi awayekî bi kul û kovanan têk çû. (1) Nakokîyeke li ser parvekirina hatinîyên kêm ên gumrikê di meha gulana 1994ê de di navbera PDK û YNKê de şerekî çekdar derxist. Welatên cîran benzîn pê de kir û ew agir hê jî gurtir kir. Ew şer heta sala 1997ê dewam kir. Nêzîkî 3 hezar meriv tê de hatin kuştin û bi deh hezaran kes jî naçar bûn ku ji cîh û warên xwe rabin û koç bikin. Li dawîyê, her du alîyên şerî tê gihiştin ku ew ê nikaribin alîyê din bi rêya leşkerî ji holê rakin û ku yek ji wan di warê leşkerî de bi ser keve jî, hevsengîya di navbera hêzên herêmî (Îran, Tirkîye û Iraq) de dê rê nede ku hêzeke sîyasî bi tena serê xwe bibe serdest. Şer di meha çirîya paşîn a sala 1997ê de hat rawestandin. Du serokên kurd, **Mesûd Barzanî** û **Celal Talabanî**, di meha îlona 1998ê de, bi navberîya Wezîra Derve ya Amerîkayê **Madeleine Albright**ê li Washingtonê peymanek mor kir û ew şer bi fermî bi dawî anî û bingehê dan û standinên aştîyê danî.

Bi wê peymanê, pênasîn bi serkeftina Barzanî ya di hilbijartinên parlamentoyê yên gulana 1992yê de hat kirin û her wisa encamên wê ku hikûmeteke berwext ya berpirsîyara rêkûpêkkirina hilbijartinên nû were damezrandin. Talabanî jî, ji alîyê xwe ve, soz wergirt ku hinek hatinîyên gumrikê bidin rêxistina wî. Ji hingê ve nêzîkî şêst civînên di navbera her du alîyan de bi kêrî çareserkirina pirsgirêkan û nêzîkîhevkirin û lihevanîna têbînîyên cuda yên PDK û YNKyê hatine.

Tevî zehmetîyê û tevî xwe bi xwe, kurdên Iraqê dest bi ceribandineke nû ya pêkanîna birêveberîyeke nemerkezî kir. Devera di bin parastina hêzên rojavayî de, hat dubeşkirin, bakur û başûr û karûbarên wan ji alîyê du birêveberîyên ku di nav xwe de naçarî reqabet û pêşbirkeyê bûne ve tên meşandin. Û li bakur, ku dewlemendtir e û çêtir tê birêvebirin û ku hikûmeta wê ya hevalbend a li Hewlêrê bi rêberîya PDKê lê sêyeka wê ji endamên kêmanîyan (êzidî, asûrî û kildanî) û endamên serbixwe pêk tê, nêzîkî % 70 gund û bajarên xirabkirî hatine avakirin, rê û bingeh hatine çêkirin û telefon hatine çêkirin. Ji bo xizmetên teknîkî (tenduristî, perwerde, veguhastin û hêz û têhn, elektrîkê) birêveberîyên bakur û başûr hevkarîyê dikin.

Hema bibêje hemû zarokên li alîyê bakur li 1950 dibistanan diçin xwendinê û hinek lîse û xwendegehên bilind jî li wî alîyî hene û her wisa du zanîngeh (Duhok û Hewlêr) ku 12 500 xwendekar li beşên weke wêje (edebîyat), zanyarî, tib û qanûnê yên wan zanîngehan dixwînin. Perwerdeya xwendegehên pêşîn û navîn bi kurdî ye, li zanîngehan li gor babetan, ders bi kurdî, erebî û ingilîzî tên dayîn. Xwendekar li xanîyên baş ên zanîngehê tên hewandin, mehaneya mamosteyên zanîngehan 140 dolar in (ku heft caran ji mehaneyên hevkarên wan ên iraqî zêdetir e) û hikûmet xanîyan jî dide wan mamosteyan.

Li alîyê başûr, hikûmeta bi rêberîya YNKyê endamên «serbixwe» û nûnerên partîyên biçûk jî vedigire. Li zanîngeha Silêmanîyê 3500 xwendekar hene û 367 755 xwendekarên din jî li 1677 xwendegeh û lîseyan dixwînin. Berevajî bakur, dibistana pêşîn li başûr ji bo kur û keç hemû zarokan hêj ne mecbûrî ye.

Tendirustî xebateke din a sereke ya desthilatdarên herêmî ye ku xizmetên gelêrî belaş (bêpere) dikin. Wan nexweşxane çêkirine, navendên nû yên bi amûrên nûdem ava kirine, ku gelek ji wan amûran ji ber ambargoyê ji bazara reş hatine peydakirin. Desthilatdarên herêmî ne berpirsîyarên nebûna dermanan in, lê dermanên bêwec bi rêya Iraq û Tirkîyeyê digihijin Kurdistanê. Ewlekarîya bajaran di destê polîsan de ye ku di du akademîyên polîsan de tên perwerdekirin. Du navendên din jî hene û li wir ji efser tên perwerdekirin ji bo serdarîya hêzên leşkerî yên ku ji pêşmergeyan pêk tên. Avahîya Parlamentoya Kurdistanê li Hewlêrê ye û Dadgeha Bilind a Pêdeçûyînê jî tê de ye.

Ev vejîna kurdî di warê çandî de hê bêhtir xuya ye. Gelê kurd ku ji mêj ve ye bêpar maye, bi heyecan lê digere û dixebite da ku wê dema ku wî ji dest daye telafî bike. Sê rojnameyên rojane û bêhtir ji 130an kovarên hefteyî hewil didin ku têhna welatîyan ji bo agahî û zanînan bikşînin. Ew weşan, ji edebîyatê bigire heta sînemayê, ji dîrokê bigire heta zanyarîyên komputerê, li ser hemû mijaran dinivîsin. Ji 10an zêdetir kanalên televîzyonê, bernameyên bi her celebî pêşkêşî temaşevanên ji hemû temenan dikin, du ji wan televîzyonan bi rêya satelîtê weşanê dikin û li nav hemû civakên kurdan li Rojhilatê Navîn û Ewropayê li wan tê temaşekirin. Sêlên antenên satelîtê yên ji bo temaşekirina kanalên newneteweyî pêwîst, li Iraq û Îranê qedexekirî ne, lê li Kurdistanê serbest in û kafeyên înternetê jî li wir roj bi roj zêdetir dibin. Rojnameyên li ser hemû bîr û bawerîyan, yên rejima Bexdayê jî tê de, bi azadî tên firotin. Kêmanîyên biçûk asûrî-keldanî xwedîyên 14, Tirkmen jî xwedîyên 9 dibistanên bi zimanê xwe ne, her wisa weşan û radyo û televîzyonên bi zimanê wan hene. Û kurdên êzidî ku bi demeke dûr û dirêj ji alîyê cîranên xwe yên misilman ve hatine herişandin û bi çewtî wek «bawermendên şeytanî » hatine hesibandin, ayîn û rê û resmên xwe yên dînî bi serbestî dikin û cîhên wan ên îbadetê di bin parastinê de ne.

Pêkanîna civakeke medenî ya ku tê de jin xwedîyên rolên sereke ne û ku bi taybetî zêdegavîyên ji alîyê komelên îslamî yên bi piştevanîya Îranê ve û edet û kevneşopên kevnar (wek kuştina jinan ji ber zinayê bi navê «namûsê») tên mehkûmkirin, azadîyan hêdî hêdî berfirehtir dike. Sîstema sîyasî ya kurdî di destpêkê de çav dabû dewletên bi yek partî yên ku li herêmê belav in, lê ew di bin zexta navxweyî û ji derve de û ji bo ku dilê raya giştî ya rojavayê li xwe germ bike, ber bi demokrasîya bi beşdarîya pir partîyan ve diçe, tevî wê yekê ku hê dûr e ku rêberên berê yên berxwedana çekdar bibin welatîyên ji rêzê û karbidestên hilbijartî hêza xwe bi tenê ji erka xwe werbigirin.

Rê, xwendegeh û xanî…

Li herêma xweser a Kurdistanê jiyan heta dereceyekê rehet e. Ew para bêhtir bi xêra hatiniyên ji bernameya bi navê «Petrol berdêla xwarinê» ya di bin biryarnameya hejmar 986 a Neteweyên Yekbûyî de ye. (2) % 13 ji pereyên wê bernameyê li ber sê wîlayetên herêma kurdan a di bin parastina navneteweyî de dikevin. Ew bername ji alîyê neh navendên şareza yên Neteweyên Yekbûyî ve tê birêvebirin. Ew navend, projeyên di warên perwerde, tendirustî, avakirin, çêkirina jêrxanî, anîna avê ji bo kesên bêcîhûwarkirî de hildibijêrin û pereyan ji wan re destnîşan dikin. Ji bernameya xwarinê, wek alîyên din yên Iraqê heman ratib (par) digihije şênîyên wê herêmê jî. Birêveberîya kurdan alîkarîya bicîhanîna wan projeyan dike, karmend û ofîsên navendên Neteweyên Yekbûyî diparêze û bi comerdî enbar û dezgehên teknîkî dide wan. Navendên Neteweyên Yekgirtî li ser navê hikûmeta Iraqê ya ku li herêmê ne amade ye pereyan didin projeyên ku ji alîyê Bexdayê ve hatine pejirandin û wan bi rê ve dibin. Lê ew pêvajoyeke dûr û dirêj û aloz û tevlihev e. Wergirtina diravê ji projeyekê re pêwîst, gelek caran bi demeke ji salekê dirêjtir dajo û projeyên din jî hema yekcar tên redkirin.

Ji sala 1997ê heta niha 4,9 mîlyar dolar ji bo herêma xweser a kurdan hatine destnîşankirin, ji

www.arsivakurd.org



wan pereyan dibe ku 3 mîlyar dolar hatibine xerckirin, yên mayîn jî dê bi tenê bi pejirandina projeyên pêşnîyarkirî werin dayîn. Wan pereyan, bi karzanî û jîrîya kurdan û bi birêveberîyeke tekûz û rêkûpêk, dest pê kiriye ku berheman bidin. Ew welat bi vekirina rêyan, avakirina xwendegeh, pirtûkxane, xanî û lojmanan, vekirina meydanên werzişê, park, kargeh û cîhên din, dibe şantîyeyeke mezin. Şert û mercên jiyanê yên xelkê herêmê bi awayekî pir ber bi çav baştir bûne.

Para bêhtir a diravê birêveberîya kurdî ji gûmrikê ye, ji kamyonan e ku ji Tirkîye û Îranê her mal û tiştî dibin Iraqê. Parastina xeta lûleyên petrolê ya di navbera Kerkûk û Yûmûrtalikê de, bazirganîya li ser sînoran, bi taybetî ya petrolê jî jê re pereyan tîne. Ji bo xurtkirina aborîyê, rayedaran devera xwe kiriye herêmeke serbest ku ji hemû celeban mal û berhem, wek cixareyan, jê diçin bazarên Îran û Iraqê. Bi wan çavkanîyên pereyan birêveberî bi diravnameyeke salane ya li dorê 230 mîlyon dolaran karê xwe dike ku hemû bi hev re ji 250 000an bêhtir karmendên sîvîl û 30 000 kesên berpirsîyarên parastinê jê re dixebitin. Banqeya Navendî ya Kurdistanê buhayê dînarê kurdî diparêze ku rewşa wî li hember dolarê amerîkî aram e (1 dolar = 18 dînarên kurdî) û buhayê wî vê gavê 100 caran ji dînarê Iraqê zêdetir e.

Bêhtir ji sed salan e ku kurd yekem car bi demeke wiha dirêj karûbarê perçeyeke warê xwe yê dîrokî bi rê ve dibin. Û ew karekî baş dikin. Ev yek gelek hêvîyê dide 25-30 mîlyon kurdên ku li Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê belav in. Lê paşeroj xul û şolî ye. Navçeyên xwedî petrol yên Kerkûk, Sincar, Xaneqînê, yên bi nifûsa nêzîkî 2 mîlyon kurdan, hê di bin desthilata rejima Iraqê de ne. Rejîm, rêbaza erebkirina wan cîhan bi awayekî bêrawestîyan dimeşîne, ew cîh di rewşeke şerpeze de ne û sedemeke koçberîya boş a kurdan bo Ewropayê, ev yek e.

Lihevhatina her du partîyên sereke yên kurdan hê temam nebûye. Hê jî ne piştrast e ku hevkarîya wan ê bi dawî neyê û ew ê venegerin ser wê dema berê ya xirab. Bi ser de jî, hikûmetên welatên hevsînor ku gelek kurd li wan welatan dijîn, tevî soz û peymanên xwe yên ji bo cîranîyeke baş û hevkarîya aborîyê, xebata xwe ji bo tevlihevkirina Kurdistana xweser didomînin. Ew herêm nikare bêyî parastina hewayî ya Ingiliz û Amerîkîyan û bêyî hatinîya bi pileya % 13 ji bernameya jêr biryarnameya hejmar 986 ya Neteweyên Yekbûyî bijî. Her awayê lênihêrtin, pêdaçûyîn û guhartina ambargoya li ser Iraqê divê bendên parastina kurdan û dayîna diravê pêwîst ji herêma wan re vebigire, an na ew ê rê bide malwêranîyeke din a merivayîyê. Û ew ê berî wext, dawîyê li vê bihara geş a kurdan bîne.

(1) Nivîsara Kendal Nezan, « L'injustice faite aux Kurdes », di Le Monde diplomatique a adar a sala 1999ê de bixwîne (Heman nivîsar di Le Monde Dîplomatique a kurdî de « Bêdadîya li hember Kurdan » … 2012.

(2) Nivîsara Alan Gresh, « L'Irak paiera ! », di Le Monde diplomatique a çirîya pêşîn a sala 2000ê de bixwîne.

Wergera ji fransî: Bêrîvan Kilic Tugan

ILTER REZAN: **Ji rêzewêneyên Pavilyona Kurdistan a Venedîgê**, li ser tuwalê teknîka tevlihev

ILTER REZAN: **Ji rêzewêneyên Pavilyona Kurdistan a Venedîgê**, li ser tuwalê teknîka tevlihev

WÊNESAZÊ VÊ HEJMARÊ

ILTER REZAN

Ilter Rezan di 1960ê de li Dêrsimê ji dayik bûye. Di salên 1978-1980ê de li Enqereyê perwerdeya pedagojîyê wergirt. Ji ber sedemên polîtîk dev ji perwerdeya xwe berda û li Ewropayê bû penaber. Di 1980yê de li Almanyayê bi cîh bû.

Ilter Rezan di navbeyna salên 1990-1994ê de li bajarê Freiburgê perwerdeya hunerê dît. Bi dû re jî bi salan li bajarê Offenburgê di dibistana hunerê de wek mamosteyê wênesazîyê xebitî. Rezan, ji sala 1997ê ve çar salan li Almanyayê seroktîya Yekîtîya Wênesazên Kurd ku bi pêşengîya Enstîtûya Kurdî hatibû damezirandin kir.

Wek gelek hunermendên dîyasporayê Ilter Rezan jî di berhemên xwe de bi giranî li ser mijarên zordestî. tundî, aştî, ziman, pişavtin û gelê kurd û çanda gelê kurd dixebite. Hunermend di berhemên xwe de li gel van mijaran herweha cîh dide hest, xem û xeyalên xwe jî.

Hunermend Rezan xwedîyê teknîk û xêzeke bi hêz e, di stîl û şêwazê de bi metodeke nedîtbar dixebite û berhemên xwe bi motîfên figuran temam dike.

Di berhemên hunermend de bi awayekî vekirî tê dîtîn ku hunermend bi derûnîya merivan re ji nêzîk ve têkildar e.

Di berhemên hunermend de motîf û figurên nedîtbar, rûyên nîvxêzkirî û îfadeyên li ser rûyên merivan di heman demê de wek lidervexistina bûyereke derûnî tê xuya kirin.

Ev xêz û rengên wêneyan tesîreke giran a rûhî li ser meriv dihêlin. Ev yeka jî hêza şêweya berhemên hunermend îfade dike.

Ilter Rezan, heta niha li gelek bajarên Almanyayê bi dehan pêşangehên serkeftî li dar xistine. Hunermend li Luksembûrg, Belçîka, Awusturya, Fransa, Polonya û Îtalyayê jî beşdarî gelek pêşangehan bûye.

Hunermend di 2009ê li Îtalyayê di 53yemîn Bîennala Venedîgê de yek ji beşdarvanên hunermend ên ji Kurdistanê bû. Hunermend Li bajarê Bochum yê Almanyayê dijî û xebatên xwe didomîne.

Bîst salan piştî bidestxistina bajarê Şûşî ji alîyê eskerên ermenî ve di 9ê gulana 1992yê de, li çîyayên Qarebaxa Jorîn agirbest tu caran evqasî lawaz nebûbû. Jinûve xwe çekdarîkirina bi lez a Azerbaycanê ji sala 2010ê ve, tirsa ku dîsa şer biqewîme bi gewde dike, meriv nikare pêş bibîne ka encamên vî şerî li ser tevahîya Kafkasyayê wê çawa bibin. Her du gel berdeleke giran didin vê neçareserîya siyasî û dîplomatîk.

Statukoyeke buha di navbera Ermenistan û Azerbaycanê de

Rewşeke şer a bêdawî li Qarebaxê

PHILIPPE DESCAMPS *

« *Ji panzdeh saniyeyan zêdetir nemeyizînin. Piştî vê kelîyê divê meriv serê xwe bitewîne».* Ji kulekê di nav betonê de vekirî meriv dikare rêzeke têlên rêsayî bibîne, û kêmî du sed metroyan dûrî wir, meriv yekem rêza eskerên azerî dibîne. Wextê meriv li hundirê vê kozika ku li Eskeranê ye, li alîyê ermenî dinêre, hertişt sahneyeke Şerê Cîhanê yê Yekem tîne bîra mirovî: Stargehên mutewazî, tûrikên qûmê, sobeyeke daran ji bo zivistanê û çend qotîkên konserve yên zingargirtî da ku heke êrişeke bi şev pêk were, meriv bi dengê wan pê bihese. Her sê eskerên vê stargehê 20 salî ne. Ji Yerêvanê nê. Li gor efserê wan, îro bere bêdeng e…

"Duhî, dijmin hejdeh caran agirbest bin pê kir, û me carekê bin pê kir" ev yek îdîaya korgeneral Movses Hakobian e ku wezîrê parastinê yê Qarebaxa-Jorîn e. "*Li ser sê sed kîlometroyên xeta berê, eger kesek xwe nêzîk bike destûr heye ku guleyan lê bireşînin. Her roj şer e.*" Di destpêka hezîranê de, gulebarandinên her du alîyan di nav du rojan de heşt kes kuştin. Piştî agirbesta dawîyê, di 16ê gulana 1994ê de mohrkirî, xetên berê neguhertin; esker di bin axê de di stargehan de man. Wê demê birêveberên Bakûyê rawestandina şer qebûl kiribûn da ku pêşî li ber felaketeke mimkin bigirin. Hingê ermenîyan hê nû bi zorê kontrola kevne herêma otonom ya Qarebaxa-Jorîn û erdên fereh yên bi ser wê ve bi dest xistibûn, nêzîkî %13 erdên kevne Komara Sovyetî ya Azerbaycanê. Ji wê demê û vir ve, esker û segvanên elît, bi roj û bi şevê li ber hev disekinin, carinan kêmî sed metroyan dûrî hev dibûn.

Lekên eskeran rîtma hevdîtinên navneteweyî dîyar dikin. Ew jî van mehên dawîyê qat bi qat zêde bûn, di wê dema ku Rûsyayê gelek civînên bilind ên ku serokkomarê ermenî û azerbaycanî tanîn cem hev, organîze dikirin. Li alîyekî hevgirtina Ermenistan û Rûsyayê, û li alîyê din jî têkîlîyên germ di navbera Azerbaycana tirkîaxêv û Tirkîyeyê de dikin ku ev pirsgirêk bibe sedema alozîyên mezin ên navneteweyî.

Di salên 1905, 1918 û piştre jî ji 1991ê heta 1994ê, sisê şer di navbera ermenî û «tatarên» deştan de ku êdî ji wan re Azerî tê gotin, qewimîn. Ermenîyên Qarebaxa-Jorîn, ku li hember girêdayî kirina erdên xwe bi Baku re bi biryara Partîya Bolşevîk radibûn, bûn yekem gel ku di 1988ê de li dijî URSS serî hildan. Piştre pêla netewperest a welatên baltîk rû da û vê yekê heta bi jihevdeketina Yekitîya Sovyetê ajot. Li ser erdekî ji Luksembûrgê piçekî mezintir, ev pirsgirêk ku weke bombeyeke amade ye biteqe, him li Washingtonê, him jî Moskovayê dibe sedema fikaran. Di civîna G20an a dawîyê de ku 20ê hezirana dawî li Meksîkoyê pêk hat, Obama, Pûtîn û Hollande li bêhêzbûna xwe mikur hatin û bi bîr xistin ku "*her dû welatên ku şer dikin divê di warê girtina biryarên girîng yê ji bo çareserkirineke daîmî û aştîyane ya pirsgirêkê de dereng nemînin*". Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Rûsya û Fransayê hevserokatîya Koma Mînskê dikin ku ji sala 1992yê û vir ve bi çareserkirina pirsgirêkê hatiye wezîfedar kirin.

Endamên arteşa Qarebaxa-Jorîn ku li hêvîyê ne rojekê ji bo hevdîtinan werin vexwendin, difreya xwe dikin. Di 9ê gulana dawî de paytexta wê Stepanakert (Azerî jê re dibêjin Xankendî) alayeke eskerî ya çek û topan -a mirovî matmayî dihêle- li dar xistibû û bidestxistina bajarê Şûşî, ku kevne topxaneya mezin a azerî ye, pîroz dikirin. Di gulana 1992yê de vê hêza eskerî derfet da ji serhildêran re da ku kontrola korîdora Laçînê bi dest bixin (Ermenî jê re dibêjin Berdzor), û bi vî rengî Qarebaxê bi Ermenistanê ve girêbidin. Di xeyala gelek ermenîyên li tevahîya cîhanê de ev serketina li dijî azerîyan ku weke "tirk" tên hesibandin, hê weke heyfhilanîna dîrokê tê bi bîr anîn.

Ermenîyên Qarebaxê ku pêşî xwestibûn welatê xwe bi Ermenistanê ve girêbidin, di sala 1991ê de doza serxwebûnê kirin. Vê yekê destûr da wan ku vî şerî weke têkoşîna azadîya neteteweyî terîf bikin, da ku weke şerekî li ser parçeyekî erd yê di navbera du welatan de neyê hesibandin. Ev Komara piçûk a serjimara wê sed û çil hezar, xwedîya destûreke bingehîn, parlemanekê, alayekê, arteşekê, sazî û hikûmetekê ye. Lê di rastîyê de ew gelekî girêdayîyê "xwîşka xwe ya mezin" e. Biryara hertiştî li Yerêwanê tê dan.

Serokkomarê Ermenistanê Serge Sarkîsyan, li alaya fermî ya tankan, balafirên bê pîlot, û fuzeyên herî dawî derketî li çêpikan dida, di trîbûna fermî de di navbera du rahiban de rûniştîbû, li kêleka Bako Sahakyan, serokkomarê «Komara Qarebaxa-Jorîn» ku tu welatê li dinyayê wê qebûl nake. Dixwestin nîşan bidin ku «gelê çîyayan» wê tu caran dev ji heqê xwe yê dîyarkirina qedera xwe bernede. Birêz Sahakyanê ku tîrmeha bihurî ji nû ve hat hilbijartin wisa îdîa dike *"em dikarin bibêjin ku ev bîst sal in Qarebaxa-Jorîn di avakirina sazîyên demokratîk ên li gor pîvanên navneteweyî de xwe gelekî bi pêş xist. Dawîya dawîyê, civaka navneteweyî wê serxwebûna me qebûl bike. Em naxwazin serdema zehmet ya şerî dîsa bibînin. Lê ji bo me mijara li pêş ewlekarî ye. Em amade ne xwe biparêzin, û çalakîyên tedbîrê pêk bînin.*"

Ji dawîya şerî û vir ve, Stepanakert/Xankendi gelekî guhert. "Doza ermenîe" nîşan dide ku kirasekî nû li xwe kiriye. Sazîyên gelemperîyê û avahîyên modern bajarekî xwecihî (pênc hezar şenîyên wî hene) pêk tînin ku ji avahîyên bilind yên pîşesazîya Ermenistana piştsovyetê cazibtir in. Bîst û pênc kilometroyan dûrî beraya şer, jinên bi cilên rengo rengo di kolana herî mezin a bajêr de bêxem li dikanan digerin! Dahata salane ya serê welatîyekî (2 200 euro) ji ya piranîya herêmên Ermenistanê bilindtir e. Bajarê Stepanakertê artêşeke bi panzdeh hezar eskeran xwedî dike, maeşên wan dide, rê û piran ava dike, lêçûnên tendurûstî û yên dibistanê digire ser xwe û hejmareke mezin a şirketan kontrol dike. Û Yerêwan pereyan dide… Ermenistan ji sisiyan diduyê budceya wê fînanse dike.

Kevne serokkomarê Qarebaxa-Jorîn Arkady Xûgassyan hez dikir wisa bibêje "*petrol di destê Azerbaycanê de ye, ermenî jî xwedîyên dîyasporayê ne*". Pareke mezin a alîkarîya aborî ku civakên ermenî yên li cihanê belavbûyî didin, diçe wir. Li gor Michel Tancrez, nûnerê Fona Ermenîyên Franseyê li Stepanakertê, ev hejmar nîvê bêşên Fona Ermenîyên Franseyê pêk tîne: "*sala 2000î di dema kampanyaya me ya yekem de, nêzîkî % 15ê malbatên fransî ku bi eslê xwe ermenî ne Qarebax nas dikirin. Îro, herkes hestîyar e, nêzîkî çaryeka wan bêşa xwe didin.*" Weke dewlemendîya petrolî, têsîrên xirab ên vê rewşa bêhempa hene. Rojnamevan Ara K. Manûgyann timî behsa jirêderketin û zîyandarîyan dike.(1) Trancrez tercîh dike bi vê kurtebêjê vê yekê îfade bike: "*Yên di siyasetê de herî zêde dînamîk in di warê aborîyê de jî yên herî zêde dînamîk in.*"

Li kevne paytexta dîrokî Şûşîyê atmosfer diguhere. Katedrala restorekirî nîşana bedewbûneke ji nû ve kifşkirî ye. Lê piranîya şênîyan di avahîyên pirqatî yên jihevdeketî de dimînin, ev avahî bi şiklê brejvnevî hatine ava kirin. Li ser erdekî bi qasî hezar û sê sed metroyan bilind, sîstema navendî ya germkirina xanîyan êdî naşuxile, lewra sobe nehatin temîr kirin. Herkes bi sobeyên xazê, yan jî bi sobeyên daran îdare dike, ku lûleyên wan jî di pencereyê re derdikevin… Gelek avahî hîn şahidîya serdema zehmet a şerên sala 1992yê dikin. Xanîyên azerîyan hatin xira kirin. Her du mizgeftên mezin û sûka kevin hatin terikandin. Berîya Şerê Cîhanê yê Yekem bajar xwedîyê deh hezar şênîyên tevlîhev bû ku di bin rejîma sovyetî de piranîya wan azerî bûn. Îro nêzîkî sê hezar ermenîyan lê dimînin, piranîya wan piştî fermanên/pogromên sala 1988ê ji kevîya bajarê Bakûyê Sûmgaytê revîyan.

Lavrent Xûmanyanê ku gelek caran birîndar bûye û xelat girtin, bi xemgînî behsa hejmara bilind ya bêkaran dike: *"Wextê ez bîst salî bûm, min bi awayekî çalak di hemû şeran de cîh girt, îro ez çil salî me û bêkar im. Ev hesta bikêrnehatinê ji bo zarokên min zehmet e.*" Xwelidervegirtin bi pratîka "terapîyên şokê" bi gewde bû, ne bi tiştê ku qaşo "pevçûna şaristanîyan" e. Ev terapîyên şokê li welatên URSSyê bûbûn sedema bêhêvîtîyê. Li gor parêzer Sêvag Torossyan "di bin neteweperestîyê de rûyê veşartî yê pirsgirêka mezin a civakî heye». (2)

Têkîlîyên ku Ermenistan bi cîranên xwe re datîne berevajîya gotinê nîşan didin. Ermenistana xirîstîyan di warê eskerî de hevkara Rûsyaya ortodoks e û di heman demê de ya welatên misilman ên Asyaya Navîn e ku endamên Rexistina Peymana Ewlekarîya Kolektîf (RPEK) in. Têkîlîyên wê bi Îrana şîî re ku bawerîya xwe bi Azerbaycana şîî nayîne, gelekî baş in. Azerbaycana şîî jî xwe gelekî nêzîkî Tirkîyeya sunî û Gurcistana xirîstîyan hîs dike ya ku bi awayekî vekirî ketiye nav şerê li dijî Rûsan…

Bi saya Îranê, Ermenistanê karîbû blokada azerî-tirk a li ser îtxalata xaz û petrolê rake. Tehran li hember îdîaya nasnameyî ya Bakûyê fikaran dike, lewra civakeke mezin a azerî ji panzdeh mîlyon kesan pêkhatî li bakurrojhilatê Îranê bi cîh bûyîye. Ermenî û fars berî her tiştî ji nêzîkbûna Îsraîl û Azerbaycanê ditirsin; di sibata bihurî de lihevkirineke li ser firotina çekan a bi buhayê 1.2 mîlyar euroyan hat mohr kirin. (3) Bakû bû xwedî çekên sofîstîke yên weke balefirên bêpîlot, di berdêla vê de jî petrol û hin îmtîyaz dan Îsraîlê: Berpirsîyarên amerîkî gumanbar in û difikrin ku îsraîlî li başurê Bakûyê *"balafirgeheke eskerî kirîn*" ji bo ku projeyên xwe yên bombebarandina avahîyên nukleer ên Îranê pêk bînin. (4) Gumana ermenîyan heye ku êrişeke bi vî rengî dibe ku nîşana hucûmeke bi ser Qarebaxê ve be.

Wextê mirov ber bi rojhilat ve biçe, du binesazî rewşa teybet a vê herêmê nîşan didin. Çîyayên mirovî neçar dihêlin bi rêyên çîyayî yên ji du hezar û sê sed metroyan bilindtir re derbas bibe, vê herêmê ji Ermenistanê vediqetînin. Yek ji wan xetan rêyeke hesînî ye ku di dema berîya şer de Stepanakert bi deşta Kura ve ku bi awayekî xwezayî dewama wê ye û heta bi Bakûya dûrtir ve girêdida. Bi tenê terasên vê rêya hesînî mane; her tişta din ji hev hatiye xistin. Binesazîya din jî balafirgehê Stepanakertê ye ku nêzî stasyona trenê ya kevin e ku berî zêdetir ji salekê hat vekirin û hê li hêvîya balafirên xwe yên pêşî ye. Wê ev balafir ji Yerêwanê bên. Hêzên azerî sûnd xwarin ku ew ê her balafira bê, bixin xwarê. Ew dixwazin bi bîr bixin ku gelek sîvîlên azerî, ku li gundê Xocalî diman, di dema êrişa pêşî a mezin a ermenîyan a 26ê sibata 1992ê de hatibûn kuştin.

Bilançoya şer gelekî giran e. Ji bîst hezaran zêdetir mirov mirin û divê hejmara birîndaran, ya xazîyan û ya gelek penaberan li vê were zêde kirin. Li gor Komîserîya Bilind ya Netewên Yekbûyî ya ji bo Penaberan (HCR), pênc sed û heftê hezar kes li hundirê Azerbaycanê ji cihê xwe bûn û neçar man koçber bibin, bi ser de jî welat neçar ma du sed û bîst hezar penaberên ji Ermenistanê hatin, bihewîne. (5) Senatora fransî Nathalie Goulet şahidîya kirî weha dibêje: "*Ez çûme serdana kampa penaberan. Min yê Fîlîstînê jî dîtin û dikarim bibêjim ku ji vê xirabtir nînin!*". (6) Ermenistanê bi xwe jî derîyên xwe li sê sed hezar ermenîyên li Azerbaycanê re vekirin.

Wextê mirov bigihîje çîyayê bilind Agdamê, li ser erdên ku ne yên kevne herêma xweser dimeşe: Li gor peyvên civaka navneteweyî, ev cih warekî "dagirkirî" ye. Ji 1993ê û vir ve Konseya Ewlekarîyê ya Rêxistina Netewên Yekbûyî (RNY) xwest ku *"hêzên dagîrker xwe di cîh de ji navçeya Agdamê û ji tevahîya herêmen din yên nû dagîrkirî, bê şert û bi temamî derkevin*". (7) Bi dehan gund û çend bajarên valakirî yên weke Fizûlî, Cebraîl yan jî Agdamê yên ku kevne navenda bazirganî yên herêmê bûn, vî wargehê eskerî yê terkandî pêk tînin.

Bi tenê çend erdên ji mayînan paqîjkirî ketin destê cotkarên ermenî. Bi dehan hezar xanî û bi sedan apartman bi awayekî birêkûpêk hatin talan kirin, heke bi guleyên şerî nehatibûn xira kirin. Mobîlya, stûnên xanîyan, ban, kanalîzasyon, xetên elektrîkê, hertiştê ku karîbû bi kêr bê, hat dizîn, û ya ku karîbû bê şewitandin di nav agirî de tine bû. Bi tenê çend parçeyên dîwaran man.

Ermenî, ku dixwazin li ser erdên valakirî bi cih bibin, li bahaneyên fermî digerin da ku vê yekê bikin: Ew behsa dîroka…kevin dikin. Heft kîlometroyan dûrî Agdamê, ermenîyan sîteyeke girîng ya dema helenîstîk, ku bi lez navê Tîgranakertê lê kirin, dît. Sala 2005ê notirvanê sîteyê wisa tîne bîra xwe û behsa kifşa xwe dike *"rovîyekî qulek kolabû, ji wê qulê dîwarek xuya dikir. +Min ev diwar nîşanî Hamlet Petrossyan, birêvebirê Înstîtuya Arkeolojîk kir. Wan erd kola û bermahîyên dêreke mezin a ermenî ya sedsala 6ê dîtin."* Avahîyeke mezin a sedsala pêşî ya berîya serdema me jî hat kifş kirin. Tê gotin ku ew hebûna bajarekî di dema Tîgranê Mezin (95-66 b.z.) ango serdema zêrîn a Ermenistana antîk de avakirî nîşan dide.

Guftûgoyên li ser rêzgirtina ji yekparebûna erdên Azerbaycanê mijara pirsgirêka monastirên weke Dadî Vank vedike. Mirov di ser rêyeke xirab re ku di ser çemê Tartat (yan jî Trtu) re derbas dibe, xwe digihîne wir. Li ser çîyayê avakirî, ev monastira serdema navîn kaçkarên (kevirên neqişandî) sedsala 13ê dihewîne. Lê ew girêdayîyê navçeya Kelbacarê ye ku berîya fedayîyên ermenî sala 1993ê bajêr bi dest bixin, ji alîyê Bakûyê ve dihat bi rê ve birin.

Weke korîdora Laçîn-Berdzor a li navendê, rêya Bakur ku di navçeya Kelbacar re derbas dibe di warê eskerî de stratejîk bû. Piştre bi şuxilandina kanan li Drmbonê, nêzîkî gola çêkirî ya Sarsangê, ew di destpêka sala 2000ê de bû paytextê aborî. Tevahîya navçeya Martakert tijî zêr, sifir, û molîbden e. Şirketa

www.arsivakurd.org

Kronolojî: du sedsalên serwerîyên li pey hev

14ê gulana 1805ê: Peymana Kûratçayê; Xantîya Qarebaxê bi împaratorîya rûs ve tê girêdan.

21ê sibata 1828ê: Peymana Turkmançayê:Yerêwan û Naxçiwan dikevin bin desthilatdarîya rûsî.

Sibat–tebax 1905: Bakû û Şûşî jî tê de li gelek bajaran di navbera ermenî û azerîyan de şer rû da. Bi hezaran meriv hatin mirin.

Nîsana 1915ê: Li Ermenistana Rojava qirkirin

24ê sibata 1918ê: Ragihandina Komara Demokratîk û Federatîf a Tanskafkasyayê

26-28ê gulana 1918ê: Azerbaycan û Ermenistan serxwebûna xwe radigihînin; li Qarebaxê şer diqewime.

Nîsan-çirîya paşîn 1920: Sovyetîkirina Azerbaycan, Qarebax û Ermenistanê.

5ê hezîrana 1921ê: Buroya Kafkasyayê ya Partiya Bolşevîk biryara girêdana Qarebaxê bi Azerbaycanê ve dide.

7ê hezîrana 1923ê: Avakirina herêma serbixwe ya Qarebaxa-Jorîn, ku paytexta wê êdî ne Şûşî ye, lê belê Xankendî ye, ku navê Stepanakert lê tê kirin.

20ê sibata 1988ê: Sovyeta Qarebaxa-Jorîn girêdana xwe bi Ermenistanê ve hildibijêre. Li Askeranê şer rû dide û di pey re jî komkujîyên ermeniyan li Sûmgaytê û xwepêşandanên pir mezin li Yerêwanê.

Tebax - îlon 1991: Piştî şkestina darbeya li Moskovê, serxwebûna Azerbaycan û Ermenistanê.

10ê kanûna 1991ê: % 82yê kesên qeydkirî dengê xwe ji bo serxwebûna Qarebaxa-Jorîn da: Giştîbûna şer.

24ê adara 1992yê: Avakirina "Gruba Mînskê" ku Rêxistina Ewlekarî û Hevgirtinê li Ewrûpayê (OECD) wê bi rê ve dibe.

30ê nîsana 1993yê: Konseya Ewlekarîyê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY) dixwaze ku hêzên ermenî yên li erdên dagîrkirî yên azerîyan vekişin.

16ê gulana 1994ê: Mohrkirina agirbestekê li Moskovayê.

Base Metals karsaza herî mezin a Qarebaxa-Jorîn e ku xwe xistibû nav karên temîrkirina vê rîyê ya ku destûr dida ku mîneralan bigihînin fabrîkayên ermenî yên li Vardenîsê yên ku kêmtirî sed kîlometroyan dûrî wir in. Avahîsazîyê bihara bihurî dest pê kir. Eşkerekirina pererazandinan di vê avahîsazîyê de li Azerbaycana ku ditirse ev statuko wê tu carî bi dawî neyê, bû sedema nerazîbûnan. Serokdewletê Azerbaycanê Îlham Alîyev, dixwaze ji dewlemendîya petrolî sûdê werbigire daku bi pêş ve biçe: "*Em ê hewldanên xwe yên dîplomatîk bidomînin, lê di heman demê de em ê derfetan hemûyan bi kar bînin da ku yekparebûna erdê xwe ji nû ve ferz bikin.*" (8) Lêçûnên eskerî yên Azerbaycanê ji sala 2004ê ve pênc caran ji berê zêdetir bûn û sala 2011ê gihîştin 2.5 milyar euroyan, tevî ku li Ermenistanê ev hejmar bi tenê 335 milyon euro ye. (9) Tevî ku çarçoveya lihevkirineke bi rastî sala 2007ê bi navê "prensîpên Madrîdê" hat eşkere kirin jî "Civaka navneteweyî" li ber newekhevîya hêzan ku her diçe zêdetir dibe, ketiye nav fikaran, lewra ev prensîp hê ne zelal in. Daxwaza Koma Mînskê ku çareserkirina pirsgirêkê bi rêya dîplomatîk ji xwe re kiribû armanc, xwe dispêre vegerandina tevahîya erdên dagîrkirî û bidesxistina mafê vegera gundên xwe ji bo azerîyan, di berdêla xweserîyeke herêmî ya fereh ji bo ermenîyan, tevî misogerkirina ewlekarîyê bi operasyoneke parastina aştîyê û bicîhkirina korîdoreke ku Qarebaxê bi Ermenistanê ve girêbide.

Divê çareserîyeke huqûqî cografyayê û rêze çîyayên Kafkasyaya Piçûk ku di herême re derbas dibe, li ber çavan bigire. Li Bakurê wargehê di bin kontrola ermenîyan de çîyayên gelekî bilind hene ku ji sê hezar metroyan dibihurin (çîyayê Mrav 3724 metro). Ev çîya Qarebaxa-Jorîn û herêma Şaumîyan, ku di bin kontrola Bakûyê de ye ji hev vediqetîne. Xuya ye, ev herêm ji alîyê şênîyên ermenî ve ku xwestibûn wê bi Ermenistanê ve girêbidin ji bo demeke dirêj hat terikandin. Ev çîya berî hertiştî herêma Kelbacar îzole dikin. Hikûmeta Stepanakert ermenîyan teşwîq dike da ku li vê herêmê bi cîh bibin. Nêzîkî panzdeh hezar kesan li vê herêma tampon a ku cîrana Laçîn-Berdzorê ye dimînin, lê erdên mayî yên bidestxitî vala man.

Serokkomarê Azerbaycanê Alîyev fikra statuyeke demî (ya pênc salan) ji bo navçeyên Kelbacar û Laçînê tevî prensîpa lê bicîhkirina korîdorekê qebûl dike. (10) Ew îddia dike ku amade ye hinek serxwebûnê bide erdên kevne herêma xweser. Lê di mijara yekparebûna erdên welatê xwe û ya vegera kesên ji cîhê xwe bûyî de, Şûşî jî tê de, ew ji ya xwe nayê xwarê.

Ji bo birêveberîyên her du alîyan, rêya lihevkirinê zehmet xuya dike, lewra şerî destûr da wan ku desthiladarîyê bi dest bixin. Li gor François Thual *"Li her du welatan, Azerbaycan û Ermenistanê, pirsgirêka Qarebaxê bû mijara dîyarker ya tevahîya siyaseta parleman û hikûmetê, mirov nikare ji vê pirsgirêkê bibihure, ew sedema tevahîya alozîyên siyasî yên navxweyî ye.* » (11)

Serokkomar Levon Ter Petrossyan dema çareserkirineke gav bi gav qebûl kir, bi zirarkirina li berjewendîyên emrîkî hat gunehbar kirin. Ji dema ji desthilatdarîyê xistina wî ya sala 1998ê û vir ve tevahîya mekanîzmayên biryardanê yên desthilatdarîya siyasî û aborî di destê wan kesan de ne ku Qarebaxê ji Yerêwanê ve bi rê ve dibin. Serokwezîrê halê hazir, Serge Sarkîsyan, li wir wezîrê parastinê bû û baş dizane ku ji ermenîyan re berdêla statukoyê buha ye. Piştî têkçûna hewldana wî ya xwe nêzîkkirina Tirkîyeyê, ew êdî nikare hêvî bike ku mimkin be blokadê û zexta navneteweyî kêm bike bêyî ku bi astengîyên sîstemekê ku ew bi xwe temsîla wê dike, rû bi rû nemîne.

Civaka ermenî ku navenda lêkolînên zanistî û ya hêza pîşesazîyê bû li gor dabeşkirina sovyetî ya kar, li pey hev bi trawmayên erdhêjê (1998), yên şerî û yên jihevdeketina URSSyê re rû bi rû ma. Li alîyekî olîgark dewlemendî û gewîbûna xwe di sazîyên çapemenîyê de ku bi xwe kontrol dikin, nîşan didin, li alîyê din jî piranîya kolektîfên karsazan şirketên xwe bi temamî girtin, ji sê paran yekê erdên cotkarîyê beyar in, û welat neçar ma dewlemendîyên kanên xwe yên binerd bifiroşe şirketên rûsî ku pereyê herî baş didin. Di hilbijartinên giştî yên gulana 2012ê de, tevahîya namzedan axaftinên mirov dixwazin bibihîzin, dikirin. Lê gelek ermenî êdî dengê xwe nadin.

Bîst salên serxwebûnê yên trajedîyeke bêdeng bûn: Koçberîyeke mezin a aborî. Tê fikirîn ku di destpêka dehsala 1980yê û vir ve, di navbera heft sed hezar û 1.3 milyon ermenî ji Kafkasyayê derketin. (12) Rûsya bi serê xwe her sal bi navînî sîh û pênc hezar ermenîyan li welatîyên xwe zêde dike. (13) Wisa tê fikirîn ku hejmara şênîyên daîmî bi tenê 2.8 milyon e. Siyaseta ku çêkirina zarokan teşwîq dike siberojeke demografîk ya gelekî reş û tarî pir kêm telafî dike.

Wextê mirov vedigere Yerêwanê da ku hinekî hêvîyê bi xwe re çêke, divê biçe parkeke li ser rêya mezin a General ku li nav bajêr e. Ji çend mehan û vir ve, ciwan li hember polêsan radibin û taybetîkirina vê wargeha gelemperîyê û îmtîyazên dayî hin bazirganan, şermezar dikin. Ew dixwazin nîşan bidin ku heman tişt ji bo tevahîya milkên hevpar ên tevahîya welêt diqewimin, lê li alîyê din ji retorîka neteweperest bala mirovî ji vê yekê dûr dike.

Armen Rakecyan, ciwanekî li nav dîyasporaya fransî hatî dinê û berîya bi hijdeh salan li Şûşîyê bicihbûyî, difikire ku divê siberoj bi afirandina civakeke sîvîl pêk were, ew heta ku karibe li gel komeleyeke herêmî ya alîkarîyê hewl dide ku civakê bi rêk bixe. Li gor wî, pêşî divê mirov dest bi bawerîya bi xwe û bi yên din anînê dest pê bike: "*li taxa min, kurê malbatekê berîya bi salekê ji alîyê azerîyan ve hat kuştin. Tu nikarî ji wan û ji malîyên wan re bibêjî ku azerî cîranên baş in û ku divê aştî bi wan re were çêkirin.*" Yekem nîşana nermbûnê bi tenê dikare ji enîya şer ve bê: Bi qedandina ji hev dan û stendina cenaze û girtîyan, bi paşve kişandina xeta bereyên şer, bi bicîhkirina mekanîzmayeke kontrolkirina agirbestê, bi qebûlkirina ku axaftina bi şewazekî din di konferansên dîplomatîk de.

*Rojnamevan

(1) *Binêre li malpera* www.thetruthmustbetold.com

(2) Sévag Torossian, *Le Haut-Karabakh arménien. Un Etat virtuel ? (Qarebaxa-Jorîn a Ermenî. Dewleteke Xeyalî?),* L'Harmattan, Paris, 2005.

(3) Associated Press, 26ê sibata 2012ê.

(4) Mark Perry, "Israel's secret staging grounde" ("Kewara sir a Îsraîlê"), *Foreign Policy,* Washington, 28ê adara 2012ê.

(5) "Les réfugiés dans le monde",("Li Cîhanê Penaber"), Komîserîya Bilind a Neteweyên Yekbûyî ji bo Penaberan (HCR), Cenevre, 2000.

(6) *Journal officiel du Sénat,* Paris, 15ê nîsana 2010ê.

(7) Biryara 853yê ya Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî, 29ê tîrmeha 1993ê.

(8) Axaftina ji bo bîst salîya serxwebûnê, 17ê çirîya pêşîna 2011ê.

(9) Stockholm International Peace Research Institute (SIPRI), Stockholm.

(10) Axaftina li hember gelê azerbaycanî yê Qarebaxa-Jorîn, Bakû, 6ê tîrmeha 2010ê.

(11) François Thual, *La Crise du Haut-Karabakh. Une citadelle assiégée ?(Pirsgirêka Qarebaxa-Jorîn. Bajarekî dorlêgirtî?),* Puf-Iris, Paris, 2002.

(12) "Migration and human development: opportunities and challenges" ("Koçberî û Bipêşketina Mirovî: Derfet û Zehmetî"), Bernameya Neteweyên Yekbûyî ji bo bipêşketinê, New York, 2009.

(13) Li gor pirtûka statîstîkan ya Rûsyayê, çar sed û pencî hezar ermenî di navbera 1991 û 2009ê de koçberî Federasyona Rûsyayê bûne.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

ILTER REZAN: **Ji rêzewêneyên Pavilyona Kurdistan a Venedîgê**, li ser tuwalê teknîka tevlihev

Du versîyonên nelihevkir

Ji bo doza kontrola Qarebaxa-Jorîn bikin, her du alî jî dîrokeke kevin a hevpar li gora xwe şirove dikin. Wextê di bin desthilatdarîya împaratorîyên osmanî, farisî û piştre ya rûsî bûn, gelên Transkafkasyayê heta dawîya sedsala 19ê gelekî tevlihev û nêzîkî hev bûn. Ev tevlihevbûn gihîştibû asteke ku berîya Şerê Cîhanê yê Yekem hejmara gurcîyên li bajarê Tiflîsa ku wê bibûya paytexte wan, ewqasî kêm bû ku xelkê gurcî lê bûbû hindikayîyek. Heman tişt hat serê azerîyên ku li Bakûyê diman: Çavdêrekî wê demê wisa digot "*eger neteweдewletek bixwaze sînoran deyne, neçar e du tiştên nejidil qebûl bike:Wê hejmareke bilind a xerîban li ser erdên xwe bihewîne û divê dev ji hejmareke zêde ya welatîyên xwe yên li derveyî sînorê wê man berde, awayekî din ne mimkin e*». (1)

Ermenî têkilîyên çandî û olî derdixin pêş. Bi bîr dixin ku ji serdema kevnar û vir ve, beşên rojhilatî yên Kafkasyaya piçûk, di navbera çemên Araxe û Kûra de, parçeyek erdên Ermenistana dîrokî bûn. Beşa çîyayî ya vê herêmê, ku zêdetir bi navê Artsax behsa wê tê kirin, sembola têkoşîna ermenîyan li dijî jidestdana çandê ye.Vê herêmê ku ji sedsala çaran û vir ve bû xiristîyan, li hemberî desthilatdarîyên li pey hev nexasim bi saya rejîma Melîktîyan hinekî serbixwebûna xwe parast,.Wisa tê fikirîn ku hejmara gelê ermenî ku li Nagorno-Qarebaxê (Qarebaxa-Jorîn) dimînin bi tenê ji ber zexta nûdem ya îdareya sovyetî ya Azerbaycanê kêm bû, di navbera serjimarên salên 1923 û 1989ê de ji % 94ê daket % 76ê. (2)

Herçî azerî ne (3), wan cudakirina Qarebaxa-Jorîn ji tevahîya Qarebaxê weke tiştekî ne xwezayî dihesiband. Ya ku ew derdixin pêş ew e ku ev herêma bi giranî faris lê serwer bûn, para bêhtir xwedîya statuyeke cihê ji ya herêma Yerêwanê bû. Azerî dilsozîya vî gelê çîyayan bi xirîstîyanîyê ve jî înkar nakin û wisa bawer dikin bû ku ew bi eslê xwe arnawutên "bûyî ermenî» ne, ku ji kevne qraltîya Axbanîyê tên, yanî ji Arnawuta Kafkasyayê ku dergûşa Azerbaycanê bû. Katolîkosatê Axbanîyê bi dirêjîya gelek sedsalan li manastira Gandzassar ma, cîhê herî girîng yê Qarebaxê, heta di 1815ê de ji alîyê rûsan ve hat tune kirin. Wisa tê fikirîn ku desthilatdarên nû yên slav pişta yekbûna dêran girtine û destek dane koçkirina ermenîyên ji Îran û Tirkiyeyê ji bo xurtkirina nufûsa xirîstîyan a li başûrê împaratorya xwe bi cîh bûyî.

Di çirîya pêşîn a 1918ê de, wextê diviya osmanî ji Bakû û Azerbaycanê vekişin, generalê payebilind ê brîtanî William M. Thomson Naxçiwan da Ermenistana serbixwe, Zangêzûr û Qarebaxa-Jorîn da Azerbaycanê. Piştî konferansa Aştîyê ya Parîsê, Civaka Neteweyan (CN) ev mijar xistibû rojevê, lê Arteşa Sor ji dîplomatan bi leztir tevgerîya. Da ku dilê Tirkîyeya kemalîst û azerîyan rehet bike, nexasim ji bo misogerkirina kontrola petrolê Bakûyê, bolşevîkan Naxçiwan bi Azerbaycanê ve girêda. Lê wan Zangezûr da Ermenistanê. Di 4ê hezîrana 1921ê de Joseph Staline ku komîserê li Neteweyan bû [di sîstema sovyetî de Netewe yek ji "wezaretên" rêjîmê bû, komîser jî nûnerên gel in, nota wergêr], tevlî buroya partîya bolşevîk a li Kafkasyayê bû, ev buro bi awayekî şermokî meyldar bû ku Qarebaxa-Jorîn bi Yerêwanê ve bê girêdan. Lê piştre, buro xwe bi paş ve dikşîne û vê herêmê dide Bakûyê, statuyeke xweserîyê û parçekirineke ku bi tenê piştî 1923ê pek tê, amade dike. ji 1921ê û vir ve ermenî vê biryarê red dikin.

Ph.D.

(1) Pierre Georget La Chesnais, *Les Peuples de la Transcaucasie, pendant la guerre et devant la paix / Gelên Transkafkasyayê di demê şerî de û li pêşberî aştîyê),* Brossard, Parîs, 1921.

(2) "Qarebaxa-Jorîn: li Azerbaycanê hevdîtinên ji bo aştîyê û siyaseta mîlîtarîst", memorandûma sefîrê Ermenistanê li pêşberî civata giştî ya Neteweyên Yekbûyî xwendî, 23yê adara 2009ê.

(3) Nexasim jî *bigire li ber* Fazil Zeynalov, *Le Conflit du Haut-Karabakh. Une paix juste ou une guerre inévitable / Şerê Qarebaxa-Jorîn. Aştîyeke adil an jî şerekî mecbûrî),* L'Harmattan, Parîs, 2011. »

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Srî Lanka û Pilingên Azadîyê yên Elam-Tamîlê

ERIC PAUL MEYER *

Sê salan piştî bi şidetê tepisandina Pilingên Azadîyê yên Elam Tamîlê (LTTE), serokdewletê Srî Lankayê Mahinda Rajapaksa li hemberî gelê sîghalî –ku piranîyê pêk tînin– enerjîya di ruhê wî de ye bi kar tîne da ku siyaseteke her diçe zêdetir otorîter bimeşîne. Ji bo ku jirêderketin û xirabbikaranîna erka xwe veşêre, binxêz dike ku rêxistinên bîyanî ev lê eşkere kirine.

Li hemberî Konseya Mafên Merivan a Neteweyên Yekbûyî ya ku 22yê adara 2012ê li Cenevreyê civîya, Srî Lanka derbên hişk xwarin. Bi bîst û çar dengan (dengê Hindîstanê jî tê de), Sazîya navneteweyî pêşnîyaza çareserkirinê ya Dewletên Yekbûyî qebûl kir. Panzdeh dengan jî (yên Çîn, Rûsya û Pakistanê jî tê de) ev pêşnîyaz red kiribûn. Li gor vê pêşnîyazê tê xwestin ku hikûmeta Srî Lankayê biryarên komîsyona neteweyî ji bo lihevkirinê (*Lessons Learnt and Reconciliation Commission)* bi cîh bîne. Herwiha divê dawî li cezanekirina binpêkirinên mafên merivan bîne yên ku di dema dawî ya şerê di navbera 2006 û 2009ê de welat parçe parçe kirî. (1) Da ku meriv fêm bike ev yek ji bo serok Mahinda Rajapaksa şeqameke çawa bû, divê meriv bi bîr bixe ku di 27ê gulana 2009ê de hefteyekê piştî tepisandina serhildana tamîlan a ji bo serxwebûnê, bi bîst û neh dengan (yê Hindistanê tê de) biryar hatibû dayîn Rêxistina Neteweyên Yekbûyî bi tu awayî dest wernede karên navxweyî yên Srî Lankayê.

Lê belê îsal, birêz Rajapaksayê ku wezîrê karên derve yê wezîfedar Gamini Lakshman Peiris û sefîra Cenevreyê Tamara Kunanayakam ji hikûmetê dûr xistibûn, bi hênceta ew zêde nerm in; Rajapaksa tevdîra xwe kir û yek ji alîgirên xwe kire serokê heyetê. Di tevahîya civînê de, wî xwepêşandanên li dijî ya ku jê re dibêje "*desttêwerdana amerîkî*" li giravê organîze kiribûn. Li hemberî avahîya ku salona civînê lê ye, komeke piçûk a parazvanên mafên merivan yên Srî-Lankî ku hatina wan a li Cenevreyê xwe dispêre raporeke komîteya pisporên ji alîyê sekreterê giştî ya Neteweyên Yekbûyî ve hatî wezîfedar kirin, û xwe dispêre kampanyayeke rêxistinên ne hikûmetî (NGO) yên rojavayî û çapemenîya îngilîzî-axêv meşandî: Kanala brîtanî Channel 4 belgefîlmek li ser komkûjîyên di dawîya şerê qewimî de weşand ku tê de arteşa Srî- Lankî bi sûcên giran yên şer dihat gunehbar kirin.

Di dawîya şerî de sala 2009ê de, wexta serdana sekreterê giştî ya Rêxisitina Neteweyên Yekbûyî (RNY) Ban Ki-Moon, birêz Rajapaksa soz da ku wê rêzê ji mafên merivan re bigire di berdêla mudaxalenekirina RNY a der barê komkûjîyên qewimî de. Wî xwest bide bawer kirin ku operasyona eskerî ya dimeşe *"operasyonake insanî"* bû. Sala piştre birêz Ban komîteyeke pisporan wezîfedar kir da ku rastîya bicîhanîna vê sozê kontrol bikin.

Li gor rapora di 2011ê de hatiye weşandin, meriv dikare navê "*sûcên giran yên şerî û sûcên giran ên li dijî merivatîyê*" li hin kiryarên hikûmetê û yên dijminê wî yê tamîl bike. Arteşê bi ser nexweşxaneyên bi zanebûn nîşan ji wan girtî de bombe barandin û bi ser "wargehên ewlekarîyê" de yên ku wê bi xwe xelkê sîvîl teşwîq kiribû li wan kom bibe; Pilingan sîvîl weke mertalên merivî bi kar anîn. (2) International Crisis Group û NGOyên din piştre xirabûna rewşê binxêz dikin: Li herêma tamîlan artêşê birêveberî û çalakîyên aborî bi dest xistin; di mijara dabeşkirina erdan cihêkarîya etnîk; şideta li dijî şêst hezar jinên semyanê, malbat û zarokên wan li herêmên ku artêşeke ji du sed hezar eskeran wê kontrol dike; kuştin û windakirina rojnamevanan. (3)

Da ku van rexneyan ji holê rake, rejîmê xwe dispart biryarên Lessons Learnt and Reconciliation Commission, ku wê bi xwe endamên wê hilbijartibûn. Lê rapora ku komîsyonê di çirîya paşîn a 2011ê de bi îngilîzî weşand, herçiqasî di mijara sûcên şerî de bi tedbîr be jî, ewqasî rexnegir bû ku hikûmetê nexwest wergera wê bi sengalî û bi tamilî biweşîne. Di rapora xwe dispêre şahidîya mexdûran de komîsyon van gilîyan dike: Revandin û windakirin, serbestîya helwêstên komên çêkdar, mudaxeleyên siyasî yên ku huqûq û birêveberîyê ditevizînin û xemsarîya desthilatdarîyê li hemberî mexdûrîyeta jin, zarok, kal û seqetan. Ew pêşnîyaz dike ku dawî li kontrola arteşê li ser birêveberîya sîvîl were anîn. Di encama raporê de weha tê nivîsin: *"Tevî ku du sal di ser dawîlêhatina şerî re derbas bûn jî şidet, gumanbarî û hestê newekhevbûnê di jîyana civakî û siyasî de pir belav e. Sedema pevçûna etnîk têkçûna hikûmetên li pey hev hatî di warê bersivdana êş û gazinên mafdar ên gelê tamîl de ye. Ji desthilatdarîyê nehat ku biryarên komîsyonê bi cîh bîne, ev jî bû sedema pênebawerîya giştî ya bi tevahîya komîsyonên dewletê ew wezîfedarkirî, weke Lessons Learnt and Reconciliation Commissionê bixwe jî".*

Tevî ku di encamê de tehlûkeya qutbûna ji Hindistanê heye jî, rejîm êdî xwe dispêre Çîn û Pakistanê, lê piştgirtîya Hindistanê di şerê wê yê li dijî Pilingên Tamîl de pir dîyarker bû. Rejîm Dewletên Yekbûyî bi manîpulekirina Rêxistinên Nehikûmetî û hin "dewletên mişterî" (welatên Amerîkaya Başûr yan jî welatên Afrîkî) ji bo berjewendîyên xwe yên neokolonyalîst gunehbar dike. Biserketina sala 2009ê weke ya neteweperestîyeke herêmî ya giravê (neteweperestîyeke sîngalî) li hemberî trans-neteweperestîyeke dîyasporayan (ên tamîl) yên ku rojavayîyan pişta wan digirt.

Rajapaksayê ku girseyên senghalî ji ber ku wî weke mîmarê biserketina li dijî Pilingan dibînin, gelekî hez jê dikin, wisa difikire ku dikare rexneyan piştguh bike. Meriv peyvên bi rengê *"serokdewletê me di şerî de bi ser ket, ew dizane çi baş e ji bo welêt"* bi awayekî eşkere gotî pir dibihîze (wextê meriv bi xwedîyên van gotinan re şexsî bipeyive hingê îdîa gelekî diguherin û cihê ne …). Ji sala 2010ê û vir ve, di hilbijartineke pêşwext de serokdewletê niha general Sarath Fonseka bi piranîyeke dîyar têk biribû. Vî generalî êrişa dawî ya şer bi rê ve biribû, lê piştre li dijî Rajapaksa tevgerîya û berpirsîyarîya sûcên şerî yên qewimî jî xist stûyê wî. Hema piştî ku ji nû ve hat hilbijartin, serokdewlet reqîbê xwe bi rêya dadgeheke eskerî xist hepsê. Di dema hilbijartinên giştî de, parlemanê hijdehemîn guhertina -367- destûra bingehîn, qebûl kir. Ev guhertin destûrê dide serokdewletî bêyî ku sînorekî dewrên serokdewletîkirî hebe, bibe namzetê serokdewletîyê û tevahîya erkan da wî da ku endamên dadgeha bilind, endamên komîsyona birêxistinkirin û çavdêrîya hilbijartinanan, endamên komîsîyona têkoşîna li dijî bertîlxwarinê û ya ji bo parastina mafên merivan dîyar bike.

Bi awayekî nakokane, şermezarkirin û mueyîdeyên ji derve hêza wî xurtir dikin. Xelkê welêt wisa hîs dike ku mexdûrê globalbûnê ye û desthilatdarî baş dizane çawa diviya sûdê ji vê rewşê wergire. Tevî rêjeya mezinbûna aborîyê zêde dibe (di 2011ê de %7) jî, deynên welêt girantir bûn û di çileyê 2012ê de Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) deyndanên xwe rawestandin. Tevî ku ji berê ve nirxa rûpî li hemberî doleran kêm bûbû (% -14 di navbera 2011 û 2012ê de) jî IMF doza devaluasyoneke radîkal ji Srî Lanka xwest. Mueyîdeyên aborî weke yên dawîlêanîna buhayên erzan ji bo welat bikeve bazara ewropî, weke nîşana komployeke kapîtalîzma kosmopolît li dijî serxwebûna neteweyên piçûk tên hesibandin.

Banga misêwa ya ji bo bipêşxistina hestên neteweyî mîlîtanên herêmî dixe nav rewşeke zehmet, lewra ew kengî mafên civakî biparêzin tên gunehbar kirin ku lîstikên împeryalîzmê wan bi kar tîne. Çapemenîya sînghalî NGOyan rexne dikin, û qûtbûna ji hev a çînên gelî û întelektuelên pêşverû teşwîq dikin, wan weke kesên ji derfetan sûdê werdigirin û weke partîzanên xemilandî yên Pilingan terîf dikin.

Tehlûke herweha li dijî mîlîtanên li jêr ên bingehê jî hene, lewra guman ji wan tê kirin ku ji derve ve tên fînanse kirin û manîpule kirin. Rêxistinên ji bo alîkarîya bipêşketina welatên bakurî, ku di agirbesta di navbera 2002 û 2006ê de bi tesîr bûn, yên ser bi Dêra katolîk, yên ser bi terîqetên protestan ên tundraw, û di demeke nêzîktir de yên ku ji alîyê weqfên misilman ên welatên Kendavê ve tên fînanse kirin, bi zirarkirina li nasnameya neteweyî tên gunehbar kirin.

Piştî hewldana xwe ya avakirina hêzeke siyasî, rahibên bûdîst jî tevlî alîgirên serokdewlet bûn, ligel îmtîyazên ku dide wan, ew piştgirîya peydakirina zarokên-rahib dike. Yên herî radîkal, ku banga şerekî pîroz li dijî serxwebûnxwazên tamîl kiribûn, îro stranên pesnê serketinê dixwînin, kesên fikra wan a dinyayê nerm yên di hikûmetê de şermezar dikin û xwepêşandanên li dijî cihên pîroz ên xirîstîyan, yan jî misilman organîze dikin. (5) Tevî ku ew di nav civakeke manastirî a serjimara wê sîh û heft hezar e hindikahîyek in jî, tesîra wan li ser çînên gelî yên bajarî mezin e, yên ji kevîya-bajaran û herwiha li herêmên erdên wan hê nû li çandinîyê vedibin ên li bakurê navenda welêt, û têkilîyên wan bi tamîlan re hene. Piranîya rahibên sîngalî, yên ji malbatên xizan tên, li dijî burjuwazîya îngilîzî-axêv a kosmopolît xwe weke parastvanan dibînin, parastvanên ziman û çandeke ku globalbûn gefan li hebûna wê dixwe. Yên ji bûdîzmeke hişk bawer dikin ên ku di nav îdeolojîyeke pesnê li derveyî civakê mayînê û tunekirina dildarîyan dide, mezin bûyî, di dîn de rewabûna radîkalbûna xwe li hemberî dinyayeke xirab dibînin; yên ku li ser rêya bûdîzmeke modernîst in ji bo tevlîbûneke mîlîtanî ji bo parastina dînekî ku li hemberî belavbûna xirîstîyanî û misilmanîyê di tehlûkeyê de ye, weazan didin, û peyama li dijî şidetê ya Bûda didin li alîyekî.

Rajapaksa herwiha xwe dispêre arteşê. Birayê wî Gotabhayayê ku wezîrê parastinê ye artêşê kontrol dike û hê xwedî prestîja serketinê ye û bi saya artêşê bi sedan hezar malbatên xizan dikarin debara xwe bikin. Nêzîkî sê sed hezar eskerên wê hene, çavkanîyeke mezin a peydekirina kar û fînansekirina lêçûnên rahiban e, ji pênc paran pareke mesrefên dewletê li wê diçin. Li bakur rojhilatê welêt, artêş dabeşkirina erdan, tevnên aborî yên ji nû ve avakirinê û belavkirina zad, qût û xwarinê kontrol dike; hotel, qadên golfê, stad û şirketên ji nû ve avakirinê yên artêşê li wir hene. Bi ser vê hêzê de jî bertîxwarîyek heye ku desthilatdarî naxwaze bibîne, weke ku nabîne, dike.

Lê kiryarên hin berpirsîyarên siyasî yên bertîlxwur dest pê dikin ku zirarê li bawerîpêanîna desthilatdarîyê bikin. Nimûneya herî bi nav û deng wezîrê têkîlîyên gelemperî Mervin Silva ye. Ew parlamenterê taxeke Colombo ye ku weke stargeha serekên mafyaya narkotîk û alkola sexte navdar e û ev parlementer têkîlîyên xwe bi mafîyayê re bi awayekî eşkere nîşan dide. Dema ku wî memûrekî ku fermana wî bin pê kirîbû bi darekê ve girêda, dîmen bi kamerayê hatin qeyd kirin; pesnê xwe bi şkandina dest û lingên rojnamevanekî protestovan dide, û îdîa dike ku wê heman tiştê bîne serê tevahîya muxalifan. Rewşa bêcezaman û nebûna ewlekarîyê belav dibe. Leşkerên sîvîl ên fermanan bi cîh tînin, mexdûrên xwe di kamyonetên spî yên plakeya wan jêbirî de direvînin û winda dikin: Di navbera îlona 2011 û adara 2012ê de sîh û heft mîlîtan yan jî girtîyên ji ber tunebûna delîlan nû ji hepsê derketî hatin revandin û winda kirin.

Bi ser de jî pirsgirêka erdan hê mijareke siyasî ya pir nazik e. Rikberîya ji bo milkîyeta erdên sîstema avdanîyê nû li wan bicîhkirî yên ji alîyê dewletê ve hatibûn dabeş kirin, sala 1950yê bûbûn sedema yekemîn şerê di navbera tamîl û sîngalîyan de.

Şer û pişt re tsunamîya sala 2004ê bûn sedema koçberbûneke girseyî ya merivên ji her etnîsîteyê. Vegera ser erdên xwe ya kesên koçkirî (di sala 2009ê de du sed û pêncî hezar, û ev hejmar herî kêm sê caran zêde dibe heke meriv penaberên berîya wan jî lê zêde bike) dibe pirsgirêk, lewra hinên din erdên wan dagîr kirin. Arteşa ku di vî warî de xwedî erka herî mezin e, sîngalîyan li ser van erdan bi cîh dike. Tapû yan jî qeydên erdên ku dewletê ew bi kirê dan, yan winda bûn, yan jî di dema felaketê de tunebûn, û desthilatdarî naxwaze belgeyên mirinê bide kesên ji felaketê sax filitî da ku ew bikaribin mîrat wergirin.

Pirsgirêka zimanî jî hê ewqasî zehmet e. Zimanê tamîl ku % 25ê xelkê giravê pê dipeyive, hê di piranîya belgeyên îdarî de nayê bi kar anîn û li nav piranîya mezin a endamên hêzên çêkdar ên Bakûr û Rojhhilatê welêt kontrol dikin jî ev ziman nayê zanîn. Biqasî nîvê kesên tamîlîaxêv êdî bi zimanê sîngalî dikarin xwe îfade bikin (berîya bi sîh salan ev rêje % 9 bû), lê bi tenê % 4ê kesên sîngalî-axêv bi zimanê tamîlî dizanin. Zimanê ku qaşo divê bibe zimanê di nav her du gelan de îngilîzî ye, % 22yê tamîlan pê dizanin, lê bi tenê % 13ê sînghalîyan pê dizanin. Bernameyên perwerdeya dibistanan dikin ku nasnekirina çanda hevûdu bidome. Weke nimûne, pirtûkên sîngalî tu cîhî nadin tesîrên başûr-hindî di dîrokê de û li ser şaristanîya giravê. Di gulana 1981ê de, şewitandina bi qest a pirtûkxaneya dewletê li Jaffnayê, ku hikûmetê bi serserîyan dabû kirin, dewlemendîyeke bi sed hezaran pirtûk û destnivîsan tune kirin û çînên întelektuel yên tamîlî ku heta wê demê gelekî nerm bûn ber bi serhildanê ve daf dan. Da ku heyfa xwe hilînin, Pilingan êrişî wargehên pîroz ên bûdîst Dara Bodhî û Perestgeha Diranî kiribûn.

Da ku bîraanîna şerî, hejmara kuştîyên vî şerî, bîranîna têkçûyan jê bibin her tişt kirin. Artêşê bi dozeran gor û sênatofên (gorên vala ji bo bibîranîna mirinekê) goristanên ku Pilingan lê pîrozkirina qehremanên xwe yên şehîdbûyî bi cîh kiribûn, xira kirin. Weke ku ya kirî têra xwe eyb nebe, bi ser de jî kampeke eskerî li wê deverê ava kirin û pêş tê dîtin ku li ser erdên vê deverê hotelek were ava kirin. Propagandaya turîstîk klîşeyên cineteke ekolojîk û bixêrhatineke gelekî devliken û aşitîxwaz nîşan dide; lê ruhên demê buhurî wê bi hêsanî neyên xapandin.

* Dîrokzan, profesorê dinyadîtî li INALCOyê [Enstîtuya Neteweyî ya Ziman û Şaristanîyên Rojhilatî, nota wergêr]. Ligel Delon Madavan û Gaëlle Dequirez ko-nivîskarê pirtûka bi navê *Les Communautés tamoules et le conflit sri-lankais (Civakên tamîl û şerê srî-Lankî),* L'Harmattan, Parîs, 2011.

(1) Berhema li jêr bixwîne: Cédric Gouverneur, "Le grand désarroi des Tamouls du Sri Lanka" ("Bêhêvîmayîna mezin a Tamîlên Srî Lankayê"), *Le Monde diplomatique,* tebaxa 2010ê.

(2) www.un.org ; www.crisisgroup.org

(3) Li gor Rêxistina Rojnamevanên Sînornenas (RBS), bi kuştina 34 rojnamevan, windikarina 10an û mişextkirina 50yan, di warê azadîya rojnamegerîyê de Sri Lanka di nav 178 welatan de di rêza 163yê de ye; 35 malperên înternetê di navbera çirîya paşîna 2011ê û çirîya paşîna 2012ê de hatin bloke kirin.

(4) www.priu.gov.lk

(5) *Bigire li ber* "Religions et politique à Sri Lanka à l'ère post-coloniale" ("Dîn û siyaset li Srî Lankayê di serdema paş-kolonîyal de), di pirtûka li jêr de: Christophe Jaffrelot û Aminah Mohammad Arif (di bin rêveberîya wan de), *Politique et religions en Asie du Sud. Le sécularisme dans tous ses états (Siyasett û dîn li Asyaya Başûr. Laîkbûna hêrsrabûyî)*, Editions de l'EHESS, koleksîyona"Purushartha", Parîs, 2012.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

Di çarçoveya xwepêşandanên li dijî "filmê" li ser pêxember Mihemed li cîhana erebî de komeke lîbyayî êriş birin ser konsolosaxaneya amerîkî ya li Binxazîyê û sefîr kuşt. Milîsên ku hin ji wan bi ser wezareta hundir û ya parastinê ve ne, yên ku xelkê welêt wan red dike, hê jî dikin ku bênîzamî dewam bike û li ber biîstîqrarbûna welêt û damezirandina dewleteke xurt radibin.

Kuştina sefîrekî amerîkî, xirakirina zîyaretên marabûtî

Lîbyaya bi destê milîsan

Patrick Haimzadeh *

Li Lîbyayê tu tişt weke ku hatibû plan kirin naqewime. Tevî ku ji desthilatdarîyê xistina rêjîmê û vir ve rewşa welêt ber bi xirabîyê ve diçe jî, heta ku sefîrê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di êrişa 11ê îlona 2012ê de hat kuştin, çapemenîya rojavayî bala xwe nedida ser rewşa ewlekarîyê ya li vî welatî. Tîrmeha 2012ê Lîbya di rojeva çapemenîyê de bû. Wê demê hevgirtina "lîberal" ku Mahmûd Cibrîl wê bi rê ve dibe di hilbijartinên giştî de, partîya Birayên Misilman têk biribû -partîya wî 39 ji 80 kursîyên ji partîyan re veqetandî bi dest xistin û Birayên Misilman jî 17 kursî bi dest xistin. (1)

Gelek şiroveker ku li tevlihevbûn û jihevketina tabloya siyasî serwext nedibûn, berê xwe dan tiştên ku herî zêde hez jê dikirin , analîza encamên hilbijartinan û zanista siyasî, wan birêz Cibrîl kir kesayeta nû ya paşerojê. Çend hefteyan bi şûn de Meclisa nû ya Neteweyî Mohammad Mexarîyef ku partîya wî Enîya Neteweyî, ya ku bi gotinên wî partîyeke îslamî ya ilmî ye û di hilbijartinan de bi tenê sê kursî bi dest xistin, weke serokkomarê nû bijart. Ev yek piştrast dike ku sedema hebûna pêşdîtinan dîyarkirina nerastbûna wan e. Heman Meclisê 12ê îlonê Mustafa Abû Şagûrê du deng ji Cibrîl bêhtir bi dest xistin, kir serokwezîr.

Abû Şagûrê îslamîstan pişta wî digirt, heta wê demê di nav hikûmeta berê de ku navê hikûmeta "dewra guhertinê" lê hatibû kirin, weke alîkarê serokwezîr cîh digirt. Ev hilbijartin nîşan dide ku zehmet e meriv bi mentiqa klasîk a partînasîyê li Lîbyayê binêre, li wir dilsozî û hevrikîyên herêmî, heta bi hevrikîya eşîran ji hevrikîya di navbera "îslamîst" û "lîberalan" de ku mentiqa rojavahî wan tercîh dike, xurttir e.

Di meclisê de li şûna ku kampanyaya xwe ya hilbijartinê bispêrin nîqaşên îdeolojîk, her du namzedan ew spart lihevkirinên alîgirî dikirin. Li alîyê din, çareserkirina pirsgirêka cîh û giranîya dîn wê bibe yek ji armancên destûra bingehîn ya nû, lê awayê dîyarkirina şêst pisporên ku wê bi nivîsandina wê bên wezîfedar kirin hê jî ne dîyar e: Gelo divê ew bi awayê hilbijartinên giştî, yan jî divê ji alîyê Meclisa Giştî ve werin dîyar kirin?

Tevî ku meclis nû hat hilbijartin jî wisa xuya ye ku xwe dûrî wî welatê bi rastî kiriye yê ku di tîrmehê de birêz Cibrîl di hilbijartinan de lê bi ser ket û ev meclis Cibrîl weke ku li derveyî hikûmeta nû be dihesibîne. Hejmareke zêde ya lîbyayîyan bawer dikin ku kapasîteya birêz Şagûr ji bo xwe ferz bike, dewletê ji nû ve ava bike û yekitîya welêt pêk bîne, heye. Piranîya rexneyên ku lê tên girtin li ser tevlîbûna wî ya di hikûmeta berê de ye ku bi ser neket, nexasim di mijara ewlekarîyê de, li ser qaşo nêzîkbûna wî ya bi Dewletên Kendavê re ku beşeke karîyera xwe ya lêkolîner û mihendisîyê lê derbas kiribû, û li ser nenaskirina wî ya Lîbyayê ku ji sala 1980yê heta vegera xwe ya sala 2011ê jê veqetîyabû.

Ev parçebûna elîtên teknokrat ên di mekanîzmaya dewletê de xwedî statu nînin û ku xwedî rêxistinên ewlekarîyê yên meriv dikare bi wan bawer be nînin, rewşa heyî dide fêm kirin. Berî her tiştî xirabûna ewlekarîyê, ji pirsgirêka şerên di navbera eşîran de, ji heyfhilanîna di navbera mîlîsan de, û ji revandin û kuştina berpirsîyaran wêdetir e.

Seferberkirina sîvîlan

Êrişa bi ser sefîrê emrîkî yê Binxazîyê yek ji çalakîyên ku ji tebaxa 2012ê û vir ve dişibin yên grubên selefîst cihadîst. Armanca van êrişên her diçe baştir tên plan kirin û pêk anîn, rojavayî yan jî xelkê asîmîlebûyî ne –Sefareta Amerîkî, Buroya Netewên Yekbûyî û yên Komîteya Navneteweyî ya Xaça Sor (KNXS), sefîrê Ingilîstanê. Ew li Binxazî û li Misrata pir caran ji berê zêdetir bûn. Şensek e ku van êrişan zêdetir meriv mexdûr nekiribin (li Binxazîyê, yek ji parêzvanên ku ligel sefîrê inglîz bû di gulebarandina li wesaîta wan de hezîrana 2012ê birîndar bû).

Merivên şêx Omar Abderahman, yê di hepsê de-şêxekî misirî ku li Dewletên Yekbûyî yên Amerîka ji ber tevlîbûna xwe di êrişa li dijî World Trade Center di sala 1993yê de girtî ye- xwedî li van operasyonan derketin. Ev kom li rojhilatê Sîrenaîkê (nexasim li Demayê) xwedî bigeheke xurt e.

Şêwazên din ên çalakîyan van mehên dawîyê zêde bûn, armanca wan tirbên pîroz (ziyaret), abîdeyên sofîyan ku li gor selefîstan ortodoksîya îslama rastî bin pê dikin. Mîlîsên selefîst Ansar el-Şarîa (alîgirên şerîetê) yên ku navenda wan li Binxazîyê ye, di van kiryaran de cîh girtin, lê timî xwestin ku li dûrî êrişên li dijî rojavayîyan bimînin. Leşkerên wê ku tecrubeya wan ya şer heye û têra xwe xwedî çek in, hin ji wan tecrûbeya xwe ya pêşî li çîyayên Irak û Afganistanê di salên 2000ê de bi dest xistin, ji destpekê ve tevlî serhildêrên li dijî Qedafî bûn û heta bidestxistina bajarê Sîrtê di tevahîya şeran de cîh girtin. Wan îsal ji nû ve bi navê koma "Mertala Lîbyayê" xwe seferber kir û bi awayekî fermî girêdayîyê Wezareta Parastinê ne; ew şandin Sebha û Kûfrayê da ku dawîyê li tevlîhevîya şerê di navbera Tûbûyan û eşîrên ereb yên herêmî de bînin. Milîsên hezîrana 2012ê vegerîyan Binxazîyê, bi erkên ewlekarîyê li nav bajaran hatin wezîfedar kirin; birêveberîya tedbîrên ewlekarîyê ya ku endamên wê şervanên îslamîst yên kevin in, ev wezîfe da wan. Ev yekîne xwedî rewabûneke şoreşgerî ya bi rastî ne û bi piştgirîya Wezareta Karên Hundir û ya Parastinê yên ku tên ava kirin, tevdigerin.

Heman tişt li Trablûs û li Misratayê jî diqewimin, li wir di navbera hin mîlîsên selefîst û konseyên bilind ên ewlekarîyê yên van bajaran de -ku bi awayekî fermî girêdayîyê Wezareta Hundur in- şer rû didin, lê di rastîyê de ew bi tenê bi fermana mezinên xwe yên endamên tevgera îslamî tevdigerin. Van mehên dawîyê, li navenda bajarên Trîpolî, Binxazî û Zlîtenê gelek bûyerên weke operasyonên xirakirina tirbên pîroz (ziyaretan) û *zawîya*yên sofîyan, bi roj û li ber çavên mîlîsên Konseyên Bilind qewimîn.

Li derveyî bajaran, yan jî li bajarên ku selefîst lê zêde belav nebûne, dema mîlîsên girêdayî Wezareta Hundir nedixwestin bikevin dewrê, xelkê bi çekan tirbên xwe yên pîroz parastin. Ya ku 7ê îlonê li gundê el-Rajma yê qederê pencî kîlometroyan dûrî Binxazîyê ye qewimî ev e, di encama vî şerî de sê kes hatin kuştin û panzdeh meriv birîndar bûn.

Çend rojan berîya vê bûyerê, li bermahîyên vîllaya Romî ya bi navê Sillîn yên bi qasî sed kîlometroyan li rojhilatê Trablûsê ne, dema ku selefîstan dixwest mozaîkên ku weke avahîyên dîrokî hatî qeyd kirin xira bikin, yan jî dema ku li bajarê nêzîkî behrê Sormanê ku li rojavaya paytextê ye, hewl dan ziyaretekê xira bikin, piştî ketina dewre ya xelkê deverê neçar man dev ji operasyonên xwe berdin.

Xisleta sîstema Qedafî hebûna sazîyên fermî yên xwedî hêzeke sînordarkirî bû. Gelo Lîbyaya dema guhertinê ya piştî-Qedafî bi heman rengî tê bi rê ve birin, bi sîstemeke siyasî ya xwedî hêzên dîyar û sînordarkirî? Wezîrên perwerdebûyî lê belê piranîya temenê xwe li derveyî welêt derbas kirin û parlemanterên ji rastîya jîyana herêmî qûtbûyî mehê 9 000 dînar meaş distînin -nêzîkî 6 000 euroyan- û li paytextê li hotelên luks ên pêncstêrkî yên ku heqê wan rojê 250 euro ye dimînin ku ji bo tevahîya salê tên kirê kirin. Lê bi rastî otorîteya wan li ser **sazîyên ku bi bikaranîna qanûnî ya şîdetê** hatin wezîfedar kirin, tuneye. Di vê çarçoveyê de, şefên piçûk ên şerên herêmî, yên komên selefîstan, yên hin yekîneyên Wezareta Karê Hundir û ya Parastinê ku xwedî îdeolojîyeke nêzî ya wan in, û grupên mafyayê yên ku ji bo bazirganîya xwe baş bi pêş bixin sûd ji vê rewşê wergirtin, xwedî berjewendîyeke hevpar in: Çi bi destê wan bê bikin da ku pêşîyê li ber avakirina dewleteke xurt bigirin.

Yê ku herî zêde mexdûr bûyî gelê Lîbyayê ye ku beşdarbûna wî ya xurt a hilbijartinên 7ê hezîranê (% 60ê dengê xwe dabû) (2) hêvî û bawerîya gel bi pêvajoya hilbijartinê anîbû nîşan dida. Bi qasî salekê piştî ji desthilatdarîyê xistina rejîma Qedafî, xirabûna rewşa ewlekarîyê û şertên madî yên jîyanê, tunebûna dewletê û kirinên selefîstan ku piranîya gelê Lîbyayê tevlî îdeolojîya wan nabe, dikin ku êdî gel hêvîyên xwe yên xweşbînîyê ji dest bide. Ango di encamê de tehlûkeya ku nasnameyên herêmî zêdetir radîkal bibin, heye.

Waşîngton zextê li serokwezîrê nû dike da ku ecele bike û bi biryardarî li dijî berpirsîyarên êrişa li dijî sefareta wan tevbigere, lê belê di dema kurt de dîyar e wê tiştek jê neyê. Ew ne xwedîyê yekîneyên eskerî ye yên ku meriv dikare bawerîya xwe bi wan bîne, yên ku herêma çîyayî baş nas dikin. Li wir merivên şêxê girtî Omar Abderahman hene, ew xwe li wir bi pêş dixin; guman ji wan tê kirin ku tevlî erişa li dijî sefaretê bûbin. Îhtîmal heye ku serokwezîr alikarîya wan bi rêya xurtkirina operasyonên wan bike. Tişta herî xirab ku ji bo Lîbyayê dikare biqewime ew e, ku Dewletên Yekbûyî weke li Yemen û li Pakistanê, biryarê bidin kesên guman ji wan tê kirin, bi nîşankirina balafirên bêpîlot bikujin (di axaftina fermî de navê "kuştinên bê dadgeh" li wan tê kirin).

* Kevne dîplomatê fransî li Trablûsê (2001-2004), nivîskarê pirtûka bi navê *Au cœur de la Libye de Kadhafi / Li Lîbyaya Qedafî*, Jean-Claude Lattès, Parîs, 2011.

(1) Berhema li jêr bixwîne: "Scrutin libyen sur fond de chaos" ("Hilbijartinên libyayî li ser hîmê kaosê"), *Le Monde diplomatique*, tîrmeha 2012ê

(2) % 70yê şenîyên ku temenê wan têra dengdanê dikir, ji bo ku dengê xwe bidin xwe qeyd kiribûn.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

Rabûna hêrsê ya ereban

As'ad Abu Khalil *

Balkêş e, protestovanên ereb biryarê didin ku nerazîbûna xwe li ser mijarekê derbibirin, lê li ser mijarên din dernebirin. Hêja ye meriv behsa wê bike ku weşandina karîkatûrên danîmarkî, li paytextên ereb ji dagîrkirina Bexdayê û dewama dagîrkerî û êrişakarîya Îsraîlê bêhtir rê li ber xirecirê vekir. Lê belê dibe ku ravekirina vê yekê mimkin be.

Li Rojhilatê Navîn di navbera hêzên selefî û tevgera jirêûresmê ya Birayên Misilman de pêşbazîyek heye. Li gelek welatan ev pêşbazî têkoşîneke di navbera Erebistana Suûdî û siyasetên derve yên Qetarê de îfade dikin (em vê yekê li Sûrîye, Tûnis û Misrê û li deverên din dibînin). Selefî ji ber sponsorvanîya suûdî xwe ji rahiştina pirsgirêkên mezin ên edaleta civakî, yan dagîrkerîya dewletên bîyanî, yan jî heta bi êrişkarîya îsraîlî didin alî. Heke rahêjin pirsgirêkên ku bi dehan salan weke navenda pirsgirêkên girseyî yên ereb li kar bûn, ew ê fînansmana xwe ya gelekî comerd ji dest bidin. Li şûna vê, ev kom pir dildar in ku pêşengîya mijarên ewle bikin yên ku elaqedarî parastina Îslamê, pêxember û fezîletên li gor exlaqê wan ê gelekî pîvan hişk in. Ji bo wan karîkatûrên danîmarkî ji dagîrkirina Filistînê bi gelekî êrişkartir in. Ew bi xurtkirina pîvanên herî hişk ên exlaqî re bûn yek, nexasim jî dema wan Birayên Misilman bi pragmatîzma siyasî û sistbûna exlaqî gunehbar kir.

Lê belê hikûmetên ereb û çapemenîya wan jî bûn şampîyonên protestoyên ereb dema ku ev protesto li dijî êrişkarên li dijî Îslamê bûn. Weke mînak Aljazeerayê û seydayê wê yê xwecihî Yûsif el-Qerdawî bi awayekî zelal li ser vê mijarê nav di sebra raya giştî da, nexasim dema ku têkilîyên Qetarê bi DYAyê re aloz bûn. Meriv dikare bi awayekî zelal bibîne ku vê carê Aljazeera û çapemenîya suûdî bêhtir bi tedbîr nêzîk bûn, qismî ji ber ku ditirsîyan tevgerên kolanan dibe ku ji destê wan derkevin û qismî jî ji bo ku nekevin ber xezeba DYAyê. El-Qerdawî daxuyanîyeke bi tedbîr da ku li beramber DYAyê têra xwe lihevker bû: Lê belê vê yekê tu kes matmayî nehişt, lewra ew bi belge bû seydayê fermî ji bo xanedana desthilatdar a qeterî, û wî ev yek piştrast kir.

Rejîmên ereb –ên ku têkelhevîyên cihê yên rêxistinên îslamî fînanse û çekdar kirin– di rewşeke zehmet de ne. Li alîyekî ew dixwazin weke parêzvanên bawerîyê li hember êriş û heqaretên rojavayî derkevin pêş, li alîyê din hewl didin ku DYAyê nekin dijmin. Rejîm û yên girêdayî wan dixwazin bibin şampîyonên wan dozan ku ne şert e êrişî DYAyê bikin, lê belê hefsar ji destê wan derket. Ev rave dike ka çima Erebistana Suûdî, Qetar û çapemenîya wan ev temaşe organîze kirin: Ew ditirsîyan ku ew ê bibe sedema alozbûna têkîlîyên wan bi DYAyê re.

Lê belê tiştek heye der barê van temaşeyan de ku beşek ji şêwazên siyasî yên çalakîyan e li cem erebên îslamîst: Ji bo demeke dirêj, nexasim dema dibin desthilatdar –yan jî nêzî desthilatdarîyê dibin– ew hez dikin hin dozan di destê xwe de bigirin, ên ku li gor wan illeh jî nabin sedema xirakirina têkilîyên wan bi rejîmên desthilatdar re, yan jî têkilîyên wan ên navneteweyî. Êdî dîyar bûye ku êrişên li dijî Îslamê dibin sedema nerazîbûnên dijwar ên îslamîstan: Îslamîstên cihêreng wisa hîs dikin ku divê bersivekê bidin, yan na ew ê hêza xwe ji dest bidin.

Pirsgirêkên pir girîng ên li hemberî gelê ereb hene: Bêdadîya civakî, dagîrkerîya bîyanî, şer, tîranî, newekhevîya cinsan, lê ji ber hin sedeman, îslamîstên modern difikirin ku ev mijar bi qasî nerazîbûna ji filmekî bêqîmet ê li ser Înternetê ne girîngtir in.

* Anîmatorê bloga Angry Arab, http://angryarab.blogspot.com

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

Ilter Rezan: **Ji rêzewêneyên merivan**, teknîka tevlihev

www.arsivakurd.org

Dîrok: Hêzên Çekdarî yên Şoreşger ên Kolombîyayê (FARC) û hikûmeta Juan Manuel Santos piştî dîyalogeke bi dizî pêkhatî, ji 8ê çirîya pêşî û pê ve destpêka hevdîtinên aştîyê li Osloyê ragihandin. Ji salan û vir ve ev yekem car bû ku weha xuya ye têra xwe hêman hatine cem hev ji bo ku ev hevdîtin bi ser kevin. Nexasim jî li asta herî jor a dewletê.

DI NAVBERA GERÎLA Û DESTHILATDARÎYÊ DE HEVDÎTIN

Ji bo çi Kolombîya dikare ji aştîyê bawer bike?

GREGORY WILPERT *

Piştî 50 salên şerê navxweyî û bêhed zêde gerên danûstandinên aştîyê yên têkçûyî, li Kolombîyayê hikûmetê û yek ji hêzên sereke yên serhildayan, FARCê, li vê dawîyê biryar da ku careke din ji bo aştîyê hewl bidin. Serokê Kolombîyayê Juan Manuel Santos ragihand ku hikûmeta wî dê ji nû ve dest bi danûstandinên aştîyê bike û hikûmetên Venezuela, Şîlî, Norwec û Kûbayê jî dê navberîyê bikin. Li pêşîyê di bin rêberîya Serok Uribe de û bi dû re li bin rêberîya wezîrê berevanîyê yê hikûmeta Uribe, Kolombîyayê bi salan bêrawestan şerê serhildayan kir, vêca çima ew niha ji nişkê ve wê siyaseta xwe diguhere û dest bi danûstandinên aştîyê dike?

Bi kêmî ve du sebebên ku li vê dawîyê rû dane hatine ser hev û vê ji aştîyê re dikin demeke xweş. Sebeba yekem, her du alî jî dîsa tê gihiştine ku ew ê nikaribin di wî şerî de bi ser kevin. Serhildayan di dema serokatîya Uribe de (2002-2010) gelek derb xwarin, lê ji sala 2008ê û vir de wan refên xwe rêk û pêk kirine û dîsa hinekê xurt bûne. FARCê gelek rêberên xwe yên payebilind li vê dawîyê di kozikên leşkerê Kolombîyayê de ji dest dabin jî, wê komelê di van çar salan de karîye ku bi mayînan, nîşangir û êrişên bi bombeyan yên li ser xizmetan bingehîn, şerê li dijî leşkerê Kolombîyayê xurt bike. Li gor agahîyên ji raporeke dawî ya Kongreya Kolombîyayê, di sala 2011ê de li sêyeka belediyeyên wî welatî, FARC bûbû xwedîya hêzeke mezin. (1)

Li alîyê din, leşkerê Kolombîyayê jî bêtir êrişên komandowarî kirine û bêtir destkîsên xwe xistine nav refên gerîlayan. Ji ber wan taktîkên nû yên her du alîyan, şer ne wekî berî deh salan pêşçav e, lê tesîra wî li ser gelî xurttir û belavtir bûye. (2) Anku, careke din, ne alîyek bi ser dikeve, ne jî alîyê din.

Duwemîn sebebê ku rewşa li Kolombîyayê ber bi danûstandinên aştîyê ve diguhere, cudahîya binyatê Santos ji yê serokê pêşîya wî Alvaro Uribe ye. Uribe pisaxa bû, ji olîgarşîya axayan bû. Piştî ku bavê wî di sala 1983yê de, dema ku gerîlayên FARCê dixwest ku wî birevînin bi destê wan hat kuştin, Uribe mal û milkê malbata xwe firot û ji hingê pê de di nav siyasetê de ye, lê têkilîyên xwe bi wî binyatê xwe yê axatîyê qut nekirine.

Uribe nûnerîya berjewendîyên axayên mezin ên Kolombîyayê dikir, lê her wisa şik û guman jê dibirin ku ew bi cerdekarên beng û narkotîkê yên bi nav û dengê xirab û hêzên nîvleşkerî re peywendîdar bû. Wek nimûne, di raporeke sala 1991ê ya Dezgehê Agahîyên Nepenî yê Wezareta Berevanîyê (DIA) ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkî (DYA) de dihat gotin ku Uribe ji bo koma bi navê *«Medellin Cartel»* dixebite -Ew ji xelkê bajarê Medellinê ye û demekê serokatîya belediyeya wî bajarî kiribû û "hevalekî nêzîk ê Pablo Escobar" bû. (3)

Di nav elîtan de qutbûn

Her wisa, li destpêka salên 1980yê, dema ku Uribe birêveberê trafîka hewayî ya sîvîl a Kolombîyayê bû, hejmara destûrên ji bo balafirgeh û balafiran pir zêde bû. Virginia Vallejo, ku yara Escobar bû, di sala 2007ê de ji rojnameya *El Pais* a Îspanyayê re got, "Pablo berê digot,'Heke ne bi xêra serê wî lawikê xwedêjêrazî [Uribe] bûya, em ê naçar bûbûna ku xwe bi ajnêberîyê bigihînin Miamiyê ku dermanên bêhişkirinê ji gringoyan [Amerîkîyan] re bibin'". (4)

Bêguman Uribe her tim ew îdîa û sucbarkirin red kirine, lê aşkera ye ku ew û malbata wî, hevalbendên nêzîk ên komên nîvleşkerî û qaçaxçîyên dermanên bêhişkirinê yên Kolombîyayê ne. Bo nimûne, ne tesaduf bû ku Jorge Noguera, ku birêveberê berê yê bizava hilbijartinan a Uribe bû û ku serokatîya dezgehê Agahîyên Nepenî yên Navxweyî yê Kolombîyayê (DAS) kiribû, di meha îlonê ya 2011ê de bi 25 salên zindanê hat hikûm kirin ji ber ku wî agahî dabûn koma nîvleşkerî AUCyê û rê dabû wê ku bikeve nav wî dezgehê agahîyên nepenî yê dewletê.

Uribe bi aşkerayî qebûl kiriye ku ew şerê navxweyî yê welatê wî ji ber newekhevîyê bû, lê wî digot ku bi tenê heke aştî pêk were ew ê bikaribin wê pirsa newekhevîyê çareser bikin. Uribe di sala 2004ê de ji BBCyê re got, «Heke aştî nebe, sermaye jî nabe. Bêyî sermayeyê, dê tu çavkanîyên diravî yên hikûmetê nebin ku ji bo xweşkirina jîyana gelî bimezêxe». Ew bêguman nîşana xemsarîya wî li hember rêbazên jinûveparvekirinê wekî reforma erdî û her wisa ya wê siyaseta wî bû ku rêbazên neolîberal datînan pêşîyê.

Ew di sala 2002yê de ji partîya xwe, Partîya Lîberal, veqetîya û bû namzedê serbixwe yê serokatîyê, hema hew ji ber ku ew ji berbijarê Partîya Lîberal Horacio Serpa nerazî bû ku piştgirîya gera nû ya danûstandinên aştîyê dikir. Paşê Uribe ji bo bizava xwe ya jinûvehilbijartinê ya sala 2006ê partîya bi navê "*Partido de la U*" (Partîya Civakî ji bo Yekîtîya Neteweyî) damezirand û pê re sîstema bi du partîyan, a ku Kolombîya bi demeke ji sed salan dirêjtir pê hatibû bi rê ve birin, ji nav bir.

Şertê pêşîn ê Uribe ji bo pêkanîna danûstandinên aştîyê ew bû ku serhildar çekên xwe deynin, lê ew şert ji bo du komên gerîlayan yên Kolombîyayê yekcar ne cîhê qebûlê bû, bi taybetî ji ber dijwarîya leşkerê Kolombîyayê û komelên nîvleşkerî yên wî welatî.

Loma, bi tenê axaftina di navbera Uribe û gerîlayan de, axaftina ji bo berdana rehîneyan bû. Hinek ji wan bizavan bi ser ketin, lê para bêtir bi saya xebata Senator Piedad Cordoba û ya Serokê Venezuelayê Chávez ku Uribe demekê ji bo wan têkilîyan destûr dabû wan.

Di 20 salên berî serokatîya Uribe de, Kolombîyayê sê caran, di navbera 1982 û 1985ê de, di navbera 1990-92yê de û di navbera 1999-2002yê de hewl dabû ku dest bi danûstandinên aştîyê bike, lê tu ji wan caran gelek pêşveçûn nebû. Ew bizav têk çûn ji ber ku her du alî jî tund bûn û bawerîya wan bi hevûdu nedihat. Gera dawîyê bi ser neket ji ber ku ne DYAyê (ku divîya bi «Nexşeya Kolombîyayê », qaçaxçîyên beng û narkotîkê ji xwe re bikirana armanc, lê li şûna wê, bala xwe da ser serhildayan), ne jî koma bijare ya Kolombîyayê bi wan danûstandinan re bû.

Li Kolombîyayê kesên ji Santos bêtir tev li koma bijareyên siyaset û aborîya wî welatî pir kêm in. Pismamê bapîrê wî Eduardo Santos ji sala 1938ê heta sala 1942yê serokatîya Kolombîyayê kir. Pismamê wî bixwe di dema serokatîya Urîbe de cîhgirê serokî bû. Li Kolombîyayê bi tenê rojnameyeke neteweyî hebû û ew rojnameya bi navê *El Tiempo* çaryeka sedsalê di destê malbata Santos de bû û nîvîya wê demê jî, edîtorê rojnameyê bavê wî bû. Santos bixwe para bêtir li derveyî Kolombîyayê hatiye perwerde kirin, wî li zanîngeha Kansasê, li Zanîngeha Harvardê û Zanîngeha Tuftsê (DYA) û li Xwendingeha Aborîyê ya Londonê xwendiye. Santos yekem karê hikûmetê di 20 salîya xwe de wergirt û di Rêkxistina Navneteweyî ya Hilberînerên Qehweyê ya li Londonê de bû nûnerê Kolombîyayê. Ji sala 1991ê û vir de ew bi jimareke karên giring ên hikûmetê rabûye. Ew wezîrê bazirganîya navneteweyî bû, paşê bû wezîrê karûbarên darayî û li dawîyê, di dema serokatîya Uribe de jî, wezîrê berevanîyê bû.

Lê bi hilbijartina Juan Manuel Santos a di meha hezîrana 2010ê de, ne ber bi çav be jî, guhartineke giring pêk hat. Şûna berjewendîyên axayan Kolombîyayê, bala Santos li ser nûnerîya komeke bijare ya bajarî, kozmopolît û navneteweyî ye û dixwaze berjewendîyên sermayeya navneteweyî ya ji Kolombîyayê biparêze. Îcar, parastina mafên axayên dewlemend, an hêzên nîvleşkerî yên bi wan re, ne xema Santos e. Li şûna wê, armanca wî ragirtina berjewendîyên bi piştevanîya hêzên nîvleşkerî yên nûdîtî ye û ew dixwaze Kolombîyayê bêhtir nêzîkî pêvajoya bihevregirêdayîna welatên Amerîkaya Latîn bike.

Ji rêbazên jinûveparvekirinê, wek reforma erdî, gelek kêm zîyan dê bigihije wê koma bi sermayeya navneteweyî ya ku Santos nûnerîya wê dike, loma di hezîrana sala 2011yê de wî qanûneke pir giring mor kir ku erdê 2 mîlyon kolombîyan, yên ku di wan 25 salên berê de ji ber şerê navxweyî hatibûn bêcihûwar kirin, li wan vegerîne.

Berevajî Santos, Uribe dixwaze paşeroja Kolombîyayê bêtir bi ya DYAyê ve girê bide û jixwe ew yek ji peymana bazirganîya di navbera Kolombîya û DYAyê de jî xuya ye ku wî kiribû yek ji armancên sereke yên serokatîya xwe. Lê çi berfirehkirina bazara hevbeş a Mercusorê be, çi afirandina navendên nû yên wek Yekîtîya Welatên Amerîkaya Başûr (UNASOR) an Koma Dewletên Amerîkaya Latîn û Karayîbê (CELAC) be, ji bizavên berdewam ên ji bo bihevregirêdana welatên Amerîkaya Latîn zelal e ku hêz û tesîra DYAyê li wê herêmê kêm dibe. (7)

Navbênkarîya Şîlî û Venezûelayê

Cudahîyeke din a di navbera Santos û Uribe de ew e ku Santos ji destpêka serokatîya xwe de, bi zanîn, ji bilî koma çepgir Partîya Bijara Demokratîk, endamên hemû partîyên siyasî di hikûmeta xwe de kirin wezîr ku wê dubendîya di nav siyaseta Kolombîyayê de ji holê rake, lê meyla Uribe bêtir li ser afirandina dubendîyên siyasî bû.

Gava ku Uribe pê hesîya ku Santos li ser rêyeke nû, ber bi kêmkirina dubendîyên li nav Kolombîyayê ve diçe, ew li Santos sor bû û bû dijberê wî yê herî bi gef û gur. Wek nimûne, gava ku Santos dijberekî Uribe wek wezîrê kar dest nîşan kir, Uribe heçku xiyanet lê hatibe kirin axivî û got ew biryar «dûrûyane» ye û «nîşana neyarîya li hember Uribismê» ye. (8)

Di rastîyê de, ew dubendîya di navbera Uribe û Santos de, wek a di nav hikûmeta hevalbend a dema berê de ye. Di dema serokatîya Uribe de, koma bijare ya sermayeya navneteweyî hevkarî bi koma axayên Kolombîyayê re dikir. Niha ew hevalbendî nemaye. Lê hinek rêbaz hatibine guhertin jî, gelek ji wan her wekî xwe ne, bi taybetî rêbaza ku berê Kolombîyayê dide aborîya neolîberal.

Di teorîyê de, ew nakokîya di nav hevbendîya berê de ne bi xêra danûstandinên aştîyê ye, ji ber ku divê hemû alî di bizava aştîyê de beşdar bin, nexasma heke yek ji babetên wan axaftinan derbarê reforma erdî de be ku yekser tesîrê li yek ji beşdarên wê hevalbendîya berê dike. Lê belê, dibe ku bi mebesta çareserkirina vê pirsgirêkê, Santos du generalên teqawid (jikarnişîyayî) yên tundrê kirin endamên desteya danûstandinan. Olîgarşîya axayan a Uribe ne bi bizava aştîyê re ye, lê gelek kardarên din ên kolombî piştevanîyê lê dikin û dibe ku ew, valatîya ji axayan dagirin. Li gor encamên lêkolîneke dawîyê ya rêxistina bi navê «Bingehê Ramanên ji bo Aştîyê», «Piranîya rêberên kardarîyê bawer dikin ku ihtîmala herî zêde û encama herî bêtir daxwazkirî ya şerê çekdar ê li Kolombîyayê, danûstandin in». (9)

Sebebên din ku ev gera danûstandinan ne wek yên berê be û vê carê bi ser bikeve ew e ku yên berê hertim di bin sîya kêşe û pevçûnên cîhanî de bûn. Li salên 1980yê Cenga Sar, li salên 1990ê şerê li dijî cerdekarên narkotîkê, li destpêka salên 2000ê jî şerê li dijî terorê hebû. Niha ji ber ku ew her sê «şer» jî -qenebe li Kolombîyayê – sist dibin û pê re tesîra DYAyê jî kêm dibe, ku her tim ew şer gur kiribûn, bi rastî şansek heye ku alîyên şerê Kolombîyayê li hev bikin.

Ji ber sebebeke din, şansa danûstandinên vê carê zêdetir e: Serokên Venezuela û Şîlîyê dê di nav wê pêvajoyê de bin. Ew her du serok hem nûnerîya baskê din ê siyasî dikin, û hem jî ew ji herêma Amerîkaya Latîn in, loma îhtîmal zêde ye ku alîyên şerî dê guhdarîya wan bikin. Meriv dikare nemaze derbarê Serok Chávez de wisa bibêje ji ber ku ew her tim bi alîgirîya FARCê hatiye gunehbar kirin. Lê Chávez her wisa bi tundî li dijî stratejîya şerî ya FARCê ye, ji ber gelek encamên wan ên nerênî yên giran ji bo Venezuelayê, bi mîlyonan penaberên kolombî, û nearamkirina herêma sînorî ya Venezuelayê.

Li dawîyê, ji ber ku rawestandina şerî ne şerteke danûstandinan e, şikandina peymana rawestandina şerî nikare vê carê danûstandinan têxe xeterê. Di dema danûstandinên berî niha de, kiryarên leşkerî yên her du alîyan dibûn hincet ji bo rawestandina wan û bêbawerîya her du alîyan ji hev dişkand.

Bi kurtî, tevî ku veguhestina desthilatê ji Uribe bo Santos guhartineke biçûk be, ji komeke bijare ya kolombî ji bo yeka din, lê dîsa jî, dibe ku ew guhartina biçûk rê bide encameke mezin ji bo Kolombîyayê: Wî şerê nêzîkî 50 salan bi dawî bîne.

* Gregory Wilpert li Brooklyn Collegeê mamosteyê zanyarîyên siyasî ye û nivîskarê pirtûka bi navê «Guhartina Venezuelayê bi Standina Desthilatê: Dîrok û rêbazên hikûmeta Chávez» e (Weşanxaneya «Verso Books», 2007)

(1) El Espectador, "Alertan que más de 330 municipios tienen fuerte presencia de las Farc," (Hişdarî ku FARC li 330 belediyeyan xurt e) 28 nîsan 2011 (elespectador.com)

(2) Zelik, Raul, "Kolumbien: Bewaffneter Konflikt und Indigene Autonomie," (Kolombîya: Şerê çekdar û Xweserîya Xwecihîyan) *Standpunkte International*, 6/2012, Rosa-Luxemburg-Stiftung

(3) National Security Archive, "U.S. Intelligence Listed Colombian President Uribe Among 'Important Colombian Narco-Traffickers' In 1991," (Arşîva Parastina Niştimanî : «Istixbarata DYAyê navê Serok Uribe danî nav 'Qaçaxçîyên Sereke yên Narkotîkê yên Kolombîyayê' Tebax 2, 2004 (http://www.gwu.edu/~nsarchiv)

(4) Luis Hernández Navarro, "Álvaro Uribe, señor de las sombras y Los Pinos," («Álvaro Uribe*, Axayê sîberan û Los Pinosê) La Jornada*, adar 18, 2008 (http://www.jornada.unam.mx/)

(5) BBC, "Uribe defends security policies," (Uribe berevanîya rêbazên parastinê dike), 18 çirîya paşîn, 2004 (news.bbc.co.uk)

(6) Colombia Reports, "Santos signs 'historic' Victims' law," (Santos qanûna 'dîrokî' ya belengazan mor dike), 11 hezîran 2011 (colombiareports.com)

(7) Lê binêre: Alex Main, "CELAC: Speaking for Latin America and the Caribbean," (CELAC: Peyvîna Li ser Navê Amerîkaya Latîn) Center for Economic and Policy Research, 6 kanûna pêşîn 2011 (www.cepr.net)

(8) Colombia Reports, "Tensions between Uribe and Santos rise," (Girjîya di navbera Uribe û Santos de zêde dibe), 1 çirîya paşîn 2011 (colombiareports.com)

(9) Fundación Ideas para la Paz, "Líderes empresariales hablan de la paz con las FARC," (Rêberên kardarîyê qala aştîya bi FARCê re dikin) Tebax, 2012 (www.ideaspaz.org)

Wergera ji îngîlîzî: Bêrîvan Kilic Tugan

Dema ku Alvaro Uribe kardêrên kolombî bêzar dikir

LOÏC RAMIREZ *

«*Bi dîtina te, ma tiştekî maqûl e ku em her şev li ser Radio Canal Nationalê (Radyoya Kanala Neteweyî, kanaleke televîzyonê ya dewletê ya Kolombîyayê ye), derheqê serokê welatekî cîran de bipeyivin? Chàvez wisa kir, Chàvez wiha kir… Ma çi bi serê me ketiye, çi karê me pê heye? Vêca, di dema serokatîya Uribe de rewş wisa bû!*» Xwedîyê wan gotinan, «şkestin» ji me re şirove dikir, têkçûna têkilîyên Kolombîya û Venezuelayê ku rê da Juan Manuel Santos ku bibe serok (gelek kesan hizir dikir ku ew berdewamîya dema Alvaro Uribe ye, ji ber ku Santos wezîrê berevanîyê yê hikûmeta Uribe bû). «*Ji hilbijartina Santos û vir de, dezgehên ragihandinê êdî çi qala Venezuelayê nakin. Vêca mirov êdî ji pirsgirêkan tên agahdar kirin, wek li vê derê hejar hene, têra xwe av nîne, û hwd. Bi kurtî, pirsgirêkên me yên giran hene». Ev sohbeta di dema vexwarina qehweyeke xweş de, ne li navenda giştî ya partîyeke çep a kolombî bû, lê li ofîseke rehet (a ku pîçekê bi heyranîya Bolîvyayê hatî raxistin) a Navenda Bazirganîyê ya Kolombîyayê bû.*

Ji bilî soza ji bo herişandina gerîlayan, Uribe di sala 2002yê de, bi mehkûmkirina tund a siyaseta cîranê xwe yê venezuelayî hatibû ser desthilatê. Ew girjîya di nav her du welatan de di adara 2008ê de gihişte asta herî bilind, dema ku balafirên kolombî bombe li kampeke berwext a gerîlayên FARCê a li ser erdê Ekwatorê barandin. (1) Chávez gef xwarin û got ku ew «*casus belli*» (sedema şerî) ye, balyozê kolombî ji Venezuelayê derxist û sînorê bi wî welatê cîran re daxist. Gelek pê de neçû, tesîra wê biryarê li ser danûstandinên bazirganîyê rû da.

Venezuela hevkareke giring a şirketên kolombî ye: Di sala 2007ê de, %17 ji malê ku Kolombîyayê difirot welatên din, ji Venezuelayê re dihat şandin (Bi % 35ê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkî bikira sereke bû). Piştî wê kêşeya dîplomatîk, bazirganîya bi Venezuelayê re di sala 2010ê de bi giştî % 4 kêm bû. Ew bazirganî di sala 2008ê de ji 2,6 mîlyar dolaran zêdetir bû, lê 2010ê ji 800 mîlyon dolaran jî kêmtir bû. Ew kesê çavkanîyê me yê li Navenda Bazirganîyê dibêje: «*Hinek nûnerên bazirganên kolombî, ku qet ne alîgirên siyaseta Chávez bûn, gilî û gazin ji wê pevçûna di navbera Kolombîya û Venezuelayê de kirin: Karsaz û bazirganên kolombî dizanîn ku wê rêbaza berê ya Chávez hêza kirînê ya beşekî mezin ê gelî zêde kiribû û wan nedixwest dest ji bazareke wisa berdin».*

Di dema derbeya leşkerê Venezuelayê ya meha nîsana 2002yê de, Santos (ku wezîrê karûbarên darayî bû) got bêguman serokê derbeyê Pedro Carmona dê bibe «hevkarekî bêkêmasî di warê bazirganî û aborîyê de». (2) Ew heman Santos bû ku bi dû re, di dema seredana Kubayê de, rewşa tendirustîya «hevalê» xwe yê nû, Hugo Chávez, ku ji ber pencaşêrê li Havanaya paytext sexbêrî lê dihat kirin, ji dunyayê re radigihand. (3) Îcar, xuya ye ku bazirganîyê jî, awa û rêbazên wê hene, ku haya Uribe ji wan nebû…

* Rojnamevan

(1) Bixwîne, Maurice Lemoine, «La Colombie, Interpol et la cyberguérillero (Kolombîya, Înterpol û gerîlayên li ser înternetê)», *Le Monde diplomatique*, tîrmeh 2008.

(2) « Roces con Venezuela », (Kêşeya bi Venezuelayê re), *El Tiempo,* Bogotá, 16 nîsan 2002.

(3) « Santos en Cuba: la Cumbre de las Américas y la salud de Chávez» (Santos li Kubayê: Civîna bilind a welatên Amerîkayê û tendirustîya Chávez), 8 adar 2012, observadorglobal.com.

Wergera ji îngîlîzî: Bêrîvan Kilic Tugan

ILTER REZAN: **Ji rêzewêneyên merivan**, teknîka tevlihev

ILTER REZAN: **Ji rêzewêneyên merivan**, teknîka tevlihev

ILTER REZAN: **Ji rêzewêneyên merivan**, teknîka tevlihev

Komkujîya Marikana ya 16ê tebaxa derbasbûyî, meriv ji sînorên Başûrê Afrîkayê û wê de şok kirin. Ji sala 1994ê ango ji destpêka rejîma demokratîk ve ev cara yekem bû ku polêsan bi armanca kuştinê gule li xwepêşanderan reşandin. Bi rastî çi qewimî? Û çawa çêbû ku vê teqîna hovane û ecêb karîbû li bîst û heşt kîlometroyan dûrî paytextê rû bide?

LI AFRÎKAYA BAŞÛR TEPISANDINA KARKERÊN KANAN ÊN DI GREVÊ DE

Komkujîyek weke di serdema Apartheid de

GREG MARINOVICH *

Netewe û piştre jî dinya li hezaran meriv temaşe kir ên ku cil û bergên eşîrî li wan bûn û stranên şer digotin, polêsên hêzên bilez û komên bersiva taktîk ên polês dor li wan girtibû. Bi hezaran meriv serê zinarê volkanîk ên bi rengê porteqalî girtibû, dişibîyan yek organîzmayê, dirijîyan ser bejahîya histirîyan a li jêr.

Heşt zilam û du jin berîya hingê nêzî vê devera tehkîm a cografya xerîb hatibûn kuştin. Di navbera van karkerên kanan û karbidestên wan ên pirneteweyî de şidet bi eşkereyî xwe dide der, şirketa platînê ya dêw Lonminê tu nîşanên paşvegavavêtinê nedan. Bûyera kilîd ji bo tiştê ku piştre wê biqewimîya ew bû, du polês di şerê bi karkerên kanan re hatibûn kuştin.

Polêsên Desttêwerdana Alozîyên Civakî dor li girê Mûcîzeyan – Wonderkop– girtibû û pê re bêhtirî dûzîneyek wasaîtên zirîpoş ên bi navê Nyala jî hebûn. Li jêra rêya rûtîn a ber bi gundê karkerên kanan Marîkana ve diçe bêhtirî du sed polêsên koma bersiva taktîk û yên ser bi şirketa taybet a ewlekarîyê ve xwarina xwe ji qûtîyên plastîk dixwarin. Hinên din qûtîyên hatî bikaranîn diavêtin erdê û bêyî ku dinya xema wan be, bi dirîyên zuha de dimîstin, ev rîtuela destpêkê ya berîya şerî dema meriv li ber êlegê wan ê gule têre nabihurin û çekên wan digire, dikir ku ew bêkêr xuya bikin.

Wisa xuya bû ku berhema dewleteke îndustrî-teknîkî li dijî zilamên weke ku ji xeweke dirêj a bi sedan salan hişyar bûbin, li ber şerî bû.

Hinan ji zilamên li ser girî rahiştibûn plakartên ku hema hema ne mimkin e meriv tê derxe nîşanên li ser wan çi ne. Hinên din bi hev re tevdigerîyan, dengê rîtmîk ê lihevketina metalan dengên wan ên kûr ên ku radihiştin stranekê qut dikir. Zilamek ji nav geremoleke zilamên stran digotin derket, weha dîyar bû ku wê cixareyekê bixwaze. Yekî din jî hat cem wî û em li ser wan û doza wan peyivîn.

Ew xişabvan, *malaishas* (bêrvan) û *chisaboy* (alîkarê mufetişên teqemenîyan) bûn. Ya rastî ew ji nav ûr û doranên dinyayê derketibûn; ew ji wan zilaman bûn ku li ser kevir û latên dûxan ji wan diçe yên kûr di binê erdê de kar dikin. Ew ên ku ji bo bidestxistina çend graman ji metalê mûcîzewî ango platînê derbixin, dixebitin.

Tevahîya karkerên bîran ên şirketa dêw a kanan Lonmin Marikanayê di grevê de bûn, ji bo sempatîya bi karkerên destheqê herî kêm distandin -ango ji bo wan ên ku li ser lat û zinaran dixebitin. Daxwazen wan hêsan bûn: Wan dixwest ku mûçeyê herî kêm were zêde kirin û bibe mehê 12500 R (dike nêzî 1400 dolarên amerîkî).

Xişabvanên lat û zinaran banga grevê kiribû, li gor îdîaya wan piştî ku têra xwe dema birêveberîya şirketê hebû û dîsa jî nehat civînan da ku daxwazên wan ên heqdestan nîqaş bikin.

Heqdestê safî yê xişabvanan piştî ku bonus û qutkirinên din jê tên birîn, di navbera 4350 Ryî û 5100 Ryî de bû. Meriv matmayî namîne dema dibîne ku birêveberîya kanê li ber xwe da ji bo ku van daxwazan qebûl neke, bi ser de jî ew bi peymaneke li ser heqdestan ve jî girêdayî bûn a ku bi nûnerên sendîkayan re hatibû mohr kirin û heta sala bê jî wê di merîyetê de bûya.

Bêguman ev qada hevdîtinan a sendîkayê bû, Sendîkaya Neteweyî ya Karkerên Kanan (NUM) ku bixwe mezintirîn û girîngtirîn sendîka ye di nav federasyona COSATU de. Tevî ku gelek ji karkerên kanan endamên fermî yên NUMê jî bûn, ji NUMê nehat nûnerîya wan bike.

Ji ber vê jî dema rayedarên NUMê bi wesaîtên zirx-polayî yên polêsan birin wî girî, pir eşkere bû ku karkerên kanan nedixwestin bi wan re bipeyivin jî. Wan israr kir ji bo ku yekser bi birêveberîya kanê re bipeyivin.

Dema ku Birêveberê Giştî yê Lonminê li nexweşxaneyê li ber mirinê bû û dixwest ji mirinê bifilite, wisa xuya bû ku birêveberên kanê bi awayekî kolektîf felc bûne yan jî bi nexweşîya serhişkîyê ketine. Yekî bi tenê jî têra xwe wêrek nebû ku derkeve û bi karkerên xwe re bipeyive.

Rîtûelên ji bo ku gule veguherin avê

Êdî pêdivîya Lonminê bi tebaxeke baş hebû da ku hilberîna pêwîst ji bo qewlê xwe yê nêzîk dibû pêk bînin di bazarekê de ku paşveçûna aborî ya global qîmetê platînê kêm kir –û buhayê hiseyên wan bi carekê kêm bû û ew jî bû bar li ser grevê.

Dema ku rayedarên sendîkayan bi wesaîtên zirîpoş di bin bendeke heqaretan de vekişîyan hingê roj diçû ava, hewayekî mij û tozê li ser dirî û devîyên zuwa weke kefenekî daleqandî bû; pirs ev e çawa çêbû ku her tişt evqasî xirab û berbad bû?

Ka em li vir gava xwe ber bi paş ve biavêjin. Operatorên xişabên lat û zinaran dikolin, banga grevê kir. Ev ew zilam in ku li jêr li ser lat û zinaran kar dikin, neçar in bi xişabekê kar bikin ku giranîya wê 25 kîlogram e, weke dînan direele, û ev jî di tevahîya mesaîya heşt saetan de diqewime. Ew nikarin bi tevahî rabin ser xwe û ew xişaba mezin ber bi latên hişk ve didewisînin. Heke lat bikevin, yan jî bigindirin yên ku dibin mexdûr ên ku tilîyên xwe yan jî jîyana xwe ji dest didin xişabvan in. Ev tiştê herî bi tehlûke ye di vî karî de. Û zilamên ku di kanan de kar dikin li dinyayeke zahmet jêreçandeke maçotîyê ne. Ew xwe weke zilamên di nav zilaman de dibînin.

Lê bifikirin meriv ji bo 4000 Ryan kar dike, ji bo vê jî canê xwe li kûrahîya binê erdê dixe tehlûkê ji bo metalekê, metala dihêle erebeyên ku wê qet ji we neyê hûn wan bikirin, cegerên şênîyên bajarên ku wê tu cara pereyên we têrê nekin hûn lê bijîn, qirêj nekin. Tilîyên we yên şêrîn ên mucewheran ên qet kar nekirî; niha jî hemin bin ku rojekê cegerên we wê bi nexweşîya sîlîkozê bikevin, ev jî wê bedena we ya xurt berîya dema xwe ji taqet bixe.

Di ser vejîna Başûrê Afrîkayê ya demokratîk re hijdeh sal derbas bûn, dîmenên xwînrij ên ku tê de polês guleyan li protestovanan direşînin dîsa di rojeva guftûgoyên raya giştî de serdest in. Ev ji wan dîmenan in ku piştî Nelson Mandela bû yekemîn serokdewletê welêt ê piştî serdema Apartheidê xelk qet ne li bendê bû, bibîne. Sedema vê çi ye û ya ji vê girîngtir ev kêlîya ku werçerxek e wê ber bi ku ve here?

Koma ceribandinan a Bertrand Russell a bi navê "In Praise of Idleness (Ji bo pesindayîna betalîyê)" mentiqê karê me bi zelalî derdibire: "Berîya her tiştî kar çi ye? Du rengên kar hene: Yê pêşî guhertina cihê madeyên nêzî ser rûyê erdê nisbet bi madeyên din ên bi heman rengî; yê duyem ew e ku meriv ji merivan re bibêje vî karî bikin. Yê pêşî nexweş e û destheqê wê pir kêm e; yê duyem xweş e û destheqê wê jî pir baş e."

Wan weha his kir ku birêveberîya kanan a ku xwe li wan ker kir û reda nûnerîya wan a rayedarên sendîkayî yên ku wan bixwe hilbijartî heqaret li wan kiriye û ew piçûk xistine.

Kesekî ji nav karê kanan ê ku sektora platînê baş nas dike li ser rewşe, li ser zêhniyeta xişabvanan hizirî, "ez endamê sendîkayekê jî bim, ew kêm nûnerîya pêdivîyên min dikin.

Fikarên min bi rengekî guncaw û têra xwe nayên bilêvkirin, û tu bandora ez bikim nîne. Biryarên tên dayîn weke ku qet bi kêrî min neyên dîyar in."

"Ez misêwa rastî şidetê têm; û ez divê di bin şideta subjektîf de bixebitim. Tevî hêza xwe jî ez bêtaqet û lawaz im".

Û bi vî awayî dewreke bi me nas dest pê dike "heke me ev karê qirêj nekirana, gelo hinekê din ên ku mûçeyên baştir distînin ên di girêdanên karkerîya kanan de bikarîyana karên xwe bikin? Heke em rawestin; her tişt radiweste".

"Heke ne sendîka û ne jî karbidest wê guh bidin me, em ê bikin ku guh bidin me. Em ê şideta objektîf bi kar binin heta ku ew neçar bimînin ku guh bidin gilî û gazinên me".

Ji ber vê jî grev, walkout [terikandina hevdîtinan] û kuştin çêbûn. Lê belê ev bi tenê destpêka zincîreke kujer a bûyeran bû.

Karkerên kanan amade bûn ku bikevin ber şidetê heta ku birêveberîya kanan were û bi wan re bipeyive. Ew ê li ser zinarê mîna mîhrabekê bisekinîyana heta ku hêza xwe ya ji dest dayî peyda bikin, heta ku mêranîya wan ji bo wan jî nû ve hat pêk anîn.

Li vî alîyî, karkerên kanan gihiştin biryarên xwe yên dîrokî û bang li navbeynkarên xwe yên rûhanî kirin da ku alîkarîyê bidin wan. Di kuneke li ser hîmê girê wan, dûrî çavan, wan di rîtûelên kevin ên veşartî de cihê xwe girt da ku bike ku dijminên wan nikaribin destê xwe bi wan bidin; da ku guleyên polêsan veguherin avê.

Niha dûrî girî, rêzeke biryaran û nebiryaran pêk dihat ku dikir sêhra wan weke lîstikeke bêgunehan xuya bike. Piştî nîvroja 16ê tebaxê, polês dest pê kir ku dorê li karkerên kanan bigire û teng bike, û wan dît ku di navbera têlên rêsayî û wesaîtên zirîpoş de kunek maye... Ew ber bi wir ve çûn, û dema lîder gihiştin wir polêsan bombeyên gazê û guleyên plastîk li wan reşandin. Karkerekî kanan bi demançeyekê bersiv da û bi dehan polêsan bi sîlehên otomatîk gule reşandin.

Li pêşberî gelek rojnamevanên xwedî kamera, 12 zilam li erdê hatin dirêj kirin. Êdî ya ku wê rojên li piştre biqewimaya ev yekcar zelûl dikir.

Yek polês jî nehatiye gunehbar kirin

Ji îfadeyên şahidan û delîlên cihê sûcî derket holê ku dûrî kamerayên televizyonan bêhtir karkerên kanan hatine kuştin. Li cihekî bi navê Small Koppie 14 zilam hatin kuştin, gelekan ji wan hewl dida radestî polêsan bibin. Şahidekî ku em navê Zeacks lê dikin, û em bi navê wî dizanin, wî got "tê bîra min yekî ji hevalên me got, 'heydê em xwe radestî wan bikin' du destên xwe rakirin hewa, hingê dema wî dixwest xwe radest bike, hin polêsan ji hippoyan gule direşandin û wan gule li du tilîyên wî xistin, ew kete erdê. Paşê ew careke din rabû ser xwe û got 'camêrino werin em xwe radest bikin', vê carê gule li sînga wî ket û bi vî rengî ew kete erdê. Ew hê nû rabûbû ser ejnûyên xwe û hewl da rabe ser xwe guleya sêyem ji tihêlê ve lê ket. Dema ku ew kete erdê hê hewl dida hereket bike... di heman demê de zilamekî hema li pişt wî jî hewl dida xwe radestî wan bike, gule li serê wî ket di alîyê din re derket û pê re jî li kêleka zilamê din kete erdê".

Gelek şahid dibêjin polês gotiye ev edaleta ji bo kujerên polêsan bû.

Ev kuştineke bêpirs û dadgeh bû, kuştinên di asteke girseyî de.

Di zincîra fermanan a polês û muhtemelen a siyasî de li deverekê biryar hatibû dayîn ku karkerên kanan wê têk werin birin. Piranîya polêsan bi tivingên êrişê hatibûn gurçûpêçkirin û ne bi malzemeyên li dijî alozîyên civakî. Em pê nizanin çi ferman dabûn wan.

Sibeha piştî komkujîyê karkerekî kanan got "dema karkerekî me yê kanan ji wesaîteke Nyala bihurî, kurekî hemşehrîyê wî li wir bû ji hundirê kepê rojhilat, wî jê re gotiye ku îro roja-Dyê ye, ku ew ê bên û guleyan bireşînin. Wî got kaxetek hatiye mohr kirin ku destûrê dide wan guleyan li me bireşînin."

Karkerekî kanan ê ku nexwest navê wî bê eşkere kirin got "polês divê me biparêzin, lê ew bi tenê me dikujin." Yên din ên li dora wî bi pistepist erê dikin û lê zêde dikin "Wan em hişyar jî nekirin, hema gule li me reşandin."

34 karkerên kanan hatin kuştin, û polês hewl da 78ên din jî bikuje, ev kes birîndar kirin. Heta niha hê yek polês bi tenê jî nehatiye gunehbar kirin, lê belê bêhtirî 200 karkerên kanan bi kuştina hevalên xwe hatin gunehbar kirin. Ev ehmeqîya qanûnî piştre hat betal kirin, lê belê weha xuya ye ku dozger û polêsan kuştinan bincil kirine.

Dewlet û partîya desthilatdar jî weha xuya ye di vê mijarê de alî digirin. Ev werçerxeke dîyarker e, û gelek meriv bawer dikin heke edalet bi lez û bêqusûr pêk neyê, Afrîkaya Başûr ber bi rejîmeke otorîter, dewleteke polêsî ve diçe.



ILTER REZAN: **Ji rêzewêneyên merivan**, teknîka tevlihev

* Rojnamevan û wênegir, Johannesburg.

Wergera ji îngilîzî: Luqman Guldivê

www.arsivakurd.org

Şoreşên *Rousseauyî*

EVELYNE PIEILLER

Em îsal sêsedsalîya jidayikbûna Jean-Jacques Rousseau (1712-1778) pîroz dikin, welatîyê Cenevreyê, nivîskar, fîlozof, ewqasî jî serserî û naturalîst, wî yê wêjeya fransî û fikra sîyasî nû bikira. Bi vedîtina "âme sensible (ruhê hestîyar)" wî yê roman azad bikira; bi kirina pirsa şertên wekhevîya di navbera merivan de wî destpêka şoreşên siberojê nivîsî.

Kêm tê dîtin ku nîvîsên fîlozofekên ewqasî ji hev cuda werin xwendin, ev nivîs ewqasî ji hev cuda ne ku weke ji hev qut û tecrîdkirî xuya dikin. Rewşa Jean-Jacques Rousseau jî ev e, berhemên wî pir belav bûn û têsîr li dîroka gelek gelan kir, ewqasî ku carinan li ser navê îdealeke îlhama xwe ji heman çavkan'yê girtî, dijminatîyeke hov li dijî hev meşandin [ji berhema Rousseau, têbînîya wergêr].

Tesîra fikrên Rousseau, ku di Danezana Mafên Merivan û Welatîyan ya 1789ê de dîyarker e, hê sala 1776ê di Danezana Serxwebûnê ya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ya Thomas Jefferson ew nivîsî de gelekî darîçav e. Gelek tekoşînên li dîjî kolonyalîzmê îlham û rewabûna xwe ji berhema Rousseau girtin. Simon Bolivar (1773-1830), ku bi awayekî dîyarker alikarîya serxwebûna kolonîyên Spnayayê yên li Başûrê Amerîkayê kir -li wir *Peymana Civakî* qedexe bû- di berhem û karên xwe yên li ser destûra bingehîn û li ser siyasetê de fikrên Rousseau gelek bi kar anîn. Li welatê ku hê Hindoçîna Fransî bû, Nguyen an Ninh ku li gor desthilatdarîyê serhildêrek bû û berbirsîyarê rojnameyên propagandaya fikra serxwebûnê dikirin bû, di sala 1926ê de beşek ji *Peymana Civakî* wergerand zimanê vîyetnamî (berhem li wê derê jî qedexe bû): Bi gotinên merivekî girîng yê wê demê Paul Cartonê difikirî ku "*gelê xwecihî ve bi dilûcan wergera bi vîyetnamî xwendîye*", wan ev berhem weke "*încîla civakî*" didît, û wan ew kir "*havênê serhildanên xwe û handêra kuştinên xwe*".

Rastî ev e ku tevahîya Rojhilata-Dûr fikrên Rousseau eciband, pêşî Japonyayê cihê ku Nakae Chômin di sala 1874ê de beşek ji *Peymana Civakî* wergerand zimanê çînî yê klasîk. Werger şiroveya xwe lê zêde dike: Anarşîst beşeke helwêsta xwe dispêrin wî, û yên ku dixwazin Japonyayê li gor modela amerîkî ava bikin jî heman tiştî dikin. Li Çînê rojnameya bi navê *Rojnameya gel* fikra wî di çarçoveyeke şoreşgerî de belav kir: Ev rêxistina Partîya Sun Yat-sen ji bo komareke çînî têdikoşe. Ev yek wê di dawîyê de sala 1912ê pêk bihata. Em nikarin lîsteya tevahîya gel û kesên ku doza fikrên wî kirin li vir binivîsin: Lê bi kurtasî, para Rousseau pirî caran tê de hebû ku gel bikevin nav wê tiştê jê re modernîte tê gotin, ya ku bi xwe ji Rohnîbûn û Pêşketinê peyda bûye …

Tevî vê yekê Rousseau di heman demê de bi îlhamdayîna terorê tê gunehbar kirin. Paul Déroulède, kesayetekî ku di çepa ultra-neteweperest de pir aktîf bû, di dawîya sedsala 20ê de bi hestên biratîyê behsa Rousseau dike. Marcel Déat, hinekî berîya ku di hikûmeta Vichy de bibe wezîr sala 1942yê bi van gotinan pesnê *"Rousseauyekî totalîter" "yek ji damezrîner û bavên şoreşa neteweyî"* dide û wî silav dike. (1) *Pitûka kesk* a Mûammer Qeddafî, bêyî navê wî bi lêv bike bi konseptên yekser ji Rousseauyî girtî tijî ye. Herçî îdeolojîya Kmerên Sor e, ew her çiqas bi awayekî vekirî weke îdeolojîya Rousseau xwe terîf neke jî, heke derfetên wan hebûya Pol Pot û Khieu Samphan li vê mijarê kolîyabana, ne tiştekî ecêb e ku meriv bifikire ew dişibe yek ji konseptên bingehîn yên felsefeya wî, weke şoreşa çandî ya maoîst. Alain Badiou vê fikira xwe bi awayê xwe nivisî. (2)

Meriv çawa lê serwext bibe ku şirovekirinên berhema Rousseau dikarin ewqasî ji hev cihê û bi hev re nakok bin? Gelo çi ye ya ku di berhema wî de destûr dide ku di heman demê de hîletê falanjîstên spanî jê biçe û fîlozofê mentiqbir Bertrand Russel, aligirê dilgerm yê bipêşketinê, gumanan jê bibe? Ew di *dîroka felsefeya rojavayî* de *(2012*), Rousseau weke *"afirînerê felsefeya siyasî ya dîktatorîyên qaşo-demokratîk*" bi nav dike û îdîa dike ku *"Hitler yek ji encamên felsefeya wî ye*". Eger meriv berhemên wî yên siyasî weke *Peymana Civakî* analîz bike, ew ewqasî tesîrdar bûn ku meriv dikare bibêje, fikrên wî di bingeha hevpar a demokrasîyan de ne, hingê wê karibe armancên fikrên wî û şaşfêmkirinên muhtemel ên hê jî dewam dikin… tesbît bike.

Peyama Civakî (3) di sala 1762yê de tevî peymana wî ya pedagojîk a mezin *Emile*ê ya ku meriv nikare wan ji hev veqetîne, hat çap kirin: Ev tiştekî mentiqî ye, jixwe ev in her du berhemên ku Cenevreyê wê bi dijwarîyeke meriv matmayî bihêle şermezar bikira û ku fermana şewitandina wan bidaya. Cenevre wan weke *«ehmeqî, hetîketî, bawerî bi xwedê neanînê, ku armanca wan tunekirina dînê xiristîyanî û tevahîya hikûmetan e»* didît, û ev jî weke tiştekî xirab nedihat hesibandin. *Peymana Civakî* behsa formulekê dike ku wê bibe fikreke şoreşger: *"Wextê mirov hat dinê azad bû, û li hemû deverên ku lê dimîne dîl e"* . Divê meriv şaş fêm neke, ev azadî ya zarokatîya mirovatîyê ye, dema heywanê li ser du lingan dimeşe (meriv) yê ku wê bipêşketinên meriv matmayî dihêlin pêk bîne, hê *"heywanekî ku bi tenê hîsan nas dike"* ye.

Ev rewşa pêşî dirêj najo lewma hêzên xwezayê ji hêzên meriv xwe pê diparêzin bi hêztir in. Ev yek dike ku meriv werin cem hev: Ew civakan diafirînin û "heywanbûna xwe" ji dest didin, newekhevîya milk û hêzê kifş dikin. Li dijî girêdayîbûnê ku di encama vê yekê de çêdibe divê *"meriv şiklekî bihevrebûnê peyda bike ku her ferdî û milkên wî ji tevahîya hêza kolektîf biparêze, û divê bi şiklekî wisa ev yek bibe da ku her kesî hem bi helwêsta komê bike yek, lê belê ji xwe pê ve jî serî ji tu kesî re netewîne, û bi qasî dema ji dayik bûyî azad bibe"*. Paymana Civakî jî bi temamî ev *"şiklê bihevrebûnê*" ye, yekbûneke tevahîya alîyên peymanê ye ku hêzeke siyasî, miletekî welatîyan pêk bîne ku armanca wan bikêrhatîkirina prensîbên wekhevî û azadîyê ye. Da ku ev yek pêk were, divê gel ê ku Rousseau navê *desthiladar* lê dike, *daxwaza giştî* dîyar bike, ango divê gel biryara kolektîf ku hilbijartina mentiqî ya her ferdî îfade dike, dîyar bike: Newekhevîyên şexsî tên çareser kirin, bi saya mentiqê ku dike her ferd ji berjêwendîyên xwe wêdetir li piştgirîya berjewendîyan bifikire. Serîtewandina li hemberî hiquqê, ku îfadeya daxwaza giştî ye, parêzerê wekhevî û azadîyê ye, dibe azadî bi xwe. Divê ev serîtewandin bike ku *"her endamê bihevrebûna civakê ji tevahîya heqên xwe yên li ser komê sil bibe"*, ev şertê bivênevê yê daîmîbûna wê ye. Her ferd li pêşberî hiqûqê û bi saya hiqûqê wekhev e. Tevahîya maneya Komarê di vê yekê de ye…

Bê guman ev fikir, meriv herçiqasî bi tenê konseptên wê yên bingehîn li ber çavan bigire jî, radîkal e: Ji hêbûna mafên xwezayî, ji nirxa gerdûnî ya mentiqê û ji prensîpa desthilatdarîya gel kêmtir tu tiştî qebûl nake, naxwaze. Her mijar girêdayî yekê din e. Îdîakirina hebûna mafên xwezayî yên ku di Sedsala Ronahîyê de timî behsa wan dihat kirin, berî her tiştî tê maneya prensîba yekîtîya mirovatîyê, tê maneya terîfkirina mirovî weke ji destpêkê ve azad, *"ji ber ku di xwezayê de otorîteya tu mirovî li ser mirovekî din tuneye, û ji ber ku hêz tu mafî nade tu kesî"*. Ev yek tê maneya ku mafê parastina vî mafî yê her ferdî heye. Nijadeke koleyan û nijadeke efendîyan tuneye…Bingeha vê yekîtîyê mentiq e, kapasiteya fêmkirinê ya herkesî heye, li gor Rousseau ev yek xisleta mirovatîyê ye û armanca perwerdeyê jî bipêşketina ber bi mirovatîyê ve ye.

"Guhertina ji rewşa xwezayî ber bi rewşa medenî ve guhertineke gelekî mezin di mirovî de pêk tîne, ew di helwêsta xwe de edaletê li şûna ajoyê bi kar tîne". Bi tenê Komar dikare şertên ji bo wekhevîya siyasî hewce, bi saya azadîya sîvîl biafirîne, lewra ew tenê destûrê dide ku her ferd bibe welatîyek û bikaribe daxwaza xwe li gor Başîya Kolektîf îfade bike.

Mirov van konseptan nas bike jî, ew dîsa mijarên nîqaşan in. Li alîyekî maneya wan ew e ku jîyaneke xwezayî ji alîyê xwedê ve afirandî tuneye, û li alîyê din jî ku mejîyê gel, ango daxwaza giştî, bê guman rohnî û bipêşketî ye. Danezanên Mafên Merivan yên salên 1789 û 1793yê ku dibêjin*"mafên merivî yên xwezayî, pîroz û nikarin werin tunekirin hene"*, vê yekê qebûl dikin, tevî ku ev mijar piştre heta bi sala 1946ê wê bihata ji bîr kirin jî… Xweşbînî, xeyalperestî, populîzm, ev in nîqaşên ku weke ku li dijî konsepta Rousseau xuya dikin: Gelo mentiq e ya ku merivan bi rê ve dibe, gelo ya rastî ev e ku meriv bi hîsan tevdigere, nexasim jî heke ya tevdigere girseyek be? *"Azadî nikare bibe encama merivên ku li gor ajoyên xwe tevdigerin, ev ajo timî merivî heps dikin, ev qanûneke ku neguherbar a hebûna daîmî a tiştan e"*. Edmund Burke siyasetvanekî îrlandî, katolîkekî pir bi bawerî û nivîskarekî baş bû. Ji 1791ê û vir ve ew di pirtûkên xwe yên bi navê *Ponijînên li ser Şoreşa Fransî* (2011) û hinekî piştre bi *Peyam ji Endamekî Meclisa Neteweyî* (2012) de vê pirsê li ser tevlîhevbûna maneya peyvên Gel, Mentiq, Azadîyê rave dike. Ev tevlihevî sedema fêmkirinên cuda yên fikra Rousseau ye ku serdema Terorê wê ew temsîl bikira. "Daxwaza giştî" xwedî hêzeke çawa ye?

Li gor Rousseau, wextê gelê desthilatdar xwe îfade dike, sazîyên ku wî ew wezîfedar kiribûn mecbûr in vê daxwaza giştî bi cîh bînin, lewra ew ji bo başîya hemûyan tevdigere. Yanî bi gotinên Robespierre di axaftina xwe ya Conventionê ya sala 1794ê gotî, li vir "despotîzmeke azadîyê" heye ku di xizmeta projeke xwexilaskirinê de ye. Gelo wê desthilatdarîya gel a mutleq jixwe bivênevê rê li ber "totalîtarîzmeke çepê" vekira? Bê guman ev ê bibûya mijara teza François Furet ku weke hinên din jî di pirtûka xwe ya bi navê *Li Şoreşa Fransî Fikirîn* (1978) de têgihiştina hêsankirî ya analîza jakobîn ku di berhema Rousseau de pevçûneke di navbera "yên adil" li dijî "yên xirab" de dibînin, rexne dike. Li gor xwendina bi vî rengi ya berhema Rousseau, ev pevçûn dibe sedema bicîhkirina dîktatorîya Ya Baş, û dike ku "Vulgate Lenîno-populîst" [pirtûka pîroz a îdeolojîya Lenîn, nota wergêr) û "dîktatorîya wî ya proleteryayê" pêk werin. Meriv dikare bi awayekî hê radîkaltir îdîa bike ku Danezana Mafên Merivan bi xwe, ku xwe dispêre binpênekirina prensîpa desthilatdarîya gel, sedema nabe were înkarkirin ya dîktatorîyê ye. *"Têkoşîn mafê gelan e…da ku ev amûrên monopolkirina demokrasî û desthilatdarîyê di destê meclisên parlementoyê»*, *Pirtûka kesk* wisa nivîsîye, ew di heman demê de binxêz dike ku sîstema partîyan bi tenê *"karîkatureke demokrasîyê ne, ya ku naveroka wê ezezî ye*".

Gelo ev tê maneya her tiştê qewimî "gunehê Rousseau" bû?

"Demokrasî bi tenê ji bo gelê xwedayan hilbijartî dikare bibe": Ev îfade ne tiştekî bêqîmet e. *Peymana Civakî* şertên komareke bêqûsur terîf dike, ya ku nikare di rastîyê de pêk were, di îhtîmala herî baş de jî ne mimkin e pêk were û ev îhtîmala herî baş jî ew e ku welatî perwerdekirî û mejîyên wan rohnîkirî bin. Bê guman di pratîka dîroka hevpar de, ev yek alozî û tevlihevîyan pêk tîne di navbera gerdûnîbûna mentiq, ku bi xwe rê li ber wekhevîyê vedike û "daxwaza giştî" ku faktoreke baş a wekhevparêzîyê ye, di navbera "milkê hevpar" yê xeyalî û pêdivîyên şexsî, hwd. Ya ku divê meriv wê bixe ber lêpirsînê alozîyên demokrasîyê bi xwe ne, yên ku di pratîkê de tên serê me û şideta veşartî ku demokrasî perdeyekê dikşîne ser. Heta bibin xweda, welatî fikrên xwe bi tenê nasipêrin mentiq, lê wan dispêrin mentiqên xwe… "Daxwaza giştî" nikare ji analîzeke pevçûnên di nav wê de diqewimin, bibuhure. Meriv çareserîya avangardeke rohnîker hilbijêre, yan jî girseyeke ku hêdî hêdî bi perwerdeyê tê rohnî kirin hilbijêre, ev projeya azadkirina merivan xwe dispêre bawerîyeke xurt bi mimkinbûna bêqusûrbûna me: Vê têgeha nû ya ku fîlozofên sedsala 18emîn ew afirandin, teqezbûnekê terîf dike ku mimkin e hingê li gor wê demê kêmtir bawerî pê dihat anîn.

(1) Marcel Déat, http://rousseaustudies.free.fr

(2) A. Badiou Piştgirtîya Kmerên Sor û ya şoreşa çandî kir. Herwiha binêre li nivîsa bi navê "Kampuchéa vaincra !" / "Kampuchéa Wê bi ser Bikeve!" (Le Monde, 17ê çileyê 1979ê), ya ku tê de ji ber ku kuştinên Kmerên Sor hatin eşkere kirin, ew "kampanyayeke li dijî kamboçîyan hatî meşandin" tê şermezar kirin.

(3) Jean-Jacques Rousseau, *Du Contrat social (Peymana Civakî)*, Flammarion (GF), Parîs, 2011.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

www.arsivakurd.org

ÇAND Û HUNER



NAVEROK
ÇIRÎYA PÊŞÎN 2012

Di navbera Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Federal a Iraqê de aloziyên li ser erdî
Dr. Azad Salih
▶ R. 1

Abdulbaset Seyda: "Divê hêzên navnetewî derbasî Sûrîyeyê bibin û kuştinan bidin sekinandin"
Yado Ciwan
▶ R. 1

"Wexta me nema..."
Serge Halimi
▶ R. 2

Serokdewlet Obama, xelata Nobelê ji balefirên bêpîlot re
Chase Madar
▶ R. 6

Mitt Romney, dîplomasîya di devê tivingê de
Johann Hari
▶ R. 7

Kapasîteya reqabetê ya di rewacê de
Gilles Ardinat
▶ R. 8

Bihara nazik a kurdan li Iraqê
Kendal Nezan
▶ R. 10

Rewşeke şer a bêdawî li Qarebaxê
Philippe Descamps
▶ R. 12

Srî Lanka û Pilingên Azadîyê yên Elam-Tamîlê
Eric Paul Meyer
▶ R. 14

Lîbyaya bi destê milîsan
Patrick Haimzadeh
▶ R. 15

Rabûna hêrsê ya ereban
As'ad Abu Khalil
▶ R. 15

Ji bo çi Kolombîya dikare ji aştîyê bawer bike
Gregory Wilpert
▶ R. 16

Dema ku Alvaro Uribe kardêrên kolombî bêzar dikir
Loïc Ramirez
▶ R. 17

Komkujîyek weke di serdema Apartheid de
Greg Marinovich
▶ R. 18

Şoreşên Rousseauyî
Evelyne Pieiller
▶ R. 16

ÇAND Û HUNER
▶ R. 20

LE MONDE
diplomatique
kurdî

Abonetîya dîjîtal a salane: 30 €
(Ji bo serlêdanê forma abonetîyê ya malperê bikarbînin)

Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)
Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB

'MARTÎNÊ BEXTEWER'
SÎNORÊN ROMANA KURDÎ FIREH DIKE'

Ji Jan Dost 'Martînê Bextewer'

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Jan Dost bi lehengên xwe yên vê carê me li cîhana rojava û cîhana rojhilat digerîne û dergehên efsûnbazîya 'şerqê' û peravên Efrîkaya 'reşikan' a 300-350 sal berîya niha heta 'taqê piştê' li me vedike. Her wekî ku Weşanxaneya Avestayê jî dîyar dike, 'Martînê Bextewer' sînorên romana kurdî fireh dike.' Bi rastî jî bi ya min ev romana hanê, lûtkeya hostehîya nivîskarê 'ciwan' ê 47 salî ye. 'Mijabad', '3gav û 3darek' û 'Mîrname' heta tu bibêjî bes hestên me yên standina ji çêjên cuda berz kirin. Her sê berhem jî ji hev xweştir in. Lê belê 'Martînê Bextewer' ji bo min xweştirînê van berheman e!

Martîn Setzer xortekî alman e. Di sedsala 17ê de ji dayik bûye û ji ber ku ji jîyana Ewropayê bêzar û dilsar dibe, berê xwe dide şerqê, dide pey 'rastîyê' ku ew rastî jî kitêbek e. Kesê ku berê Martîn dide şerqê Hans Heilberg e ku 35 salan li Den Haagê berçavkfiroşîyê dike, di salên dawîyê de li kevîya behra bakur nêzîkî dêreke mezin di qehwexaneyekê de kar dike, paşê vedigere bajarê Herneya Almanyaya niha. Serpêhatîya Hans bixwe serpêhatîyeke bi têra xwe balkêş û biêş e. Kurekî tekane yê dê û bavekî ye. Bajarê wî li qeraxa deryaya Baltiqê bûye. Gava ku du salî ye, Artêşa Swêdê bi serokatîya Qral Gustav Adolf xwe berdidin bejahîyê û dest bi şer dikin. Ew bi hawara protestanan ve hatine! Bavê wî yê Lûtherî tê kuştin. Diya wî, wî û sê xwişkên wî ber bi başûr ve direvîne. Katolîk û Lûtherî berê xwe didin hev. Welatên derdorê, welatê Hans didin ber 'gezan' û dadiqurtînin. Di nîveka sala 1600ê de ew, diya xwe û her sê xwişkên wî yên xweşik Herta, Hermîne, Herwîg li gundekî bakurê Çemê Reinê bi cih dibin. Havîna 1643yê artêşên çar dewletan şerê hev dikin. Di şer de leşker çavsor û bitir dibin! Xwîn laşan li ber xwe dibe! Diya wî li ber çavên wî tê kuştin û leşker tecawizê her sê xwişkên wî dikin. Dengê xwişka wî ya sêzdeh salî ku serbazên îspanî ketibûn ser zikê wê, gelek şevan xew lê diherimand. Di nav wê xwînê de tevahîya wêneyan dibîne. Wêneyê ku nabîne, wêneyê 'Mesîh' bixwe ye! Îkonên li ber çavên wî xuya dikin, bi dirûvên guran dikevin. Xwîn ji îkonên ku wî dîdîtin diniqûtî. Ji tirsan, her sê xwişkên xwe yên zorganbûyî radike û berê xwe dide Amsterdamê. Li dêreke bajêr her sê xwişkên xwe dike xizmetkarên dêrê. Bixwe jî berê xwe dide bajarê Den Haagê û dibe berçavkfiroş û sîqalkerê camên berçavkan.

Di vegera xwe ya Herneyê de Hansê kal bar û rêwîxaneyekê ji xwe re vedike û dostanîya wî û Martîn li wir dest pê dike. Hans han dide Martîn ku berê xwe bide şerqê da ku gîyanê wî li wir rihet bibe. Navê kitêbekê dide wî û dibêje ku nirx û giranîya wê beramberî zêr e û rastî û bextewarî tê de ye: 'El Îfade Fî Îksîr El Seade.'

Martîn Setzer berê xwe dide şerqê û li bajarê Helebê bi cih dibe. Li wir bazirganîya kaxezan dike û dostanîya wî û hin keçikan çêdibe. Di encamê de li wir têk diçe. Hem evîn, hem jî bazirganî ji destan derdikeve. Nasekine. Dide pey riyên bexteweriyê heta ku di Bazîdê re derdikeve. Li wir pêrgî karesateke rûhî ango derûnî tê. Martîn li welatên şerqê, di bin ronahîya rojê de rastî heqîqetên jîyanê tê. Lê mesele ew e ku ew û rastîyên kitêban li hev nakin. Dema ku ji 'Komedîya Merivayîyê' ya li xaneke Bazîdê tê temsîl kirin bi zor û zehmetî rizgar dibe, pêrgî Dawudê Yezdanyarê Mamzêdî tê, 'şîretên' ku Mamzêdî li Martîn dike, tevahîya zanîn û azmûnên wî yên heyî berovajî dike. Paşê jî biryara xwe dide ku vegera welatê xwe. Vedigere jî…

Martîn Setzer li welatên şerqê, di bin ronahîya rojê de rastî heqîqetên jîyanê tê. Lê mesele ew e ku ew û rastîyên kitêban li hev nakin.

Dawî dema ji wê "komedya merivayîyê" a ku li xaneke Bazîdê tê temsîl kirin bi zehmetî xilas dibe, rastî Dawudê Yezdanyarê Mamzêdî tê; "şîret"ên ku Mamzêdî dide Martîn wê hemû zanîn û tecrubeyên wî berovajî bike.

Bi vê serpêhatîyê re parelel çîroka hevalê wî Gustav Albûs jî heye ku ew jî berê xwe dide rojavayê Afrîkayê, ticareta koleyan dike û piştî 9 sal, 9 meh û 9 rojan vedigere gundê xwe û çîroka xwe dibêje. Serpêhatîya Gustav ji serpêhatîya Martîn û Hans ne kêmtir e. Ew Mesîhîyekî bi bawerîya xwe xurt e. Dema ku Hans, Martîn ji bo çûna Şerqê sor dike û ber bi rûhanîyeta şerqê ve dehf dide, kesê ku li dijî çûna wî derdikeve Gustav bixwe ye: "Bêhişîyan neke Martîn! Meriv çawa li tiştekî di mista destê xwe de bigere? Riya rast, riya Mesîh e. Bextewarî di naskirina peyva Xwedê de ye. Bextewarî jî hezkirina Rebê me Mesîhê Xelaskar e. Temenê te çi ye tu xwe bi van pirsên hertûqîyan dibilînî û mijûl dikî? Xortanîya xwe di sîya kitêba pîroz de derbas bike û jixweber tê bextewar bibî..."

Gustav 9 rojên sax li ber Martîn digere da ku wî ji fikra çûna Şerqê vegerîne. Lê Martîn bi ya Gustav nake, guhdarîya Hans dike. Riya rojhilat dide ber xwe. Kitêba ku Hans jê xwestiye, tevî çend kitêbên din bi xwe re tîne. Lê gava ew vegerîyaye, êdî ne Hans Heilberg maye, ne jî Cafe Heilberg. Di vegerê de navê cafeya Hansê kal bûye: 'Gasthof Zur Kurve' ango 'Rêwîxaneya Koşeyê'

Şayanê gotinê ye ku 'Martînê Bextewer' bi jêrenotan hatiye xemilandin û ev jêrenot naveroka romanê bi xwe ne. Stîla wê jî pirdengî, bi gotineke din 'polyphon' e.

Jan Dost di gelek deverên romanê de, bedewîya kurmancî baleberz kiriye. Hevok wisa xweş li hev anîne û li hev siwar kirine ku di hevokên zêde dirêj de jî meriv 'mîna misqalê zêr' aciz û tengezar nabe.

Roman gelek peyaman di nav xwe de dihewîne. Yek jê jî ev e: "Rastî li ba min tenê ye, îdîayeke çewt e."

Martînê Bextewer, Jan Dost, Weşanxaneya Avestayê, 264 rûpel, Kurmancî, Stenbol

ILTER REZAN: **Ji rêzewêneyên merivan**, teknîka tevlihev

www.arsivakurd.org